

KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstituya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

DENGBÊJ RESOYÊ GOPALA

(Jiyan û Berhem)

Mahmut BEĞİK

ŞÊWIRMEND

Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2013

Türkiyede Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğüne

Bu çalışma jürimiz

tarafından.....

.....
.....

Anabilim Dalında YÜKSEK LİSANS olarak kabul edilmiştir.

(imza)

Başkan :.....

(Akademik Ünvanı, Adı-Soyadı)

(imza)

Üye :.....

(Akademik Ünvanı, Adı-Soyadı)

(imza)

Üye :.....

(Akademik Ünvanı, Adı-Soyadı)

(imza)

Üye :.....

(Akademik Ünvanı, Adı-Soyadı)

(imza)

Üye :.....

(Akademik Ünvanı, Adı-Soyadı)

Onay

Yukarıdaki imzaların, adı geçene öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

İmza

T.C.
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

DENGBÊJ RESOYÊ GOPALA

(Yaşamı ve Eserleri)

Mahmut BEĞİK

Tez Danışmanı

Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2013

KURTE
DENGBÊJ RESOYÊ GOPALA

(Jiyan û Berhem)

MAHMUT BEĞİK

Gelek caran di nava gel de, bûyerên ku li ser civakê bandorê dikin diqewimin. Eger gel an civak di nava şert û mercên wêjeya devkî de jiyana xwe dewam dike û wêjeya nivîskî di nava gel de bi temamî rûneniştibe, ew bûyer an qewimandin bi awayekî, hinek kes digihînin civakê. Ev bûyer ji nifşekî bo nifşên pey wan tînen neqilkirin. Di nava Kurdan de jî ev karê han, bi rêya dengbêjan dibe. Dengbêj bûyerên ku qewimîne dikin kilam, destan û çîrok. Wan di nava gel de, di herêmê de an ji herêmek bo herêmek dinê seranser neqil dikin.

Di nava wêjeya devkî ya Kurdan de, dengbêjî heya roja îro dewam dike. Tenê gotinên hinek kilaman û notayên wan ketine ser wêjeya nivîskî. Lê hest, mîmîk û tevgerên bedena dengbêj, di derveyê kaxezan de man e. Di rêya dengbêjan de kilam û stran, li ser bingeha xwe hatine parastin. Gelek dengbêjên Kurda hene ku vê çanda devkî parastine û heya îro anîne. Yek ji wan dengbêjan ku vê çandê parastiye û jê re xizmeteka mezin kiriye, dengêj Resoyê Gopala ye. Resoyê dengbêj, ji 70 salan zêdetir dengbêjiyê kiriye û berhemên hêja di dengbêjiya Kurdan de afirandiye. Di vê lêkolînê de, wê li ser jiyan û berhemên dengbêj Resoyê Gopala, bi firehî bê rawestan.

Lêkolîn ji destpêkê û du beşan pêk tê. Di beşa yekem de, di dunyayê de wêjeya devkî bi giştî û di nava wê de ciyê dengbêjiyê çiyê, li ser hatiye rawestan. Dengbêjiya neteweyên cîran û kêmteweyên li ser axa Kurdistanê, çiqas bandorê li ser dengbêjiya Kurdan an Kurd çiqas li ser dengbêjiya wan bandorê hiştine, yek ji mijara beşa yekem e. Li gor lêkolînerên Kurdan û yên dunyayê hinek pîvanên dengbêjiyê bi giştî çine û bi taybetî ciyê dengbêjê bi nav û deng Evdalê Zeynê, di nava dengbêjiya Kurdî de çiyê, hatiye vekolan. Ji ber ku Evdal di nava dengbêjiya Kurdan de, ekolekî ye û Resoyê dengbêj jî weka şopînerê wî, dengbêjiya xwe daye dewam kirin, me di vê beşê de cî daye Evdalê Zeynê jî.

Beşa yekem li ser jiyana Resoyê Gopala ye. Eşîra wî, malbat û jahrdana wî di nava vê beşê de ne. Ji bilî van tiştan ji malbata Reso, ji lêkolîneran û ji dengbêjên hevalên Reso kî/kê li ser çî gotiye, me cî daye fikr û ramanên wan.

Di beşa duyem de berhemên dengbêj Reso û şiroveyên li ser wan hene. Ji berhemên dengbêj 13 kilam hatine bijartin û li ser wan şirove hatine kirin. Li ser mijara kilaman, lehengên di nava wan de, bûyer, cî û tevna wan. Weka mînak jî ji bo tîkiliyên di navbera berhemên Reso û Evdal de bînan zanîn, me 2 kilamên Evdalê Zeynê jî, bi gotinên wan ve danî dawiya teze.

Peyvên sereke: Wêjeya devkî, wêjeya nivîskî, dengbêj, Resoyê Gopala, êvdalê Zeynê.

ÖZET

DENGBÊJ RESOYÊ GOPALA

(Hayatı ve Eserleri)

Mahmut BEĞİK

Toplum içinde çoğu zaman, toplumun üzerinde etkiler birakan olaylar meydana gelir. Eğer o toplum sözlü halk edebiyatını yaşıyorsa ve henüz tamamen yazılı edebiyata geçmemişse, bu olaylar bir şekilde bazı kimseler tarafından topluma sözlü olarak aktarılır. Bu olaylar bir nesilden diğer bir nesile nakledilirler. Kürt halkı içerisinde, genelde bu görev ‘dengbêjler’ tarafından yapılır. Dengbêjler bu olayları hikaye, destan veya türkü haline getirirler. Bölge halkı içerisinde veya bir bölgeden diğer bir bölgeye, baştan başa naklederler.

Dengbêjlik, sözlü Kürt edebiyatında bugüne kadar devam etmektedir. Sadece türkülerinin bir kısmı, notalarıyla beraber yazılı edebiyata dönüştürülebilmiştir. Türküler, dengbêjler sayesinde kendi özlerini koruyabilmişlerdir. Kürtler içerisinde bir çok dengbêj, bugüne kadar bu sözlü edebiyatı taşıyabilmişlerdir. Bu sözlü kültürü koruyan ve ona büyük katkılar sağlayan dengbêjlerden bir tanesi de dengbêj Resoyê Gopala’dır. Dengbêj Reso 70 yıldan fazla dengbêjlik yapmış ve Kürt dengbêliğine önemli katkılarda bulunmuştur. Bu araştırmada, dengbêj Resoyê Gopala’nın yaşam ve eserleri üzerinde, detaylı bir araştırma yapılmıştır.

Bu tez giriş ve 2 kısımdan oluşmaktadır. Giriş bölümünde, dünya genelinde sözlü edebiyat ve onun içerisinde ‘dengbêjliğin’ yeri üzerinde durulmuştur. Bunun yanında da komşu milletlerin ve Kurdistan topraklarında yaşayan azınlıkların Kürt dengbêjliği üzerindeki etkisi veya Kürt dengbêjliğinin, bıraktığı etki ele alınmaktadır. Aynı bölümde, dünya ve Kürt araştırmacılarına göre, dengbêjliğin genel ölçüleri ve dengbêj Evdalê Zeynê’nin bir ekol olarak Kürt dengbêjliği içerisindeki yerine yer verilmiştir. Bunun da sebebi dengbêj Resoyê Gopala’nın Evdal’in bir takipçisi olmasındandır.

Araştırmanın birinci bölümü, Reso’nun yaşami ve eserleri konu edinmektedir. Reso’nun aşireti, ailesi, zehirlenmesi bu bölümde yer almaktadır. Ayrıca Reso’nun ailesinden, araştırmacılarından, dengbêj ve arkadaşlarından, dengbêj Resoyê Gopala hakkındaki görüşlerine yer verilmiştir.

Üçüncü bölümde, Reso’nun eserlerinden seçilmiş örnekler almaktadır. Bu örneklerde ele alınan türkülerin konusu, kahramanları, olay, yer ve örgüsü üzerinde durulmuştur. Resoyê Gopala, dengbêj Evdalê Zeynê’nin ekolunu takip eden bir dengbêj olması nedeniyle, ikisinin eserleri arasında karşılaştırmaların yapılabilmesi için örnek olarak iki eserine yer verilmiş ve eserler ekte sunulmuştur.

Anahtar kelimeler: Sözlü edebiyat, Kurt, dengbêj, Resoyê Gopala, Evdalê Zeynê.

SUMMARY

THE DENGBÊJ RESOYÊ GOPALA

(His life and Works)

MAHMUT BEĞİK

Many times happenings occur which effect on the societies life. If the society continues its lives under the circumstances of the verbal literature and the written literature hasn't established enough, there are some person who are doing that. These happenings are been transferred from a generation to the others by dengbêjs. They are transferring these by songs, epics and stories. They are transferring them from an area to another.

The dengbêj culture is still continuing among the Kurds. Only some of these songs are been written to notes. Songs are been protected on their own bases. Many of the Kurdish denbejs have protected this verbal culture and transferred it to the present day. One of these dengbêjs which has served the dengbêj culture by protect the ancient is the dengbêj Resoyê Gopala. The dengbêj Reso has lived more than 70 years as dengbêj by composing many valuable works for the Kurdish culture. This my work is going to be a part of his life and works.

The research is constituted of a beginning and two chapters. At the first the general explanation of the verbal literature and the role of the traditional singers (dengbêjs). Dengbêjs in the surrounding nations and minorities in Kurdistan, how they have effected on the kurdish dengbêjs is a topic of the first chapter. We have mentioned at this chapter the criterias of being a dengbêj according to the kurdish and other dengbêjs in the world and especially the position of the famous dengbêj Evdale Zeynîke in the Kurdish literature which's been researched. While Evdal is been seen as a hero of the Kurdish dengbêjs and has continued as a dengbêj as like as his followers did it.

The first chapter is about Resoyê Gopala's life. His family and the way he's been poisoned are expressed at this chapter. Beside of that the expressions of his family members, friends and other researchers are been expressed their opinions and informations about Resoyê Gopala.

The second chapter is, Resoyê Gopala's works and comments on these works. Some of his songs are selected and are commented. Especially the topics and characteristics of them have been commented by emphasizing time and place for his songs could be understand better where it's been finalising with Evdalê Zeynê's two songs included their lyrics which can be found at the end of this work.

Key words: Verbal literature, Kurd, dengbêj, Resoyê Gopala, Evdalê Zeynê.

KURTEBÊJE

Alk. : Alîkarê

Arş. : Arşîv

Bnr. : Binêre

c. : Cild

Doç. : Doçent

Dr. : Doktor

j. : Jimare

KT : Komara Tirkiyê

Prof. : Profesör

r. : Rûpel

z. : Zayînî

h.b. : heman berhem

b.n.b. : berhema navborî

NAVEROK

KURTE.....	I
ÖZET.....	II
SUMMARY.....	III
KURTEBÊJE.....	IV
PÊŞGOTÎN.....	1

DESTPÊK

1.1. NÊRÎNEKA GIŞTÎ LI SER ZARGOTINÊ.....	3
1.2. LI SERANSERÊ DÎNYAYÊ KEVNEŞOPIYA VEGUHÊZÎ YA DEVKÎ Û DENGBÊJÎ.....	5
1.3. DENGBÊJIYA NETEWYÊN CÎRAN Û KÊMNETEWYÊN LI SER AXA KURDISTANÊ.....	12
1.4. LI GOR PÎVANAN DENGBÊJÎ.....	16
1.5. EVDALÊ ZEYNÊ Û ŞOPA DENGBÊJIYA WÎ.....	24

BEŞA YEKEM: DENGBÊJ RESO

2.1. DI NAVA ŞOPÎNERÊN EVDALÊ ZEYNÊ DE DENGBÊJ RESOYÊ GOPALA (MIHACIR).....	34
2.2. MALBAT Û EŞÎRA RESOYÊ GOPALA.....	36
2.3. ŞERT Û MERCÊN DI DEMA JIYANA RESO DE LI KURDISTANÊ.....	37
2.4. JIYANA RESO (1902-1983).....	42
2.5. JEHRDANA RESO.....	46
2.6. MALBATA RESO.....	48
2.7. NÊRÎNÊN DENGBÊJAN LI SER RESO.....	49

BEŞA DUYEM: BERHEMÊN DENGBÊJ RESO

3.1. NIRXANDIN Û ANALÎZA BERHEMÊN RESO.....	55
3.2. KILAMA LO MÎRO.....	56
3.3. KILAMA AXAWO.....	60

3.4. KILAMA LI SER XALID BEGÊ CIBRÎ.....	66
3.5. KILAMA LI SER FERZÊ (FERZÊ BAVÊ MIHEMED SALIH).....	73
3.6. KILAMA LI SER XALID BEGÊ HESENÎ.....	76
3.7. GULA DI ZINÊR DE.....	79
3.8. KILAMA QULING Û RESO.....	80
3.9. KILAMA DÎLBER.....	82
3.10. KILAMA LÊ LÊ DELALIYÊ.....	84
3.11. KILAMA MENAL MENAL.....	86
3.12. KILAMA TOWBE.....	88
3.13. KILAMA HEY LÊ.....	89
3.14. KILAMA RABE RABE.....	89
3.15. RESOYÊ DESTANBÊJ.....	92
ENCAM.....	93
ÇAVKANÎ.....	95
PÊVEK:	
KILAMÊN KU LI SER WAN ŞIROVE HATINE KIRIN Û TEKSTÊN WAN	
1- LO MÎRO.....	97
2- AXAWO.....	98
3- XALID BEGÊ CIBRÎ.....	100
4- FERZÊ BAVÊ MIHEMED SALIH.....	102
5- XALID BEGÊ HESENÎ.....	103
6- GULA DI ZINÊR DE.....	104
7- QULING.....	105
8- DÎLBER.....	106
9- LÊ LÊ DELALIYÊ.....	107
10- DE MENAL MENAL.....	108
11- TOWBE.....	109

12- HEY LÊ.....	110
13- RABE RABE.....	110
14- WER XOZANÊ.....	112
15- DÊRSIM E XWEŞ DÊRSIM E.....	114

PÊŞGOTIN

Heya îro li ser çanda Kurdî, li seranserê Kurdistanê, ji aliyê lêkolînavanên Kurd û biyaniyan ve hinek lêkolîn hatine kirin. Di encama van lêkolînan de, hinek pirtûk hatin weşandin. Gelek gotar hatine nivîsandin. Dema mirov li encamê dinêre, ev xebatên han gelek kêmin û pêdivî bi gelek xebatên din heye. Ji ber ku piraniya lêkolînan hatine kirin, pêdivî bi çûna nava kûrahiya wan heye û mijarên ku lêkolîn li ser nehatine kirin, divê li ser wan xebat bê kirin.

Di nava mijarên çandî de, wêjeya Kurdî xwedî ciyek taybet e û divê bi kûrahî li ser mijarên wê bê rawestandî û vekolîn. Her xwendevaneke zimanê Kurdî, divê xwe lêkolînavan bipejirîne û hizra xwe bide ser lêkolîna mijaran. Di nava lêkolînan de, divê şaşiyên bingehîn tunebin da mijarên girîng û dîrokî şaş neyên fêmkirin û neheqî li kesekî neye kirin. Bi vê sedemê divê her lêkolînavanek bi berpirsiyarî tevbigere da xeletiyên mezin yê bingehîn çênebin.

Di xwendina me ya teza mastirê de, di nava salekê de, mamosteyên me yê dersan bo lêkolînan gelek mijaran weka semîner û sîpartek, ji hev cuda dane me xwendevanan. Li gor van mijaran dikarim bêjim her xwendevan li gor derfetên xwe çûn nava kûrahiya mijaran. Wan pêşkêşî hevalên xwe kirin û li ser wan mijaran dan û sitendin hatin kirin. Di encamê de jî gelek lêkolînan hêja derketin holê.

Di nava mijarên wêjeya Kurdî de, zargotina Kurdî bi serê xwe şaxeka xam e ku zêde lêkolîn tê de nehatiye kirin. Her lêkolînavanê ku di vê mijarê de lêkolînan bike pêwîste xebatên kûr bike. Xebata xwe pîralî bike da kêmasî nekeve mijarê. Di dema lêkolînê de divê çavkanî baş bîn bikaranîn ji ber ku pîrsgirêka herî mezin di zargotinê de çavkanîne. Di mijara çavkaniyan de, çavkaniyên ku agahiyên wan neketine ser kaxezan, divê bi temamî bîn bikaranîn.

Di mijara vê teze de kêmasiya çavkaniyan gelek hebû. Heya ji dest hat, me ji însanên der û dora Reso yê ku ew nasdikirin, agahî wergirt. Me van agahiyan bi awayeke bi rêk û pêk heya ji dest hat bikaranîn. Resoyê dengbêj şagirtekî dengbêjê mezin yê Evdalê Zeynê bû. Diviya hinek jî behsa jiyan û berhemên Evdal jî bihatina kirin. Bi sedema ku dengbêjiya Kurdan perçeyek ji dengbêjiya dinyayê jî, bi kurtayî behsa dengbêjiya dinyayê hat kirin.

Hêviya min ew e ku bi vê xebatê re, gelek rastî û tiştên ku di mijarê de nayêne zanîn piçek derbikevin holê.

Ez bi xwe, wek xwendevanek mastirê, di zarotiya xwe de, ji aliyê malbata xwe ve, li ser rêbaza Melayê Cizîrî, Şêx Ahmedê Xanî, Feqiyê Teyra, Mele Huseynê Bateyî, Şêx Ebdurehmanê Aktepeyî û hwd. hatim perwerdekirin. Ji bo wê jî di serî de sipasdarê bavê xwe Mele Evdilayê Xerzî (Timoqî) û hemû malbata xwe me. Mamoste Prof. Dr. Kadri Yıldırım li ba dilê min xwedî ciyek taybet e û di gelek babetên li ser mijarên me de alîkariyan daye me. Mamosteyê qedirbilind Yrd. Doç. Dr. Hayrullah Acar ku şêwirmendê teza min e, di gelek mijaran de, di dema xwendina min û amadekirina teza min de yarmetiya min kiriye, jê re sipasiyên xwe dikim. Sipasiya dersdarê xwe yê hêja Doç. Dr. Abdurahman Adak dikim ku dersa min ya paleografîyê û erûzê daye. Di amadekirina teza min de, mamoste Ramazan Pertev, di her daxwaza min de alîkariya min kiriye, jê re malavahiyê dixwazim. Her weha sipasiya Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê dikim ku di amadekirina teza min de, di her demê de bo alîkariya min amade bû ye û arşîva xwe ji min re vekiribû. Sipasiya kurê Dengbêj Reso Evdilkerîm dikim ku tevî nexweş bû jî, alîkariya min dikir.

2013

Mahmut Beğik

Diyarbakir

1- DESTPÊK

1.1. NÊRÎNEKE GIŞTÎ LI SER ZARGOTÎNÊ

Di dîroka mirovahiyê de her qewm, her millet xwedî zimanek bûye. Di dîroka mirovahiyê de cîyê nivîsê jî gelek giring e. Bi xêra afirandina alfabeyan û nivîsan, mirovahî ketiye asteka din ku karibiye gelek berhemên xwe yên afirandî bixe ser kevîran, çerman an jî kaxezan û heya îro wan biparêzin.

Her qewm an her netewe xwedî çandekê xwe ya taybet e. Di nava çanda xwe de, ji xwe re wêje (edebiyat) ava kirine û ew wêje heya îro hatiye. Lê gotina wêje, gotinek wisa berfirehe ku mirov gelek tiştan dikare di navê de bibîne. Di vê mijarê de esas giringtirîn tişt ew e ku mirov wêjeyê jî hev veqetîne. Di vê babetê de mirov dikare wêjeyê bike du beşan: Wêjeya nivîskî û wêjeya devkî.

Wêjeya nivîskî di eslê xwe de mijareka bi serê xwe ye û di nava wê de gelek cureyên wê hene ku her yek bi serê xwe hêjaye û pêwîste mirov li serê lêkolînan bike. Qenc an xerab, di dinyayê de û di nava Kurdan de, gelek nivîskar hene ku helbestan, roman, çîrokan, dîrokan û hwd. dinivîsin. Her cûrenivîsên wan dikeve ser kaxezan, malperan an ser alavên dijîtalî. Mirov bi dilrihetî dikare bêje ku ev di dinyayê de û di nava Kurdan de jî tîr arşîvîkirin û digihîje xizmeta xelkê. Tevî ku behsa van cûrenivîsên wêjeya nivîskî jî hat kirin, di binyata xwe de mijara teza me, di nava wêjeya devkî de (zargotin) dengbêjî ye. Bi sedema ku welatê me, bi hesêb axa xwe û bi hesêb rengên xwe yên zaravayî gelek dewlemend û fire ye, dengbêjiya Kurmancî jî mijareka gelek berfireh e. Her herêmek Kurdistanê, xwedî dengbêjên xwe û kilamên xwe yên taybetin. Lewra me di nava dengbêj û dengbêjiya herêma Serhedê de, tenê dengbêj Resoyê Gopala bijart.

Weka her milletên ser ruyê dinyayê, gelê Kurd jî xwedî çandekê berfireh e. Di nava zargotina Kurdan de gelek cûre berhem an şax hene ku heya niha nehatine nivîsîn û bi sererastî neketine arşîvên me. Ev berhemên zargotinê neketine xizmeta gelê Kurd. Di nava wan cûreyan de kilam (stran), çîrok, metelok, destan, pêkenok, gotinên bav û kalan û gelek cûreyên din yên zargotinê hene.

Di nava zargotina gelên dinyayê de dengbêjî û dengbêj bi serê xwe, xwedî cîyek taybet in û dengbêj an kilamên wan, ew in ku pêzanîna gelek bûyerên berê yên kevin bi xêra wan hatine heya roja me û em ji wan bûyeran, bi xêra wan kilamên

dengbêjan agahdar dibin. Di dinyayê de destanên ku herî zêde behsa wan têkirin, destanên Makedoniyayî ku Yewnanî perçeyeye ji wan in, destanên Îlyada û Odysseia ne. Destanbêjê van her dû destanên bi nav û deng Homeros e. Îro jî di nava hemû gelên dinyayê de behsa wan destanên devkî tê kirin û weka pirtûk jî hatine nivîsandin. Walter J. Ong ku lêkolînên zahf baş li ser destan û balladan kiriye, weha dibêje:

“Ji çaxên berê heya îro, destanên Îlyada û Odysseia, di nava çanda rojava de, mînakên herî baş, bi coş û ne olî ne.”¹

Homerosê destanbêj bi deh hezaran rêzikan aniye cem hev û bi hostatiyeka mezin destanan gotiye. Ew bingeha cureyên çanda devkî û nivîskî afirandî ye. Destanbêjiya wî bûye maka roman, dîrok, çîrok û gelek cure berhemên din yê rojavahiyan. Hetta wisa bi sîstemeka baş, bi rêk û pêk destanan gotiye ku di dema me de tê nîqaşkirin bê ev destan berhemên wêjeya devkî ne an ya nivîskî ne. Ji ber ku ji destanbêj û dengbêjan gelek pîvan hene. Her kesê ku hema bixwaze nikare kilam an destanekî bi sere xwe biafirîn e. Ew sîstema ku di wan de heye, dema mirov bala xwe baş bide wan an lêkolînan li ser wan bike, mirov wê sîstemê dibîne.

“Dema em behsa Homeros bikin, weka dîrok jî îsbat kiriye ku ew ne ecemî û ne jî feqîrê peyvyan bû. Belkî bê ku dewra ecemîtiya xwe jiyabe, çewa ji dayîka xwe bûye, bi firê dikeve. Her wekî lehengê destana Nyanga yê. Her çî be jî Homeros, di hunera xwe de, hozaneke ku gihaye asta herî bilind tê hesabkirin.”²

Piştî van agahiyên giştî, mirov dikare li milletên din yê dinyayê binêre bê gelo di nava wan de kilam an stran çawa hatine afirandin, mijarên stranan ango yê kilaman çî bû ne. Dengbêjî û kilamên dengbêjan bêhtir di nava kîjan gelên dinyayê de bi berfirehî cihê xwe girtine û ketiye nava zargotina wan. Pêwîste mirov lêkolînê li ser vê mijarê bike bê ka di dengbêjiyê de çî tiştên dengbêjên me û dengbêjên gelên din weka hev in an jî hev cudane, rohiyê bixin ser. Lê tiştêkî heye ku hemû lêkolîner li sere hemfikrin. Ew jî weka ku lêkolîner Barry Sanders dibêje:

“Mînakên dîrokî nişanî me didin ku çand, berê pêvajoyeke devkî jiyane û derbasî dewra xwendin û nivîsandinê bûne. Temamê zarokan vê çîrokê dijiyan.”³

¹ Walter J. Ong, *Sözlü ve Yazılı Kültür*, Weşanên Metis ê, ç. 4. , İstanbul, 2013, r. 31

² Walter J. Ong, h.b. , r. 37

³ Barry Sanders, *Öküzün A' sı*, Elektronik Çağda Yazılı Kültürün Çöküşü ve Şiddetin Yükselişi, Weşanên Ayrıntı, ç. 2. , İstanbul, 2010, r. 43

Weka ku Sanders dibêje, maka her curenivîsê, wêjeya devkî ye. Gelên dunyayê paşê ji xwe re alfabeyan çêkirine. Xwendin û nivîsandina xwe bi pêş xistine. Di pey de jî ew cureyên wêjeya xwe ya devkî xistine ser kaxezan. Ev pêvajoyeka sistematîk e ku tu kes li ser vê mijarê niqaşê nake. Weka ku li jorê jî hat gotin; carna wêjeya devkî wisa bi sistemeke baş hatiye gotin ku dû ji wan, destanên Îlyada û Odysseia ne. Kesên ku li ser van destanan lêkolîn kirine, hinek ji wan gihîştinê wê baweriyê ku ev destan, ji aliye kesên nivîsar de, li ser kaxezan, weka helbest an romanê hatine nivîsîn. Ewqas tekûz û li hev hatine gotin. Lê lêkolîner Walter J. Ong bi lêkolîneke ji devê Parry Milman, weha dibêje:

“Parry Milman dibêje; metnên Îlyada û Odysseia, di bin kîjan şert û mercan de hatibin nivîsandin jî, hatine îsbatkirin ku berhemên çanda devkî ne. Ev îsbat dike ku van destanan, peyv bi peyv hatine jiberkirin.”⁴

Di serî de me got ku dengbêjî, destanbêjî, balladvanî an bîlînbêjî li seranserê dunyayê hemû hebû ye û wê hebe jî. Wêjeya devkî tu carê di dunyayê de, ji nava gel ranabe û wê dewam bike. Madem hal ev e divê mirov here nava dengbêjiya dunyayê û balladên wan.

1.2. LI SERANSERÊ DINYAYÊ KEVNEŞOPIYA VEGUHÊZÎ YA DEVKÎ Û DENGBÊJÎ

Di serî de jî hat behskirin ku gelek millet xwedî kilam in û dengbêjên wan hene. Her gelek, kilamên wan yên li ser şer, dîrokê, evînê, şînê, leşkeriyê û xerîbiyê û hwd. hene. Di nava Rûsan û welatên ku berê di nava sînorên Rûsyayê de bû ne de, her weha li rojhilatê Ewrûpa, ji kilaman re dibêjin balad. Baladên Rûsa bi nav û deng in. Belkî mirov ji dengbêjên Rûsan û Ewrûpiyan re bêje baladvan, baştir e. Lê ev nav di nava Ewrûpî û Rûsan de nayên bikaranîn. Bi giştî navê ‘singer’ bêhtir tê bikaranîn ku ev jî zahf gotineka giştîye.

“Piştî mirina Milman Parry, meşandina xebat û projeyên wî, xwendevanê wî Albert B. Lord girt ser milên xwe. Lord, di sala 1935an de, bi navber, li Yûgoslavya ya kevin, Arnawûtîlûk û Bûlgaristanê, heya sala 1960 an, lêkolîna xwe dewam dike. Navê

⁴ Walter J. Ong, b.n.b. , r. 76

pirtûka wî bi Tirkî dibe ‘Destanların Söyleyicisi’. Dema em bala xwe didinê, bi Îngîlîzî navê orjînalê wê ye, dibe ‘The Singer of Tales.’⁵

Çobanoğlu dema ku pirtûkan ji Îngîlîzî werdigerîne Tirkî, ew jî weka mamosteyê xwe Dursun Yıldırım peyva ‘aşık’ bikartîne. Lê Ewrûpî dibêjin ‘Singers of Ballad’ û ji bo destanbêjan jî dibêjin ‘The singer of Tales’. Yanî balladvan an ballad xwende dibe weka ‘dengbêj’ ên me.

Alberts B. Lord destanbêjan weke ‘gus’ bi nav dike. Ev bi zimanê Ewrûpiyan e. Lê ne Îngîlîzî ye. Ji bo kesên ku stranên dibêjin, wan weka ‘Ballad Singers’ (ballad xwende) bi nav dike.⁶

Lê di vir de dixwazim behsa giringiya ballad xwendeyên Rûsan bikim. Rûs, di dema Çarîtiyê de û di dema Sowyeta Sosyalîst de, bi dîrokeka dûr û dirêj cînarên Kurdistanê bû ne. Her weha di îro de jî li welatê Rûsyayê û 15 dewletên federasyona wan de, bi deh hezaran Kurd dijîn. Kurd xwedî çandeka tayebet in, dengbêjiya wan û kilamên wan bi temamî serbixwe ne. Di bin bandora tu milleteke wir de nemane. Lê belê dengbêjiya Kurdan, bandorê li ser zimanê gelê Ermen û dengbêjiya wan kiriye. Ne tenha Ermen lê kêmeteweyên din jî hene ku di bin bandora dengbêjiya Kurdan de mane. Di nava kurdên Qafqasyayê de pisporê zargotina Kurmancî Tosinê Reşîd li ser vê mijarê weha dibêje:

"Bandorek gelek mezin bû, ewqas mezin bû ku gelek Ermenî, Asûrî, Kildanî şîn û şahiyên xwe bi stranên Kurdî dikirin."⁷

Lê neteweyên din weka Rûs, Kazak, Monxol, Gurcî, Azerî û Turkmen an yên din ku niha di nava sînorên Federasyona Rûsyayê de ne, hozanên wan hene û di dîrokê de balad û bîlînayên xwe afirandine. Ballad weka li jorê hate behskirin, tê wateya kilam an stranê. Lê ji bilî baladan bîlîna jî hene ku tê wateya destanan. Destanên wan, nîv kilam in. Ji aliyek de bûyer bi axaftinê gotinê û pê re jî kilama wê destanê tê gotin. Lewra ku weka nîv kilamê pejirandin. Beşa nava bîlînayan ku bi dengbêjî tê gotin, ew bi xwe dikeve nava dengbêjiyê. Destan bi xwe dayîka gelek cûrenivîsa ye ku çîrok, roman, helbest, bîaranîn jê za ne. Di vê babetê de lêkolîner Walter Benjamin dibêje:

⁵ Özkul Çobanoğlu, *Sözlü Kompozisyon Teorisi ve Günümüz Halk Çalışmalarındaki Yeri*, Ankara, 1998 r. 144

⁶ Özkul Çobanoğlu, h. b. , r. 145

⁷ Hevpeyvîna min bi Tosinê Reşîd re, Diyarbakir, 21. 12. 2012.

“Destan, şıklê herî kevn e. Ji bo ku her cûre nivîs tê de hevpar e, çîrok û roman jî di nava destanê de ye. Di nava sedsalan de, dema roman ji hembêza destanê vediqete, destana ji ‘Periya Îlhamê’ dizê, yanî bîranîn, ne weka di roman û çîrokê de lê ji wan zahf cuda derket holê.”⁸

Ballad, di nava xwe de, xwediyên taybetmendiyên in. Mînak balad hene ku ji devê jinan bo jinan tê gotin û asteka wan ya bi rêk û pêkhatî heye. Ev balad, ne bê ser û ber in. Hem wisa hatine afirandin ku bandora wan zahf zêde heye. Ji bo van balladan lêkolîner Vladimir Propp dibêje:

"Ballad têkoşîna li dijî zordariya malbatî ya çaxa navîn tîne ser ziman. Guhdarvan, bi bûyerên ku di nava balladan de ne, bawer dike û bi temamî dikeve bin bandora wan." ⁹

Ne tenha di nava Rûsan de her weha di nava Kurdan de jî kilamên wiha hene ku li dijî derketina zordariya malbatê ne û li ser bûyerên rast hatine afirandin. Siyamend û Xecê yek ji wan e. Kilama "Axawo" ya ku ji aliye dengbêj Reso ve hatiye afirandin jî, her wisa ye ku ji devê du jinan bo hev gotin e. Wê di behsa berhemên Reso de, bi berfirehî li ser vê mijarê bê sekinandin.

Di nava balladên Rûsan de, balladên qels jî hene. Sedemekî qelsiya baladên wan jî ev e ji ber ku yek lehengê baladê heye. Di eslê xwe de tu baladek nabe ku xwedî yek lehengekî be. Her tim bi lehengek re an li dijî lehengî divê lehengekî din an qehremanên din hebin. Lê baladên xurt hene ku bûyeran bi berfirehî tînin ser ziman. Li gor dengbêj û baladên Rûsan jî gelek pîvanên wan hene ku li gor wan tevna stranê datînin. Li ser vê mijarê Vladimir Propp dibêje:

"Li gor xwe qaîde û sînorê stranê heye. Ji ber ku ev ne li gor cûrêyên kilaman tînin tesbîtîkirin, di hinek haletan de tînin îhlalkirin. Guherandin, belavebûn û serbestiya stranê dibe sedemê ku stran temen dirêj be. Lê di cûrêyên lîrîk de her tişt bêhtir li ser firehiya xeyaldanîna wê bi xwe ye."¹⁰

Ev taybetmendiyên stranan ku lêkolîner li jorê behs dike, heman tişt di kilamên Kurmancî de jî hene. Em gelek cara di yek kilamek de gelek guherînan dibînin ku ev dibe guhertoyên kilamekê. Mînakên vê gelekî: Dewrêşê Evdî heya ji Wêranşehrê an ji Çiyayê Şengalê digêje herema Xerza, Serhedê û nava Kurdên Qafqasyayê gelek guherînan

⁸ Walter Benjamin, *Son Bakışta Aşk*, Weşanên Metis ê, ç. 6. , İstanbul, 2012, r. 90

⁹ Vladimir Propp, *Folklor, Teori ve Tarih*, Weşanên Avestayê, ç. 1. , İstanbul, 1998, r. 52

¹⁰ Vladimir Propp, *b.n.b.* , r. 57

dikevê. Ev, di stranê de gelek normal e. Lê tiştê ne rast ew e ku bingeh û naveroka stranê biguhere. Ev yek, her weha di kilama li ser Binevşa Narîn de jî tê dîtin û mînakên wê gelek in. Di destana Dewrêşê Evdî de heman tiştên dîtin. Kilama li ser Filîtê Quto û Eliyê Etmankî de, heya kilam ji herema Xerza, ji Deşta Bişêriyê diçe welatê Serhedê, gelek guherîn dikeve nava kilamê. Lê bingeha stranê naguhere û armanc yek e.

Heta mirov dikare bêje carna peyvên nava stranê ji herêmek bo herêmeke dinê diguhurin. Peyveka ku di heremêkî de tê wateyekî di herêma dinê de dibe ku ateya wê cuda be. Pêwist e ev di nava tevahiya zimên de bê watedayîn. Heta dibe ku wateya wan ji tevgerên bedenî û hestan jî bê fêmkirin. Walter J. Ong tesbîteka weha kiriye:

“Di çanda devkî de ferheng tune ye û di navbera wateyan de kêmkirî heye... Peyv di dema bikaranîna peyvê de, di nava şertan de ciyê xwe dibîne. Ew jî ne weka di ferhengan de lê herektên dest-mil, asta bilindahî û nizmahiya deng, îfadeyên rû û dema peyv tê gotin, bi temamê hebûna mirovî tê vatedayîn.”¹¹

Li welatên ku berê û îro jî hinek ji wan di nava sînorên Federasyona Rûsyayê de ne de, gelek ballad hene ku hatine gotin û heya îro jî hatine. Di nava wan de yên Kazakan, Turkmenan û Azeriyan jî hene. Hetta balladên ku di dema êrişên Mongolan de li ser talan û komkujiya wan hatine gotin, heya îro di nava xelkê de bi berdewamî tê gotin. Mînak, yek ji wan strana ‘Lê Yarê’ ye ku hunermenda Kurd Yelda Abbasî weka albumekê derxistiye.

Ballad, ne tenha di nava Rûsan û welatên der û dora wan de lê li gelek heremên din yê dinê, bi berdewamî hebûne û hatine afirandin. Ballad jî wek kilamên Kurdî li ser bûyeran hatine avakirin. Di dîrokê de jiyan li ku derê hebûye, dengbêj û kilam ji wir derketin e. Lêkolîner, di mijara çûna lêkolînên nava dîrokê de, gelek caran kilaman an bi gotineka din balladan weka çavkaniyan bikar anîne. Lê mirov nikare bêje misoger kilam an ballad bi temamî çavkanî ne. Di kilam an balladan de agahiyên ku hene, zahf caran yekalî ne an di wan de şaşî hene. Heta weka li jorê hate behskirin, di balladekî de yek leheng hebe wê çewa weka çavkanî bê pejirandin. Lê gelek fikr û ramanan didin mirov. Di vê mijarê de lêkolîner Eric J. Hobsbawm, li ser eşqiyan û balladên ku li ser wan hatine gotinê de, balladan weka çavkanî bikaraniye. Weha dibêje:

¹¹ Walter J. Ong, *b.n.b.*, r. 63

"Min di vê lêkolîna xwe de li ballad û helbestan nêrî. Dema ku rastiyên eşqiyatîyê dibe mijara me, ew aqîl û mantiqa xelkê ku tiştan di helbest û baladan de gotine, bi wan bawerî nayê anîn. Tevî wê jî helbest û balladên ku li ser bingeha rastiyê hatine gotin, li ser eşqiyatîyê û dora wê ya civakîyê gelek agahdarî didin me."¹²

Lêkolîner di vê gotina xwe de tesbîtekî dike. Kilam tu cara nabe çavkaniyeka bi tamamî. Tenê dikare agahdariyan bide mirovî û pêwîste mirov heya karibe here nava lêkolîneka baş ya dîrokî ku di nivîsa meriv de xeletiyên giring çênebin. Di beşa kilamên ku Resoyê dengbêj gotine an çêkirine de, bi kilamê re, lêkolînen dîrokî dê bîn kirin da rastî an xeletiya di nava kilamê de bê famkirin.

Di nava ballad, kilam, destan an bîlînan de dema yek leheng hebe, weka me li jorê behs kir, wate nakeve nava berhemê. Dibe ku di nava kilamê de lehengên sereke hebin û yên ku rola wan kêmtir bin, bêhtir bi qelsî behsa wan bê kirin. Ev qaîde divê di tamamê dunyayê de yek be. Li ser vê mijarê lêkolîner Walter J. Ong weha dibêje:

"Ew kesayetiyan girîng û giran ku herkes wan nas dike, tevgerên bi bandor kirine, tu kes nikare bi hêsanî ji bîra xwe bibe. Ji ber wê ye, ji bo parastina bîreweriya bûyeran, kesên qedirbilind û leheng dertên holê. Kesên kesayetiya wan kêmtir an qels be, di bîra hunera devkî de namîne."¹³

Ji balladên rojavayîyan gelek hene ku li ser Robin Hood hatine gotin. Digel ku Robin Hood bi sedan salan berê jiyaye jî, baladên ku di derbareyê wî de tên gotin heya roja îro jî hatine. Îro jî baladên li ser Robin Hood, di nava xelkê rojava de berbelav in. Balad di bingeha xwe de li seranserê dunyayê hatine gotin. Mirov dibîne ku li seranserê Amerîkayê jî gelek balad hatine afirandin û gotin.

Dema mirov li dîroka Perûyê dinhêre, mirov dibîne ku li wir jî gelek ballad hatine gotin. Her weha li başûrê rojhilatê Ewrûpayê gelek ballad hatine gotin ku piraniya wan li ser voyvodayan in. Her wisa jî li Brezîlyayê bi berfirehî li ser mijarên cuda û bi gelek awayan ballad hatine afirandin û tên gotin. Hetta baladên wan ji aliyê nivîskaran de rêtine ser kaxedan jî. Mirov ji wan belgeyan digihîje encama gelek balladan. Rêtina gotinên balladan ser kaxezan, di gelek netewayan de berya Kurdan dest pêkiriye. Lê mirov dikare bêje ne balladên dinyayê û ne jî yên Kurdan heya roja me bi tamamî neketine ser kaxezan. Ji bo Kurdan dikare bê gotin ku ji sedî 5 jî neketine ser

¹² Eric J. Hobsbawm, *Eşkiyalar*, Weşanên Avestayê, ç. 1. , İstanbul, 1997, r. 9 -10.

¹³ Walter J. Ong, b.n.b. , r. 88.

kaxezan. Lê gelo dema wêjeya devkî bi tayebtî destan an jî kilam bikeve ser kaxezan çiqas wateya xwe dikare biparêz e, ew jî mijareka dine ye. Ji ber gelek taybetmendiyên kilam û destanê wenda dibin. Ferqeke mezin dikeve navbera tiştên devkî û nivîskî. Lêkolîner Barry Sanders di vê babetê de weha dibêje:

“Gelên ku pêwendiyên wan bi xwendin û nivîsandinê tune ne, jiyana xwe li dora sîstema nivîsekê danaynin. Ne ji ber ku hestan najîn. Berevajiyê wê, gelên ku çanda devkî dijîn, tiştên ku dizanin nakin qaîde û naxin nava xwe û ne li guhên xwe didin wijdana xwe. Ew bi mînakên hîn dibin. Jiyana xwe ya bi hestan, gotinên tevgerên rast û çîrokan, tekrar tekrar guhdarî dikin û jiyana xwe dadigrin.”¹⁴

Weka ku lêkolîner jî behs dike, tama berhemeke weka kilam, destan an çîrokdema mrov li ser kaxez bixwîne û dema mirov ji yekî hudaî bike, di navbera wan de zahf ferq heye. Hest, mîmîk, bilindahî û nizmahiya deng, tevgerên bedena bêjer, tameka dinê dide berhemê. Heta mirov dikare bêje di roja me de jî hinek dijberî di navbera parastvanên wêjeya devkî û nivîskî de heye.

Li Îspanyayê jî li ser mijarên ji hev cuda gelek balad ji aliyê baladvanan de hatine gotin. Eşqiyayên dinyayê bi tevahî xwe didan ber bi çiyayan de. Hêzên ewlekariyê an hêzên dewletên hebûyî ji bo ku wan bigrin û ceza bikin an ji bo ku wan bidin kuştin, bo serê wan xelatan datanîn ku ev di dîroka Kurdistanê de jî gelek caran bûye. Di balladeka Îspanyolan de behsa mijarek weha heye ku lêkolîner Eric J. Hobsbawn weha nivîsandiye:

"Tenê ji bo serê wî, wê bidin 2 hezar kaymeyên (pere) zîvî. Gelek kes xwestin bibin xwediyê peran lê biserneketin. Tenê rêhevalên me bûn xwedanê wan peran."¹⁵

Di vê balladê de jî diyar dibe ku jendirme û hêzên din yên ewlekariya Îspanyayê ev eşqiyayê ku li serê balad hatiye gotin, bi hin eşqiyayên din dane kuştin û xelata wan dane wan. Ger em di vê mijarê de, li dîroka eşqiyayên Kurdan binêrin, em ê bibînin ku gelek kilam li ser wan hatine gotin. Ger mirov mînakekê bide; kilama li ser Koçero xweştirîn mînake ku li ser eşqiyayek Kurd hatiye gotin. Li her derê dinyayê eşqiyatî bi bûyerek an bûyerên adî dest pêdike û gelek caran, di dawiyê de ev eşqiyatî dibe mijareka siyasî, pê re jî qehremanên eşqiya jî dikevin kirasên siyasî. Eger div ê mijarê de mînakek ji dîroka Kurdan bê dayîn, Broyê Heskê Têlî, li Agiriyê weka eşkiya

¹⁴ Barry Sanders, *b.n.b.*, r. 76

¹⁵ Eric J. Hobsbawn, *b.n.b.*, r. 54

derket çiya û paşî bû sedem ku serhildana Agiriyê dewam kir û kete kiraseke siyasî. Her weha Koçero jî yek ji wan eşqiyayan e.

Dema mirov bi çavek giştî li stranbêjiya dinyayê dinêre, stranbêjî li seranserê dinyayê hebû ye û îro jî dewam dike. Li ser naverok û şiklê balladan, heya hunera bikaranîna ziman di nava balladan de, mirov dikare gelek tiştan bêje. Li her derê dinyayê, ew ciyên ku jîngeh bûne û mirov tê de jiyane, xelk jî xwe re kilaman afirandine. Bûyeran, dîroka xwe, xwezaya xwe, evîna xwe bi awayek devkî anîne ser ziman. Di nava Kurdan de gotinek heye ku bi taybetî di nava dengbêj û hunermandan de tê bikaranîn:

" Ji dema ku deng hebûye, dengbêjî jî hebûye."

Eger em mînan zêde bikin, yek ji destanên mezin bi nav û deng jî di derbarê dîroka Îngîlîzan de ye ku di zimanê wan de jê re tê gotin Beowulf. Ev jî ji asta devkî ketiye ser asta nivîskî. Her dû jî dewam dikin lê ya nivîskî bêtir meqbûl e. Lêkolîner Walter J. Ong behsa vê mijarê weha dike:

“Beowulf, heya roja me hatiye parastin. Destana Îngîlîzan ya herî kevn e. Mijara wê dîroka Danîmarkiyayî e ku bapîrên Îngîlîzan e. Destan li dora 30.000 rêzikane. Di sala 1805 an de navê Beowulf danê û di sala 1815an de, hatiye çapkirin.”¹⁶

Di Awrûpa de, bi taybetî di demên ku hêj xwendin û nivîsandin ewqas bi pêş neketibû de, destan û kilam zahf li pêş bûn. Paşê lêkolîner li seranserê Ewrûpayê herêm bi herêm geriyane û li ser wan lêkolînan kirine. Ji baladvanên cuda heman destan an baladê guhdarî kirine û qiyasa wan kirine. Belkî mirov dikare bêje bê du neteweyên cîran, çewa ballad û destanan gotine, bandora wan li ser hev çiqas çêbûye û cudatî û eynîbûna wejeya wan daniyê holê. Walter J. Ong ku di vê mijarê de lêkolînan kiriye, dibêje:

“ Lord, di gerên xwe yê dirêj de, xebatên ku Parry nivcû hiştibû temam kiriye. Di van gerên xwe de, kilam û destanên Sirp û Xirwatan, bi hozan û aşiqan re axifîye û pirtûka xwe ya bi navê The Singer of Tales (Dengbêjê Destanan-1960) derxistiye.”¹⁷

¹⁶ Walter J. Ong, *b.n.b.*, r. 52

¹⁷ Walter J. Ong, *b.n.b.*, r. 42

Lê ferqeke mezin di navbera dengbêjiya Kurdan û milletên li jor navborî de heye. Em bi xwe ji 200 salan û vir de, dengbêjên Kurdan, bi navên wan, wan nasdikin. Herema wan, jiyana wan, bi giştî berhemên wan em hemû dizanin. Mixabin di lêkolînên li ser bûyerên welatên cûr bi cûr de, em navên dengbêjên wan, nivîsarên balad û bîlînayên wan nabînin. Belkî jî ew alav û çavkaniyên ku di destê me de hene, têra pêzanîna wan nakin. Fikra ku aqil qebûl dike ev e ku materyalên di destên me de ne, kêma in û belkî yêna din nehatine wergerandin bo zimanên ku em dizanin.

1.3. DENG BÊJIYA NETEWÊYÊN CÎRAN Ê KÊMNETEWÊYÊN LI SER AXA KURDISTANÊ

Di nava cîranên Kurdan de, neteweyên cîran û weka kêma netewe jî yêna ku li ser axa Kurdistanê jiyane, yek ji wana netewa Ermenî ye. Weka li jorê jî me ji devê Tosinê Reşîd behs kir, Ermeniyên li ser axa Kurdistanê gelek ayînen xwe, dawet, şîna û şahiyên xwe bi zimanê Kurdî kirine. Di nava dengbêjên Ermenan de gelek dengbêj hene ku berhemên xwe bi Kurdî dane. Dengbêjiya wan safî û carna jî têkil, bi du zimanan bûye. Di nava wan de yêna herî navdar Garabête Xaço ye. Hemû kilamên wî yêna Kurmanciya jorîn in. Ew wek kesek Ermenî di nava Kurdan de, li Batmanê li gundê Bileyderê û paşî li gundê Heznemîra li ser Bişêriyê, jiyana xwe heya sala 1928 an dewam kiribû. Di berdewamiya jiyana xwe de li başûrê biçûk jî, tevî di nava Kurd û Ermenan de dijiya, ew car din dengbêjiya xwe bi Kurmancî dewam dikir. Piştî sala 1946 an ku diçe Ermenistanê jî her weha dengbêjiya li der û dora xwe û ya di Radyoya Yêriwanê de bi Kurmancî dewam kiriye. Li ser jiyana û berhemên Garabête Xaço, televîzyona Kurd 1 ê filmek dokumanterî ku 120 deqe dewam dikir, amade kir û weşand. Ji derveyê film jî hevpeyvîneka li dora 5 sietan bi Garabêtre ku me di sala 2002 an de kiribû di destê min de heye. Dema zarokên wî an bûkên wî bi Garabêtre re bi Ermenkî diaxifin, Garabêtre bi Kurmancî bersiva wan dide.¹⁸

Ev bi xwe nayê vateya ku Ermenî, ne xwedî dengbêjin an kilamên wan tune ne. Kilamên wan û dengbêjên wan jî hene lê gelek qels in. Em bêhtir dikarin bêjin ku hunermendên wan hebûne û îro jî hene. Bi sedema ku di ola Ermenan de amûrjenî ne qedexe ye û ola wan destûr dide wan ku bi stranên re amûran bijenin, ev mijar jî dengbêjiyê dertê û dibe babeta hunermendiyê.

¹⁸ Bernameya 'Dengên Axê', Televîzyona Kurd 1 ê, 2008, Amad. Mahmut Beğik, Paris, ji arşîva Mahmut Beğik.

Her weha Aramê Tîgran jî yek ji Ermeniya ye ku bi Kurdî straye û kilamên xwe bi Kurdî gotiye. Di nava kilamên wî de, kilamên bi zimanê Ermenîkî hene lê gelek kêman in. Ji bilî çend kilaman, yê din ew kilam in ku ewilî bi helbestî hatine nivîsandin û paşî ji wan re beste hatine çêkirin. Li gor hevpeyvîna ku berya mirina wî pêre hat kirin de, dibêje ku bavê wî gelek caran gotinên kilamê dinivîsand. Carna wisa dibû ku di 4 ê sibê de bi yek carek ji nava ciyê xwe radibû û kilama ku gotinê wê nivîsandiye, bi deng digot û nedihîşt diya min bi rihetî razê. Aram gelek caran li gor hinek lêkolînavan bêhtir hunermend tê qebûl kirin lê dengbêjiya Aram jî hebû. Eger em Aram dengbêj an hunermend qebûl bikin, Aram ji seda 95 bêhtir bi Kurdî straye.

Dengbêjeka din ya bi nav û deng hebûye ku navê wê Gula Fille bû ye û dengbêja Surmeli Mehmet Paşa bû ye. Ew bi xwe bi Kurdî kilaman gotiye û bi Evdalê Zeynikê re hevçerx bûye. Jiyana wê, li der û dora Agiriyê, Îdirê û Bazîdê bû ye. Di pêş de, di behsa dengbêjiya Resoyê Gopalan de, dê bi berfirehî behsa wê bêkirin ji ber ku Reso di zarokatiya xwe de, di civata wê de kilaman gotiye. Lê nayê zanîn gelo di vê mijara neteweya Gula Filleh de, gelo Gulê Eremen e an Kurdê Mesîhiye nayê zanîn.

Di nava dengbêjiya Kurdan de, çewa kilam hene ku bûne nemir û bûne destan, her weha di nava gelê Ermen de jî ev heye. Mînak "Sari Galin" tevî ku ne destane jî, di nava xelkê de bûye weka destanekî. Ev kilam, ji nava Ermeniyên ku li der û dora Erzeromê dijiyan derketiye û belave bûye. Hetta hatiye wergerandin bo zimanê Tirkî jî. Lê dereca rastiya wergera wê heya çî astê rast e, mijareka din ya bi serê xwe ye. Di nava destanên an kilamên Ermenan de hinek tişt hene ku weka yê Kurdan e an yê Kurdan weka yê wan in. Li herema Sasonê bi gurrahî Ermenî dijiyan û destanek wan ya bi navê Davidê Sasûnî heye. Zozan Osmanyân li ser vê destanê weha dibêje:

"Di çanda rojhilat de, bi taybetî di ya Kurdan de, rola hespê gelek girîng e. Hespê Memê alîkariya Memê dike da riya Cizîra Botanê bibîne. Em mînakek weka vê, di destana Ermeniyân de ya bi navê Davîdê Sasûnî de dibînin. Di vê destanê de hespê bi navê Kurik Celalî alîkariya qehremanê destanê dike."¹⁹

Ev mînak nîşanî me dide ku di dengbêjî û destanbêjiya Ermen û Kurdan de gelek tişt dirûvê wan li hev dide. Belkî ev bandoreka destana Memê Alan e li ser ya Ermeniyân. Di bîrahiya min de tenê yek gundek Eremeniyan li herema Sason mabû,

¹⁹ Zozan Osmanyân, *Muzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî*, "Kürt Folklorunda Epik Destanlar", Amad. Mehmet Bayrak, Weşanên Özge, Ankara, 2002, c. 1, r. 554

gundê bi navê Herendê. Heya sala 1963 yan jî ola xwe neguhertibûn. Lê hemû dawetên wan, şîn û şahiyên wan bi Kurmancî bûn. Di gundê wan de dêr tunebû lewra îbadetê xwe di mala xwe de dikirin û bi Kurmancî dikirin.

Li ser axa Kuridistanê kêmeteweyên din weke Asûrî, Keldanî û Erebbî hene ku dijîn. Dema em li bingehên rîtm û maqamên stranên wan dinêrin, di bin bandora kilamên Kurmancî de mane û koka wan kilaman diçe ser Kurmanciyê. Ne tenê kilamên wan yê dengbêjiyê lê her weha kilamên wan yê di dawetan de jî dihatin gotin, bi Kurmancî bûn. Kêmeteweyên wan hebûn ku bi zimanê wan bûn. Ev awa hê jî berdewam e. Îbadetên xwe yê olî bi zimanê xwe dikin û ji pirtûkên xwe yê olî dikarin metnên xwe yê pîroz bixwînin. Lê ev metnên pîroz nakeve nava mijara me ya dengbêjiyê. Di salên dawiyê de zimanê xwe car din berfireh kirine û axaftina wan bûye zimanê wan yê dayîkê. Mektebên xwe niha pêşde birine û gihane zimanê xwe yê xwezayî.

Ji bilî Ermen û kêmeteweyên din, Tirk jî cîranên Kurdistanê ne û bi rex Kurda ve dijîn. Di nava dengbêjiya Tirkan de, dengbêj hene ku ji wan re dibêjin "ozan". Li hin heremên Tirkan, ji wan re dibêjin "aşîk". Ev ozan an aşîqên Tirkan gelek kilaman afirandine. Piraniya kilamên wan xwezayîne. Hinek ji wan niştecî û hinek ji wan gerok in. Li gundan, li bajaran digeriyan. Diçûn geşt û seyranan û kilamên xwe digotin. Lê di nava wan û dengbêjên Kurdan de gelek ferq hene. Aşîq an ozan her tim bi saza xwe digeriyan. Di dengbêjên Kurmancan de ev taybetmendî tune ye. Tenê em dikarin herema Şingal û xetta başûr jê derînin. Ji Şingalê heya Herzex, Nisêbîn, Dêrik û heya Çiyayê Kurmanca, di dengbêjiya vê xetê de amûrjenî an sazbandî heye.

Ev xetta ku li jorê min behs kir û ozan, aşîqên Tirkan ji hinek aliyan de dişihabin hev. Lê ji bilî vana gelek dengbêjên Tirkan hene çî di eslê xwe de Kurd bin û çî jî Tirk bin, gelek kilamên Kurdan wergerandine zimanê Tirkî û strane. Jê û wêdetir jî çûne, naverok û gotinên di kilaman de guherandine, ji Tirkan re kirine mal. Ger di nava Tirkan de bêhna dengbêjiya ku em behs dikin hebe jî ew bi giştî ji bandor û berhemên dengbêjiya Kurdan û kilamên Kurdan tê. Li ser vê mijara girîng lêkolîner Mehmet Bayrak dibêje:

"Kilamên Kurdan kirin bi zimanê Tirkî. Di ser de jî, wan ji naveroka wan dûr kirin. Bi wergereka zor û ne li gor bingeha kilaman stran. Hinek gotinên ku ji zimanê Kurmancî nayên wergerandin bo zimanê Tirkî, ji navê derxistin."²⁰

Li ser vê mijarê gelek çavkanî hene ku lêkolîner Mehmet Bayrak di berhema xwe de daye. Ne tenê ew lê em bi xwe jî şahidên gelek kilamane ku ji Kurdî çewa bi rengê xelet hatine wergerandin bo zimanê Tirkî û strane. Li ser vê babetê bi sedan dengbêjên Tirkan û bi hezaran kilamên Kurdan hene ku mirov dikare weka mînak bide. Di televizyona Kurd 1 ê de, di bernameya "Dengên Axê" de, li ser dengbêj û helbestvanên Kurdan bername dihatin çêkirin. Mijara bernameyekî jî li ser dengbêj Huseynê Orginosî (Huseyno) bû. Li ser jiyana û berhemên wî. Radyoya Erzeromê Huseyno dawet dikan Erezeromê û jê dixwazin ku çiqas kilamên dengbêjan hene wergerîne Tirkî da bixin nava arşîva xwe. Lê Huseyno di vir de daxwaza wan qebûl nake û teklîfa wan red dike. Ji ber ku Huseyno ji dengbêjiya Kurdî gelek hez dikir û di wê fikrê de bû dema ku stranên wergerîne Tirkî, tiştek di wan de namîne. Hem dema ku li ser eslê kilaman bê wergerandin jî, di nava wan de gelek mijar hene ku ne li gor pîvana siyaseta dewletê ne û dewleta Kemalîst razî nabe ku ew kilam welew li ser esasê xwe jî hatibe wergerandin, tu kes bibêje an ji aliyê dewletê de bê qebûl kirin.

Ji xwe dewlet ji sala 1909 û heya van salên paşî jî zimanê Kurdî qedexe kiribû. Nedihişt ku berhemên Kurdî yê nivîskî bîr weşandin û di ser de jî çanda Kurda ya devkî ku kilam jî di nava wê de ye, li gor siyaseta xwe ya adapteyê, nedihişt ku belav bibe. Di vê mijarê de, ez ê di pêş de, di behsa dengbêj Resoyê Gopalan de behsa qedexekirin û xerabkirina dengê wî bikim bê dewlet çewa astengiyan dida ber dengbêjên Kurdan.

Neteweyeka din ku cîranê Kurda ye û bandorê li ser hev kirine Faris in. Di dîrokê de Kurd û Faris gelek caran bi hev re dewletan îdare kirine. Bandora dengbêjiya wan li ser hev heye lê dema mirov li dengbêjiya Farisan dinêre li gor Kurda ya wan bêhtir hêdî (slow) ye. Ji aliyek din de ger em qiyasa her du muzîkan bikin ku di dengbêjiya wan de jî wisa ye, em ji lêkolîner Christian Poche bixwînin:

"Muzîka Kurda ne safî ya perwerdekiri ye ne jî safî ya gelêri ye, her du bi hev re ne. Weka muzîka Persan, muzîka Kurdan jî bi coş û hîssiyat e. Hewayek wê ya hezîn

²⁰ Mehmet Bayrak, "Tarihsel Gelişimi İçinde Kürt Kültürü ve Bugünkü Durum", b.n.b. , r. 25

heye. Tevî ku her du jî nêzî hev in, terzgotina wan ji hev cuda ne. Dema mirov guhdarî dike, mirov tevîhev nake. Muzîka Persan bêhtir rafîne ye (hatiye safîkirin) lê ya Kurda ji dil tê û suruştî ye."²¹

Li jorê lêkolîner behsa muzîkê dike lê muzîk û dengbêjiya Kurdên rojhilat hinek di nava hev de ye. Di vir de, dixwazim mijarê bînim ser eslê wê, ser dengbêjiyê. Dengbêjiya Kurmanciya jorîn di Îranê de gelek kême. Dengbêjên wan jî gelek kême in. Sedem jî ev e ku Kurmancên jorîn li rojhilat kême in. Piraniya Kurdên Îranê Kurmancên jêrîn in ku ev sed sale wek soran tên bi navkirin. Em nikarim bêjin ku Farisan li ser dengbêjiya Kurmanciya jorîn bandorê hêlane. Lê weka hunerî bi saz û amûrên xwe ve mirov dikare bêje hemû neteweyên li ser axa dewleta Îrana îroyîn, bandorê li ser hev kirine. Di nava wan de Faris, Belûcî, Azerî, Peştûyî, Kurdên Soran, Ereb hene.

1.4. LI GOR PÎVANAN DENG BÊJÎ

Li ser babeta ku dengbêj ji kî/kê re tê gotin û dengbêjî çiyê de gelek fikr û raman hene ku lêkolînan li serê li hev dikin an jî hev vediqetin. Di nava van mijaran de mijara sereke ew e bê ka di dengbêjiyê de sazbandî heye an tune ye. Di vê mijarê de hene ku di dengbêjiyê de qet sazbandiyê qebûl nakin. Beşeka din ew in ku di dengbêjiyê de heya sînorekê sazbandiyê qebûl dikin. Lê ji bilî van her du ramanan, hin kes hene ku her du aliyên jî qebûl dikin. Di vê mijarê de gelek tişt hene ku bandora xwe li ser van fikr û ramanan dikin. Li ser vê babetê heya ji destê min were ez ê fikr û ramanan deynin rex hev û bigîjim encamek. Li ser vê mijarê Adrurahman Gümğüm di makaleyek xwe de weha şirove dike:

"Dengbêjî girîngtirîn tişt e ku berhemên folklorîk yê çanda Kurdan, ji rojên berê gihandine heya roja me. Dengbêj ji daxwazên xelkê baş famdikin, parêzvanên çanda Kurda ne û wezîfeya çavdêriya çandê dane ser milên xwe. Di çanda Kurdan de dengbêj zanayên zanistîya gel in."²²

Di nivîsa Abdurahman Gümğüm de danasîneke weha heye. Mirov dikare fikra wî qebûl bike lê danasînek kême e. Lê di berya vê de, behsa nebûna dengbêjan di roja me de dike. Dengbêj Resoyê Gopala weka kesê herî dawî di dengbêjiyê de qebûl dike. Lê esas di pey Reso de jî gelek kes hene ku dengbêjiyê heya îro didin dewam kirin. Di

²¹ Christian Poche, "Kürt Müziği", Berhevkar Mehmet Bayrak, *Müzik, Dans û Şarqiyên Kurdî*, Weşanên Özge, Ankara, 2002, c. 1, r. 125.

²² Abdurahman Gümğüm, www.kovarabir.com, *Kürt Folklorü ve Reso'nun Stranlarında Kürt Folklor Unsurları*, 16 Hezîran 2012.

nava wan de Şakiro, Huseynoyê Orginosî, Brahîm Newrozî, Nadir Zêtî, Cemîl Horo û gelek kesên din hene ku yek ji wan jî îro najîn. Gumgum, dengbêjan ji stranbêjan cuda dike. Ev fikra ku stranbêj ji dengbêja cuda ne rast e û piraniya lêkolînavên Kurdan jî wisa dipejirînin. Stranbêj ew kesin ku stranên berê, ji aliyên dengbêjan de hatine afirandin û hatine gotin, di roja me de dibêjin. Lê Gûngûm behsa tunebûna dengbêjan dike. Bi taybetî di roja me de dike. Ji bo ku mirov bikaribe vê fikra hanê bêje, divê mirov seranserê Kurdistanê baş bizane û dengbêjan jî baş nasbike. Di îro de gelek dengbêj hene ku tên nasîn. Gelek taybetmendiyên dengbêjiyê hene ku dema mirov behsa wan bike, di roja me de dengbêj hene an tune ne, wê li gor van tesbîtan diyar bibe.

Ger em car din li ser dengbêj û dengbêjiyê rawestin, gelek sedem hene ku dengbêj çêbûne û kilaman afirandine. Lêkolîner Tosinê Reşîd dibêje:

"Dema di hundirê mirovan de hestnên bi hêz hev digrin, mirov hew dikare wan hestnan di hundirê xwe de bend bike. Ne dûre dengbêjî, ji yekemîn şeweya diyarkirina hestan e. Dengbêjî şeweyeka hunermendi ye. Beşeka sazbandiya gelêri ye. Kilam şeweyeka huner e û pêwistiya mirov her dem bi hunerê heye. Dengbêjî yek ji kevintirîn hunera mirovaye li dûbarê dinê. Stran, di dema şîn û şahiyana de tê gotin."²³

Belê yek ji kevintirîn hunera kevin li dunyayê ye. Ev tesbîta rast mirov dibe heya destpêka destanbêjiyê ku Homeros yek ji wan destanbêjên herî bi nav û deng e. Berê jî behsa Homeros hat kirin ku xwedî ciyeke zahf girînge di destanbêjiya dunyayê de. Ji bo dengbêjiyê zahf şirove û danasîn hene û divê heya mirov karibe wan bixe nava vê teza hanê. Lêkolîner Barry Sanders şiroveyeke weha dike:

"Hozanekî ku di çanda devkî de dijî, tiştên ku civak ji berê de dizane, tîne cem hev, weka rêzên qaliban, bi hûrahiyên ku tên dubarekirin dixemilîne û çêdike. Tiştên ku îro em fêmdikin û yên nû nikare li xwe bixwunufîne, weka ku tişteke biyanî be davêje derve."²⁴

Dengbêj pir caran hestên xwe ji bûyeran digrin û li ser wan bûyeran kilaman diafirînin. Carna li ser du an sê hevokên jinan ku di şîna de, li ser bûyêrê, hestên xwe tînin ser zimên, ew ji dengbêj re dibe sûd û kilama xwe li ser wê bingêhê datîne. Dayîkên wan çewa çend hevokên li hev hatî li ser kurê xwe dibêje, ger dengbêjek li wir

²³ Ji hevpeyvîna min bi Tosinê Reşîd re, Diyarbekir, 12. 12. 2012.

²⁴ Barry Sanders, *Öküzün A'sı, Elektronik Çağda Yazılı Kültürün Çöküşü ve Şiddetin Yükselişi*, Weşanên Ayrıntı, ç. 2. , İstanbul, r. 21

hebe, wê hevokan lê zêde bike û bi tamamî, jê kilamek baş çêbike. Ew dayîk, weka mînakek hestên xwe xweş tîne ser zimên. Li ser gotina Tosinê Reşîd, gelek kilam hene ku wisa hatine afirandin. Kilama li ser Keremê Qolaxasî û Evdal, ya li ser Fersende Begê Hesenî, ya li ser Emê Gozê û ya li ser Filîtê Quto mînakên ji wan in.

Pênaseyeka cuda jî ku li ser dengbêjiyê hatiye kirin, ya ji aliyê lêkolîner Zeynep Yaş de weha ye:

"Dengbêjî; peyvek ji "deng" û "bêj" çêbûye. Lê di zanistiyê de vateya wê, kirina hostatiya peyvê ye, çewayiya xistina bûyerêye ku mirov dixê ser dengê lê bi xîtabeteka herî baş. Yê ku gotinên herî baş dibêje, dengê herî baş derdixê, hafîzaya wî/wê fireh, yê ku bûyerê dikare baş şirove bike û bikaribe bixê zargotinê, peyvê bike kelim, kelimê bike kilam, nefes bide gotinê û rihek bide kilamê, ew dengbêj e."²⁵

Di pênaseya Zeynep de qet behsa amûrên muzîkê tune ye û nayê kirin. Ev tê vateya ku dengbêjî bê saz dibe. Lê li gor Tosinê Reşîd, dibe ku di dengbêjiyê de sazbandî hebe. Lê hin tişten girîng li vir dertên holê ku yek ji wan gotinên baş, bi rêk û pêk di stranê de hebin. Dengê baş pêwîste. Ne pêwîste ku deng xweş be lê divê deng baş bê bikaranîn. Hafîzaya dengbêj gelek fireh be. Nefesa xwe baş bi kar bîne û rihek xweş bide stranê. Stranê xweş bixemilîne. Ev hemû ji taybetmendiyên dengbêj û kilamê ye.

Lê ev hemû bo dengbêjiyê ne bes in. Divê mijar firehtir bê şirovekirin û çî nêrînên cuda hebin, tev bî gotin. Hûrbûna li ser vateya dengbêj, dengbêjî û kilamê pêwsîte baş derê holê. Ev babet bi salan in di nava lêkolîner û hunermendan de tê munaqesekirin lê kes hêj negihaye tu encamê. Car din li ser vateya dengbêj, Kendal Nezan weha dibêje:

"Piştî ku kilamek hat çêkirin, bi amûrek hevalbendîya wê tê kirin. Ew kilam gund û gund, seranserê welat, di geryana dengbêjan de, ji aliyê dengbêjan de tê belavkirin û dibe malê tevahiyê (anonim). Dengbêj ji bûyîna xwe de, xwedî hafîzayek têr baş, xwedî dengê xweş û belkî gundiyekek amûrjen e. Dengbêj tenê berhemên cîh (heremî)

²⁵ Ji hevpeyvîna min ya bi Zeynep Yaş re, Diyarbekir, 15. 12. 2012.

ji seriyek welat bo seriyê din belav dike, ne tenê di pêşdeçûna çanda Kurdan de dibe kirdeyek, di heman demê de ew bi xwe jî aferîner, helbestvan û bestekare jî."²⁶

Li gor Kendal Nezan jî dengbêjî dibe ku bi amûran bê xemilandin. Li gor wî, ev taybetmendiyeka dengbêja ye jî. Dibe ku bê amûr be jî. Kilam hene ku anonîm in. Dengbêj û aferînerê wê nayê zanîn. Bi giştî mirov dikare ji bo kilamên govendê, yên dema karkirinê ku tên gotin an yên bo lorandina zarokan tên gotin bêje ku hemû anonîm in. Kilamên şer, bengîtiyê, mêrxasiyê, dîrokî, xwezayî, evînî û hwd. hene ku ji berê de hatine gotin û dengbêjên wan ne diyar in. Ev kilam hemû anonîm in. Lê kilam hene ku dengbêj, aferîner û bestekarên wan aşkerane û ew malên wan kesan e. Di pêş de, dê bê dîtin ku dengbêjê mijara tezê, Resoyê Gopala çi kilam afirandiye û kilamên kîjan dengbêjan weka stranbêjek gotiye. Lêkolîner Barry Sanders bi şiroveyeke din tevî mijara dengbêjiyê dibe:

“Hozanê ku ji ava Mnemosyne yê vexwariye, pêwendiyên wan kesên ku mirine û di binê avê de ne, alîkarî dike ku pêwendiyên wan û zindiyan bimeşe. Lê yên xwendevan dema behsa miriyan dikin, her deme dema borî bikartînin. Xwendevan li goristanan, nîşanên ser kêlikan dixwînin ku belê demekê jiyaneke têr û tije jiya ye.”²⁷

Di vir de mijar diçe rojên berê yên dîrokê. Têkilî her dem ni navbera lehengên berê û jiyana îro de tê danîn. Lê mixabin dema mirov tenê behsa leheng an bûyerên berê bike û wan binax bike mijar zindîtiya xwe wenda dike.

Tiştêka girîng heye ku di niqaşa li ser teza dengbêjiyê de, min û kesên pêwendîdar gelek caran dayîn û stendinan kiriye. Di van pêwendiyên de tiştêk weha derket holê. Hevjîna hevaleyê min li ser vê babetê got ku her dayîkek dengbêjeke. Rastiya mijarê heye û belkî ev raman destpêka dengbêjiyê jî. Her dengbêjek yekem car ji diya xwe kilaman bihîstiye. Dibe ku kilam sade û safî be. Lê di wan lorîkan de deng heye, huner heye, lihevanî heye, vate heye û muzîk heye. Dibe ku deng nexweş be. Ev tiştêka din e. Dengê dê her timî bi zarokên wan xweş e. Her weha divê di dengbêjiyê de û çêkirina kilaman de planekî hebe. Ev jî xaleka ku bingeh e û niqaşa wê nayê kirin. Özkul Çobanoğlu di lêkolîna xwe de weha dibêje:

²⁶ Kendal Nezan, Kürt Müziği, *Mûzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî, Kürt Müziği*, amd: Mehmet Bayrak, Weşanên Özge, 2002, Ankara, c. 1, r. 53

²⁷ Barry Sanders, b.n.b., r. 26

“Aşiqekî, dema bi formul, bîra (stoka) tema û teknîka kompozîsyonê, xwe gihandibe, derê pêşberê guhdarvanan da destana xwe bibêje, ji bilî elementên ku dizane, planekê dişopîne.”²⁸

Di dengbêjîyê de, her wekî em ê di babeta dengbêj Resoyê Gopalan de jî bibînin, perwerdeyek heye. Di nava wan de terbiye û edebek heye. Dengbêj di nava xwe de daîma ji hev re rêz digrin. Di civatên Kurdan de, di dîwanan de, di malan de, di malên maqûlan de, di dawetan de tu carî yên biçûk ji yên mezin re bêrêzî nakin. Di dema strandina kilaman de jî heya yê biçûk ji yê mezintir îzna xwe nestîne, dest nade ber guhên xwe û kilaman nastrê. Ev ji perwerdeya nava dengbêjan tê. Helbet di nava civakê de jî ev perwerde heye.

Ger car din bizivirin ser mijara hunermendiyê û dengbêjîyê, mirov dikare bêje ku hunermend û dengbêj ji hev cuda ne. Her dengbêjek hunermend e. Lê her hunermend ne dengbêj e. Ev tê vateya ku peyva hunermend xwedî vateyeka berfireh e. Dengbêj dema dengbêjiya xwe dike hunerek bi cîh tîne û hunermend e. Wênekêşek jî hunermend e lê ne dengbêj e. Di nava wan de ferqek mezin heye. Her weha di mijara ku bi dengbêjîyê re amûrjenî heye an tune ye de; bêjer, amadekar û derhênerê berê yê radyoya Kurdî ya Tehran û ya Ormiyê Kafi Alevî weha şirove dike:

"Her hunermendek xwedanê raman, nêrîn û daxwazên taybet bi xwe ye ku bi rêka hunera xwe, raman, nêrîn û daxwazên xwe rabe bîner, guhdarvan û xwendevanê xwe dike ku rengê her kesek nikare tê derbixe ku mebesta xwedanê hunerê çiyê û pêdivî bi şarezaiyeka taybet heye. Lê hunera dengbêja li wê çendê de ye ku her guhdarvanek dişê bi hêsanî haydarî mebest, raman, daxwaz, kul û keserên dengbêj bibe. Dengbêjî wijdana gel e. Dengbêjî dengvedana bûyer, serpêhatî, daxwaz, kul û keseraye. Dengbêjî wijdana hişyariya gel e. Bê şik amûre, cihekî taybet bo baştir têgihîştina ji kilama dengbêja xwedî cih e. Ger tu wêneyek çol û çiya bi qelemek reş çêbikî û li aliyê din heman dîmenê bi çend rengan ku suruşta çol û çiyên nîşan dide, bê çêkirin, kîjan bêhtir dikare bala bîner bikşîne ser xwe? Suruştiye ku her amûrek di cihê xwe de dişê bibe xemla kilama dengbêjî û guhdar dişê bi hestekî baştir li kilamê guhdarî bike û têbigihê."²⁹

Li ser vê mijara amûran di nava gelek dengbêj, lêkolîner, muzîkjen û hunermendên din de gengeşeyek heye ku bûne du beşan. Di nava wan de hene ku

²⁸ Özkul Çobanoğlu, *Sözlü Kompozisyon Teorisi ve Günümüz Halk Çalışmalarındaki Yeri*, Ankara, 1998, r. 156.

²⁹ Ji hevpeyvîna min ya bi nivîsar Kafi Alevî re, , Hewlêr, 15. 01. 2013.

amûran bo bêhnvedana dengbêj dibînin. Her weha jî weka xemilandina kilamê jî amûran dipejirînin. Li gor fikr û ramana min di dengbêjiyê de ciyê amûran heye lê divê qiyasek jê re hebe. Ger kilama dengbêj di nava deng û dirêjkirina lêdana amûrê de bifetisîne, ew ji dengbêjiyê dertê û dibe hunermendî. Hunera amûrê dertê pêş. Lê di dengbêjiya xetta Şingalê, Herzexê, Nusêbîn û heya Çiyayê Kurmanca de amûr jî heye. Carna saz û li hinek devera kemaçe bi kilaman re tê jenandin. Lê carna amûr tenê weka fona binê kilamê û ji bo kurte-bêhnek tê bikaranîn.

Kurdistan welateke gelek fire ye û çanda li ser axa wê gelek dewlemend e. Her devereke an herêmek pêwiste ji hev cuda û bi hûrayî li ser çanda wan bê rawestandî. Li jorê hat gotin ku gelek cara dengbêj ne xwendevanin, xwendin û nivîsandina wan tune ye. Hafizaya wan gelek xurt e, lihevanîna wan û xemlandina wan ya kilaman xwedî dewlemendiyeka din e.

Dengbêj weka çewa ji gotina ‘çanda devkî’ jî tê famkirin, gelek caran kesên xwenda nînin û destan an kilaman bi xwe diafirînin. Ev taybetmendiyeka giştî ye. Li seranserê dunyayê weha bûye. Walter J. Ong weha dibêje:

“Li Yûgoslavyayê ku sînorên wê û Yewnaniyan di nava hev de ye, Parry dîtiye ku hozan çewa bê ku kezezan bixwînin, destanan bi dev afirandine. Weka yê Homeros, destanên wan jî bi pîvan û bi qalib dihatin afirandin.”³⁰

Sedemê me van gotinan danî jorê ew e ku gelek tişt bi giştî li her derê eynî ne. Ne tenê taybetmendiya dengbêjiya Kurda ye. Weka ji Ong jî tê fêmkirin, mînak ev mijar li Yûgoslavyayê jî balladbêjî weka dengbêjiya kurda ye.

Di nava dengbêjên Kurdan de kes hene ku destanbêjin jî. Heya niha gelek lêkolîner detanbêjan ji dengbêjan cuda datînin. Dikarin bêjim ku destanbêj yek pileyek ji dengbêjan pêşdetirin. Ji bo ku di nava destanbêjiyê de dengbêjî jî heye. Destanbêj bûyera nava destanê bi gotin û kilam ji guhdarvanan re pêşkêş dike. Ew kilama nava destanê dikeve dengbêjiyê. Di nava Kurdan de gelek kes hene ku dengbêj û destanbêjin. Mînakên wan yek jê dengbêj Resoyê Gopala ye ku di pêş de bi berfirehî wê behsa wî bê kirin. Her weha Egîdê Têcir jî yek ji wan bû ku destanên weka Siyamend û Xecê, Ker û Kulik, Mem û Zînê digot.

³⁰ Walter J. Ong, b.n.b., r. 77

Nûra Cewarî li ser destanên Kurdî jî xebat kiriye, berhevkarîya wan kiriye û ji wan re li gor qeyda wan ya teybê nota daniye. Di babeta destan û kilaman de rohnîyê dixwe ser babetê û weha dibêje:

"Di gotina çîrokek an jî destanek de kilam, ya parek ji çîrokê ye an jî destanê ye an jî berhemek bi serê xwe ye. Çîrokvan çîrokê dibêje û dema wextê kilamgotina wî/wê hat, dest davêje guhên xwe û kilamê dibêje. Carna jî berhem bi temamî kilam e. Ger kes bixwaze di derbareyê wê de her tiştê bizanibe, divê naveroka wê baş bizanibe. Ji bo ku di vana de gotin û kilam hev temam dike."³¹

Li ser mijara dengbêjiyê û dengbêjan, hunermendek me ku weka hunermendek klasîk û nûjen tê pejirandin Brader e. Li ser tarîfa dengbêjiyê pîrsa min weha bersivand:

"Ger mirov gotina dengbêj ji hev veqetîne, vateya dengbêjiyê dertê holê. Deng-bêj yanî bi deng dibêje. Tenê deng. Bi hêza qirik, têlên qirikê û nefesa xwe, hemî xebata xwe pêktîne. Ew dengbêje. Dengbêjî hunerek xwezayî ye. Li Kurdistanê bûyerên ku rû didan, li ser dengbêjan bandorên mezin dihiştin û dengbêj gund bi gund digeriyan, wan bûyeran bi kilamên xwe pêşkêşî xelkê dikirin. Ger ewqas qedexebûn, li ser ziman û wêjeya Kurdan tunebûya, dengbêjan ew bar nedidan ser milên xwe."³²

Çewa Brader jî dibêje barê dengbêjiyê gelek girane. Ev tê wateya zahmetiya dengbêjiyê ku ne tiştêkî rihet e. Dema ku mirov bi dengbêjan re dikeve nava axaftina dengbêjiyê, mirov dibîne ku ev gotin gelek rast e. Lê taybetmendiyêke dinê ya dengbêjan heye ku dikarin kilaman bi hev re girêdin. Walter Benjamin weha dibêje:

"Çawa stran nîşan didin ku her yek bi ya din ve tê girêdan, her weha çîrokbêj jî her çîrokê bi ya din ve girêdide."³³

Her çendî ev fikreka giştî nîn be jî pareka wê ya rastiyê heye. Bi taybetî di nava destanbêjiyê de ev huner heye. Divê rêzkirina kilamên nava destanê û girêdana wan baş lihev be.

Li gora fikrên lêkolînavan, di derheqê dengbêjiyê de, mirov dikare bigihîje hinek encaman:

³¹ Nûra Cewarî, Kürt Müziği Sorunları, *Müzik, Dans û Şarqiyên Kurdî*, amd. Mehmet Bayrak, Weşanên Özge, 2002, c. 1, Ankara, r. 114

³² Ji hevpeyvîna min ya bi Hozan Brader re, Mêrdîn, 10. 01. 2013.

³³ Walter Benjamin, *Son Bakışta Aşk*, Weşanên Metisê, ç. 6. , İstanbul, 2012, r. 90

1- Dengbêj divê dengê xwe baş bikar bîne. Dengbikaranîna dengbêj bi xwe hunerek bi serê xwe ye.

2- Dengbêj aferîner e. Dengbêj bi xwe kilaman, destanan li ser bûyeran û qewimandinan ava dike. Di nava kilaman an destanên xwe de, divê bi xwurtayî peyvan û hevokan bîne cem hev. Lehengên wan, cihê qewimandina bûyerê, lehengên din yên di nava bûyerê de baş bide nasîn. Di nava kilam û destanê de zeman û sebeb jî xwediyê ciyên giring in. Divê bên aşkerakirin.

3- Dengbêj di binyata xwe de amûran zêde bikar nayne lê di hinek heremên Kurdistanê de dengbêj amûran bikar tîne. Ji ber feraseta îslamiya kevneşopî, li gelek heremên Kurdistanê, amûrên muzîkê û amûrjenî qedexe hatiye qebûlkirin. Dibe ku ev nebûna amûrjeniyê di dengbêjiyê de, ji bandora ola îslamê hatibe. Lewra di heremên ku Êzîdiyên Kurd lê dijîn de, dengbêjî bi amûr û bê amûr jî tê kirin. Ciyê ku bandora ola îslamê lê kême e an sist e, amûrjenî bêhtir ketiye nava zargotina Kurdî ya dengbêjiyê. Gotina kilamê bêhtir dertê pêş. Dema em li herema Dêrsimê û Koçgiriya dinêrin, li wir dengbêjiya bê amûr kême. Amûr bêhtir bi kilamê re tê bikar anîn. Ew her du herem jî ji aliyê baweriyê ve elewîne. Elewîtiya lêdana amûran qedexe nake. Lê divê amûr kilamê nefetisîne.

4- Dengbêj di heman demê de dibe ku stranbêj be jî. Dengbêj stranên berê û yên ku dengbêjên din afirandine dikare bêje û dibêjin jî. Divê bi şertê ku naveroka kilamê neguhêre, karibe kilamên heyî bêhtir bixemilîne, lê zêde jî bike.

5- Pêwist e ku naveroka kilama dengbêj, li hev be û vateyek jê re hebe. Ger gotinên di kilamê de ji hev belawela bin, ew nabe kilam û dengbêjê wê jî nabe dengbêj an dibe berhemek gelek qels tevî dengbêjê xwe ve.

6- Pêwiste dengê dengbêj û gotinên ku di kilamê de dibêje, gelek aşkera û bêtir famkirin. Ne ku gotinên di nava kilamê de, di devê xwe de bibe û bîne bê ku tu kes jê fam bike. Ev mijara hanê gelek caran dibe sedemê ku guhdarvan li dengbêj guhdarî nake.

7 - Dengbêj, pêwist e bandorê li ser guhdarvanan bikaribe bihêle. Guhdarvanan bixe binê bandora kilama xwe. Wan bike weka kesên ku xwe di nava bûyerê de dibînin û dijîn.

8 - Pêwiste dengbêj xwediyê hafizayek baş be. Bikaribe gotinên kilaman di hafizeya xwe de biparêze. Ew hafiza dengbêj her wekî qelem û kaxezên wî/wê ye. Ne pêwiste ku dengbêj bizanibe bixweyne û binivîse. Ger em li dengbêjên Kurmanciya jorîn binêrin, piraniya wan xwendin û nivîsandina wan tune ye. Berevajî, ew hunermendên an dengbêjên ku bi xwendin û nivîsandinê dizanin, nikarin weka yên din hafizaya xwe bikar bînin. Xezîneya kilaman ya dengbêjên xwendevan, ji yên nexwenda kêmtir e. Di vê mijarê de Walter J. Ong weha dibêje:

“Hozanên xelkê başûrê Slavê, piraniya wan û hetta yên wan yên herî baş, xwendin û nivîsandina wan tune ye.”³⁴

Ev taybetmendiya dengbêjan ne tenê aîdê dengbêjên Kurdan lê aîdê hemû dengbêjên dunyayê ye.

9 - Pêwiste dengbêj ji xelkê baş fam bike û bi edebek baş di nava civatê de, bi hevalên xwe yên dengbêj re an bi dengbêjên din re zahf baş tevbigere. Ev jî edeba dengbêjiyê ye.

Li gor lêkolînan ev hemû, taybetmendiyan dengbêjeke ku pêwiste pêre hebin. Ger yek ji van taybetmendiyan ji dengbêj kêmbê, ew dibe qelsiya dengbêj û dengbêjiya wî/wê.

1.5. EVDALÊ ZEYNÊ Û ŞOPA DENGBÊJIYA WÎ

Dema em behsa dengbêjiyê dikin, di binyatê de em behsa pareka ji çanda gundîtiyê dikin. Dengbêjiya Kurdan ji nava gundan derketiye û li nava xelkê belav bûye. Lê ev nayê vateya ku di bajaran de dengbêjî tunebû ye. Mîr û paşayên Kurdan ji vana re mînakên herî başin. Dengbêj di demên berê de, pêşî li mala xwe, paşî jî di odeyên gundan de kilamên xwe digot. Malên maqûlên gundan, malên mîrên Kurdan, malên axayên Kurdan û li gelek deveran tekyayên şêxên Kurdan bûne ciyên dengbêjan. Ji bilî van ciyan, dengbêj li şahiyên gundan dibûn yek ji kesên serê civatê jî.

Di jiyana dengbêjan de gelek ji wan hene ku di xwezayê de, li ber pez, dewar, golik û karikan fêrî dengbêjiyê bûne. Di nava dengbêjan de cûreyek ji wan hene ku koka wan ji dewrêşiyê tê. Ew dewrêşên dengbêj, gelek caran bêcîh û war digeriyan û weka peyamnêran ji gundek bo gundên din dengbêjiya xwe dibirin seranserê kurdistanê. Ji ber

³⁴ Walter J. Ong, *b.n.b.*, r. 77

ku dewrêş zêde digeriyan, weka radyo û rojnameyên îro wezîfe dikirin. Ger ku ew dewrêş dengbêj bûna jî rengê zargotinê bêhtir diguherî û dixemilî. Li herêma Silîva li navçeya Farqînê, dewrêşek bi navê Qadoyê Dengbêj hebû. Heft kurên wî hebûn û her heft kur jî dengbêj bûn. Gelek caran bi mehan wenda dibûn. Li heremên Kurdistanê seranser digeriyan. Dengbêjiya xwe jî dikirin û debara xwe jî bi vî rengî dikirin. Bapîrê wan yê bi navê Êsivê Mihacir, bi Evdalê Zeynikê re geriyabû û jê fêrî kilaman bû bû. Lê di ser de gelek sal derbas bûn ku me kurê wî car din dît. Ew bi xwe jî dengbêjek gelek baş e. Di hevpeyvîna pêre weha got:

"Dengbêj Êsivê Mihacir kalê min bû. Kalê min li Eleşgirê 7 sal bi Evdalê Zeynê re geriyaye û jê fêrî dengbêjiyê bûye. Evdal yekî rûyê wî bi xwur bûye. Ew dengbêjê Surmeli Mehmet Paşa bû ye. Gula File bi dengbêjî pêşwaziya Evdal dike. Gulê berya Evdal dengbêjê Surmeli Mehmet Paşa bûye. Kalê min Êsiv li gelek deverên Kurdistanê digere û paşî tê gundê Kelê, herêma Silîva. Li wir dengbêjiya Mihemed Axa yê Kelî (Şêxdodî) dike. Bavê min ji kalê min Êsiv fêrî dengbêjiyê dibe û em 19 zarokên bavê min yên mêr, ji bav û bapîrê xwe, weka dewama dengbêjiya Evdalê Zeynê fêrî dengbêjiyê bûn."³⁵

Surmeli Mehmet Paşa, paşayê dewleta Osmaniyan bû û neviyê Îshaq Paşayê Bazîdê ye. Ji Agiriyê ye. Sürmeli diçe şêrê Kozanê-Adanayê û li wir dimre. Sal 1868 an 1869 e. Gula File dengbêja wî bû. Gula File heya 1915an jî jiya ye.

Di dema ku min dibistana navendî dixwend de, 7 kurê Qado dengbêjiyê dikirin. Paşî ku zarokên wî yên din mezin dibin, ew jî xwe li cem bav û kalê xwe fêrî dengbêjiyê dikin. Ne tenha ew lê li gundê Kelê ku li ser qeza Silîva ye, Seîdê Usman, Salihê Beynatî, Sidîqê Sextî, Hecî Xusrov, Baba yê Melezgirî û gelek kesên din şagirtê Êsivê Mihacir in. Dema Êsivê Mihacir tê gundê Kelê cem Mihemed Axa, sal li dora 1920an e. Mihemed Axayê Kelî di sala 1925 an de bi Şêx Seîdê Palo re hat didardakirin.

Sedemê ku em wisa li ser mijara dengbêj Evdalê Zeynê û berdewamiya wî ya dengbêjiyê radiwestin ev e ku dengbêj Resoyê Gopala, di dema Evdal de hatiye dinyayê lê dengbêjiya wî piştî Evdal e. Reso şagirtê Evdal e. Ekola Evdalê Zeynê gelek berfireh e û heya niha dewam dike. Resoyê dengbêj heya çû ser dilovaniya xwe, weka şagirtek

³⁵ Ji hevpeyvîna bi Hecî Şerîfê Qado yê Êsiv re, Farqîn, 25. 04. 20013.

Evdalê Zeynê kilamên Evdal got û weka terzê kilam gotina Evdal jî, kilamên ku ew bi xwe afirandibû stra.

Di nava denbêjiya Kurdan de dema behsa dengbêjê herî kevin dibe, Evdalê Zeynê tê bîra herkesek. Rast e Evdal gelek kevn e. Jiyana wî di nava salên 1800 û 1913 an de ye. Lê berya Evdal jî dengbêj hebûne. Bi hêjmareka gelek zêde jî. Di serê lêkolînê de min behsa deng û dengbêjiyê kir ku di nava Kurdan de gotineka weha heye: Kengê deng hebûye bi deng re dengbêjî jî hebû ye. Dema em ji vê rastiya gotina bav û kalan, rastiya xwe hildin, em ê bibînin ku beriya Evdal bi hezaran salan, dengbêj hebûne.

Ne tenê di nava Kurdan de lê di temamê dunyayê de baladvan, bîlînbêj û destanbêj hebûne. Di dunyayê de destanbêjê herî bi nav û deng Homerosê Yewnani ye ku bingeha çanda wan ya devkî ye. Çewa di serî hat behskirin ku destan dayîka her cûrenivîsê ye û beriya îcada alfabeyan hebû ye. Homeros destanên Îlyada û Odysseia yê gotiye. Di vê mijarê de Walter J. Ong weha dibêje:

“Zimanê destanên Homeros ku ji zaravayên Îon û Aiol tevîheve û derketiye holê, ji bilî zimanên wan, ji nişkekî bo nişên dinê, ji bo pîvana dengên rêzikan bîna parastin, ji nûh de gihandine hev û ji gotinên bi qalib hatine holê. Di nava sedsalan de, ev her dû destan, şiklê xwe girtine û şikl guhertine. Bi alfabeya Yewnanî ya nû hatine nivîsandin. Destanên herî dirêj û yekemînin ku bi vê alfabe hatine nivîsandin. (B.M.700-650) Zimanên wan jî di axaftina rojane de nayê axaftin. Tenê hozan ji bav û kalên xwe hîn bûne. Ziman Yewnaniyeke cuda ye.”³⁶

Sedemê ku vê mijara Homeros li vê derê hat behskirin ew e ku hemû lêkolînerên Kurda Evdalê Zeynê weka Homerosê Kurda dipejirînin. Bi taybetî lêkolîner Ahmed Aras, di her axaftin û nivîsên xwe de vê behsê dike. Lê Homeros bi hezar salan beriya Evdalê Zeynê ye. Belê her dû destanên Homeros hatine nivîsandin lê mixabin bajarvaniya Yewnaniyan bûbû bela sere destanbêjan ku nedihîştin bikevin nava bajarên Yewnanîstanê. Lêkolîner Walter J. Ong weha behs dike:

“Ji bo ku Platon, hozanan bernedida nava sînorên dewleta xwe, ew destanên ku ji dewra Homeros de mane, wêjeya devkî li derveyê ziman de dihişt. Bi vî awayî alfabeya xwe bi cîh kiriye. Ji ber ku di wan destanan de gihanek tune bûn.”³⁷

³⁶ Walter J. Ong, *b.n.b.*, r. 37

³⁷ Walter J. Ong, *b.n.b.*, r. 42

Belkî sedemek jî ev e ku Platon li dijî wêjeya devkî derketiye û nexwestiye zargotina bê gihanek bikeve nava bajarê. Lê di mijara gundîtiyê û bajarvaniyê de, ji demen berê de ev dijayetî hebû ye. Berê li gelek bajarên Kurdistanê nedihîştin ku dengbêj di malan de kilamên xwe bêjin ji bo ku cîran goya ji dengê bilind aciz bûn. Lê dibe ku mijara Platon ev be jî. Lê îro hemû lêkolînvan ketine pey degnbêjên gundî da ji wan çend gotinên çandê fêr bibin.

Destana Memê Alan gelek kevn e û ji aliyê dengbêjan de hatiye gotin. Em navê dengbêjan nizanin lê di berya ku Şêx Ahmedê Xanî destana Memê Alan bike menzûme, bingeha pêzanîna wî Memê Alan e. Li ser bingeha Memê Alan, Mem û Zîn a xwe nivîsandiye. Di vir de em dikarin bêjin Memê Alan ji zargotina Kurdî, kete ser rûpêlên wêjeya nivîskî ya Kurdî. Lê tevî ku bi menzûme hat nivîsîn jî li aliyê din di nava xelkê de dengbêjên Kurdan her destana Memê Alan di zargotinê de dewam kirin û heya îro jî berdewam e. Ger em ji nava Kurdên Qafqasyayê dest pê bikin û herin heya Çiyayê Kurmanca, Semsûr û Meletiyê ku bi hezaran km dike, emê bibînin ku destana Memê Alan bi guhertoyên xwe yê ji hev cuda, li hemû hereman tê gotin. Di xeta başûrê Kurdistanê de, ji Çiyayê Şingalê heya Efrînê bi guhertoyên cuda heya îro jî tê gotin.

Mînakek din Siyabendê Silîvî ye. Ev jî di heremên Kurmancên jorîn de seranser tê gotin. Ev jî weka Mem û Zînê ji aliyê Seydayê Tîrêj de bi menzûmeyî hatiye nivîsandin lê di nava dengbêjan de bi versiyonên wê tê strandin. Ne tenha ev destanên navborî lê Destana Rostemê Zal ku berya ji 1000 sal zêdetir di nava Kurdan de hatiye gotin, îro jî ji aliyê hinek dengbêjan de tê gotin.

Dîroka Destana Dewrêşê Evdî jî kevn e. Lê her dengbêjek li gor xwe jê re kilam çêkiriye. Ji xwe piraniya kilaman anonîm in. Mîrov nikare bêje ku ev kilam an destanên kevin kî çêkirine. Bi taybetî jî yê govendê û kar, bi temamî malê xelkê ne ango anonîm in. Lê ji salên dengbêjiya Evdalê Zeynê û heya îro mirov ji bo gelek kilaman dikare bêje ku çêkêrên wan kî ne. Em ê car din di behsa Resoyê Gopalan de yek e yek navê kilamên wî bêjin bê gelo kîjan kilam berhemên wî ne.

Ev mînakên ku li jorê hatin dayîn, tê vateya ku dengbêjî gelek kevn e. Dîroka dengbêjiya Kurdan bi hebûna Kurdan re hebûye. Ev ne tenha bo Kurdan, bo mirovahiyê tev wisa ye. Li ser vê babetê tesbîta Tosinê Reşîd weha ye:

"Bi baweriya min, dengbêj hema bi diyarbûna mirovan re diyar bûye. Lê çî ku tê Evdalê Zeynikê ew jî pir kevn e. Di sala 1821 an de, gava Bedirxan Begê dibe mîrê Botanê, ew dixwaze yekîtiya Kurdan ava bike. Gelek beg, axa, mîr û xanên Kurdan li Cizîrê berhev dike. Wê demê her serokekî Kurda dengbêjê xwe bi xwe re dibe. Dengbêjê Bedirxan Begê jî Laso yê êzîdî bû. Di dema xwe de, ji ber ku ew bi zimanê Tirkî ne strabû, paşayê Tirk her du çavên wî derxistibû. Bi baweriya min dîroka dengbêjiya Kurda ji kûrahiya bi hezaran salan tê."³⁸

Di vir de Tosinê Reşîd behsa 1821 an dike ku ew sal Mîr Bedirxanê Botî tê ser textê Mîrgeha Botanê. Dengbêjê wî Laso yê êzîdî dibe ku bi temenê xwe ji Evdalê Zeynikê mezintir be jî. Di vê salê de divê dengbêjê Mîr Bedirxan dengbêjek temenê wî piçek zêdetir be. Nabe ku zêde gênc be. Lê di hunera xwe de bê guman beriya Evdal dest bi dengbêjiyê kiriye.

Dema mirov li dema jiyana van dengbêjan dinêre, her weke dengbêj Lasoyê Êzîdî, Evdalê Zeynê, Gula Fille û dengbêj Şêx Silê hemû di çaxên hev de jiyane. Di nava temenên wan de, salên kêman zêde hene lê ev nabe ferqekiyeteka mezin. Lê esas mijara me ya ku em ê li serê zêde hûr bibin û bi berfirehî di derbarê wî û berhemên wî de zêde agahiyên bidin, Resoyê Gopala ye. Reso di dema Evdalê Zeynê de hebûye lê zarok bûye. Gula Filleh piştî Evdal wefat dike û Reso li civata wê kilaman dibêje. Dema mijar hate ser vê yekê em ê firehtir li ser rawestin.

Li jorê me behsa civîna giregirên Kurdan ku di dema Bedirxan Beg tê ser textê Mîrgeha Botanê kir. Her mezinek Kurdan dengbêjê xwe bi xwe re dibe civatê. Li wir dengbêj di civatê de kilaman dibêjin û davêjin ber hev. Ev tê wateya ku her dengbêj li rex mezinek ciyê xwe digre. Di civatê de dengbêj li kêleka mezinê xwe rûdinê. Qedr û qîmeta dengbêjan her dem di nava civatê de zêde ye û yek ji mezinê civatê ye.

Di dewra mîrgehên Kurdistanê de em dibînin ku her mîrek xwediyê dengbêjek an çend dengbêjan e. Di qesra mîran de, gelek caran mîr, axa an paşayên Kurdan bi tena serê xwe şîv nexwarine. Her dem dengbêjê wan li cem wan bûne. Di nava mezinên Kurdan de hene ku heya dengbêjên wan ji wan re kilaman negotîne, ew ne razane. Mînak Surmeli Mehmet Paşa yek ji wan e ku heya Evdal jê re kilaman negota ew ranediza. Her wekî zarokên Kurda bifikirin ku di demên berê de çewa dayîkên wan ji

³⁸ Ji hevpeyvîna bi Tosinê Reşîd re, Diyarbekir, 12. 12. 2012.

wan re lorîkan dilorandin û zarokên xwe dixistin xewê, mezin jî bê dengê dengbêjên xwe ranedizan.

Di dema ku mîr, axa, paşa, mezinên eşîrên Kurdan û mezinên hukümetên Kurda jî di nava wan de, dema diçûn şerî, geştê, nêçîrê an mêhvandariyê, dengbêjên xwe jî bi xwe re dibirin. Di dîroka Kurdan de gelek mînakên wan hene. Di sala 1847 an de, di dema ku Mîr Bedirxanê Botî sirgûn dikin bo Îstenbolê û li wir bi cîh dibe, paşî dengbêjê xwe jî dixwaze wê derê. Ne tenha dengbêjê xwe , ji bo zarokên wî baş fêrî zimanê Kurdî bibin, ji Cizîra botanê, dayînan tîne nava mala xwe da zarokên wî fêrî Kurdiyê xwerû bibin. Ev kiryarên wan di derbarê dengbêjan de, bi kêm mezinek Kurdan re tunebe.

Ger mînakek dinê jî pêwist be, ew jî Mîr Celadet Bedirxan e. Gelek cara dengbêja dawetî Şamê mala xwe dikir, kilam û destânên ku dizanibûn, dirête ser kaxez û li wan guhdarî dikir. Mîr Celadet li Şamê li nefiyê bû. Di dema ku zarokên wî çêdibin û hinek mezin dibin, Celadet ji malbata Cemîlpaşa daxwazê dike ku dengbêjek bo zarokên wî û bo wî bibînin. Biryar li ser dengbêj Ahmedê Fermanê Kîkî tê dayîn û pê re diaxifin. Ew jî qebûl dike. Mîr Celadet digel wan derfetên xwe yê qels jî, odeyek di mala xwe de jê re vediqetîne û wî jî di her tevgerê xwe de weka xwe qebûl dike. Di vê mijarê de keça Celadet Sînem Xan dibêje ku ew her dem li kilamên Ahmedê Ferman guhdarî dikir û pê re digeriya. Lê ger em car din werin ser mijara Evdalê Zeynê, em ê ew taybetmendiyên li jorê di Evdal de jî bibînin ku çewa dengbêjiya Surmeli Mehmet Paşa kiriye.

Surmeli Mehmet Paşa paşayekî Dewleta Osmaniyan bû. Ew bi xwe neviyê Îshaq Paşayê Agiriyê ye ku qesra wî li Bazîda rojhilat e. Her çendî paşayê dewletê ye jî, ew bi xwe Kurd e. Bi giştî jiyana wî di salên navbera 1800 û 1868 an de ye. Li gor peymanan navbera Siltanê Osmaniyan û Kurdan ya di sala 1514 an de, Kurd xwe bi xwe îdare dikirin lê bac û leşker didane dewletê. Lê dema ku leşker didan dewletê ji bo şer an ji bo desttêwerda derve bû. Mîrgehên Kurdan bo şerên navbera Dewleta Osmanî û dewletek din leşker didan. Ji bo şerê navxweyî leşker nedidan. Piştî ku mîrgehên Kurdan bi nûhbûna Ewrûpa û bi bandora wan ji holê tê rakirin, hukmê vê peymanê jî namîne. Ji xwe ve ji holê rabûbû. Dewlet payeya paşatiyê dida Kurdan ku Surmeli Mehmet Paşa yek ji wan bû. Piştî wî, Kor Huseyn Paşayê Heyderî û Îbrahîm Paşayê Millî du ji wan paşayan bûn. Hetta Mîr Kamûran Bedirxan dibêje ku ew 15 an 16 apên

xwe dîtine ku payeya wan di nava Dewleta Osmaniyan de paşatî bûye. Bi kurtayî mirov dikare bêje piştî sala 1847 an, bi têkçûna Mîrgehên Botanê, Miksê û Colemêrgê mîrîtî ji Kurdistanê bi awayek giştî rabû û paşatiya Osmaniyan û şêxîti di Kurdistanê de bû desthilatdar.³⁹

Di wan salên dawî yên Dewleta Osmaniyan de li Kurdistanê û li deverên din li yên ku di bin sînorên Osmaniyan de bûn, gelek serhildanên neteweyî, olî û sinifî derdiketin. Dewleta Osmaniyan ji van paşayan leşker dixwestin da van serhildanan ji holê rabikin. Yek ji wan serhildanan jî serhildana Xozanê (Kozan-Adana) ye. Li Xozanê Turkmenên Avşar li dijî Dewleta Osmanî serî hildabûn. Bacê nedidan dewletê. Leşkerî bo dewletê nedikirin. Dewlet ji wan gelek aciz bû. Ne tenha bo wê dewrê her weha heya salên 1950 yan jî dewlet û ew Turkmenên Xozanê ne li hev bûn. Li gor lêkolîner Ahmed Aras şerê navbera dewletê û Avşaran 1850 ye. Li gor Prîskê Mihoyî ev şer di sala 1868an an di sala 1869 an de ye. Di mabeyna wan de şer dertê. Şereke gelek dijwar. Her çendî em li dîrokê dinêrin, li ser vî şerê navborî çî belgeyek sererast tune ye. Lê di nava Kurdan de ev şer bi nav û deng e.

Di dema ku Surmeli Mehmet Paşa diçe Xozanê, dengbêjê xwe Evdalê Zeynê jî bi xwe re dibe. Ev ji adetê mîr, paşa, axa, serokeşîrên Kurdan dihat. Ji vana çî kesek bê dengbêjê xwe nedîçû çî derekê. Sedemê ku min heya vê derê behsa bûyera Xozanê kir jî ev babet bû. Di dema ku dengbêjên xwe jî bi xwe re dibirin, dengbêj li ser riya xwe, tiştê bala wî bikşanda an bûyerek biqewimiya, di cîh de li ser wan, kilaman diafirandin û digotin. Kilama Evdalê Zeynê ya bi navê " Dêrsim e xweş Dêrsim e " di wexta sefera Xozanê de, ji aliyê Evdal de hatiye çêkirin û gotin. Kilamê ji devê keçek gotiye ku hezkiriyê wê çûye şerê Xozanê. Lê di kilamê de pesnê Dêrsimê jî dide bê ka taybetmendiyên wê çî ne. Ji ber ku dengbêj Resoyê Gopala jî li ser şopa Evdal e, heman şop di kilamên wî de jî heye. Di behsa Reso de em ê li ser vê mijarê rawestin. Evdal di dema di ser Dêrsimê re diçe Xozanê, Dêrsimê weha dide nasîn:

"Wey lo dilo mehrûmo ne min go çûm e Dêrsimê xweş Dêrsim e. Avê çema û gola û kanîka bi ser min tîn e gum e gum e û zim e zim e way dil".⁴⁰

Ev serê kilama Evdal e. Ne pêwist e mirov here nava kêrahiya kilama Evdal. Tenê divê bê zanîn bê di navbera termên kilamên Evdal û Reso de çiqas nêzikayî heye.

³⁹ Ji bernameya 'Azîzî û Bedirxanî', Rêzefilma wesaiqî ya Kurdistan tv yê, amad. Mahmut Beğik, ji arşîva Mahmut Beğik.

⁴⁰ Ji devê dengbêj Şebabê Egîd, Yerîvan, 1965, ji arşîva Prîskê Mihoyî.

Kesên ku Dêrsima îroyîn dibînin, wê bikaribin texmîna Dêrsima 145 sal berê bikin bê çi xwezayek xweş lê hebûye. Rast e weka ku avên bi ser meriv de tîn. Di wan deman de avên Dêrsimê bo derbasbûna di wir de, xweş rê nedidan. Bi taybetî di dema ku şîpikên avê di biharê de derdibûn de, derbasbûna deverê gelek zahmet bû.

Ev kilama Evdal ew e ku li ser riya xwe, dema ku diçe Xozanê li Dêrsimê gotiye. Piştî çûna Surmeli Mehmet Paşa bi 400 an 500 leşkerên xwe û bi Evdalê Zeynê re bo Xozanê, di mabeyna leşkerên Osmanîyan û hêzên Turkmenên Avşar de şerek dijwar dest pêdike. Di şer de bi hezaran însan tîn kuştin. Li Xozanê nexweşîna kolerayê dest pêdike. Di her şerî de gelek nexweşîna peyda dibin. Li Xozanê jî nexweşîya kolerayê dertê û gelek kes pê dimrin. Di nava wan de Surmeli Mehmet Paşa bi xwe jî heye. Lê tê gotin ku bi pêvedana marekî jî miriye. Ev her du gotin di nava xelkê de hene. Lê halê şerê Xozanê, demografiya leşkerên Surmeli Mehmet Paşa, erdnîgariya Xozanê ji aliyê Evdal de tê ser ziman:

"De dilê min yo yo, dilê min yo yo!

Hey lo mîro ez ê li Xozanê dinêrim Xozan nîne.

Binyê de germ e germistan e

Fêzê de zer hinar, darê zeytûnê ne

Serê sibê derketim, selefê selef siyara,

Timtêla Qeymezê Êzîdî

Siwarê Senemê di nav de nîne

De dilê min yo yo, dilê min yo yo." ⁴¹

Di kilamê de aşkera ye ku Xozan di çiya de ye. Ciyêk asê ye. Binya wê deşt e û germ e. Di germahiyê de darê zeytûn û hinara zêde çêdibin. Her wisa navê Qeymezê Êzîdî derbas dibe ku ew jî yek ji şervanê Surmeli Mihemed Paşa bû ye. Ev tê vateya ku Sürmeli Mehmet Paşa ji aliyê olî de ferqê nexistiye navbera Kurdên olên wan ji hev cuda. Her siwarek Kurda navek taybet li hespa xwe dikir û niha jî dike. Di vir de navê hespa Qeymezê Êzîdî Senem e. Lê tê xwuyakirin ku Qeymez di şerê Xozanê de hatiye kuştin. Di ciyeka din ya stranê de weha dibêje:

⁴¹ Ji devê dengbêj Egîdê Têcir, ji arşîva Prîskê Mihoyî, Yerîvan, 1965.

"Hey lo mîro, Xozanê wê li çalêyo

Hatin û çûyîna eskerê Memed Paşa her tim lêyo

Min ê bala xwe didayê, cenazê Têlî Qeymezê Êzîdî kirine tabûtê

Danîne ser barê devêyo. "

Di kilamê de behsa 1700 siwaran tê kirin. Ev belkî jimareka ji bo ku ahenga stranê li hev were. Di gelek kilaman de ev heye. Di ya Derwêşê Evdî de jî heman jimar heye. Her wekî dibêje:

" Hey lo mîro ez ê li Xozanê dinêrim li devê zinêr e

Bayê samê rabû qir kiribû hezar û heftsed mêr e."

Serlehengê stranê Surmeli Mehmet Paşa ye ku navê wî wek xwediyê temamê leşker tê gotin:

"Hey lo mîro li Xozana xopan dinêrim wê stirî

Avê çem û kaniya hat û buhurî

Eskerê Mehmed Paşa girane lê hêwirî."

Tenê dema mirov li tevayîya kilamê dinêre, wext weka demsal heye lê mixabin sal bi xwe ne diyar e. Ew jî dikeve ser milên lêkolîneran da sala qewimandina bûyerê vekolin û aşkera bikin.

Di mijara dengbêjê Kurd Evdalê Zeynê de tenê du mînak hatin dayîn. Lê gelek berhemên wî gihane heya roja me. Bi hezaran berhemên wî wenda ne. Ji ber ku di wê demê de teyb, qawan û plaq tunebûn. Kîjan dengbêj li Evdal guhdarî kiribe û jê fêrî kilamên wî bû be, ew kilamên wî gihandine heya roja me. Mirina Evdal li gor temenên gelek dengbêjan ne kevn e. Ger em mirina Evdal 1913 qebûl bikin, em dibînin ku gelek dengbêj ew dîtine û berhemên wî gihandine nîşên li pey xwe.

Sedemê ku em evqas behsa Evdal dikin ew e ku xwedî ekoleka berfirehe û gelek dengbêjan li pey xwe hêlaye. Ez dikarim bêjim Resoyê Gopala jî di dewra Evdal de 10 salî bûye ku Evdal wefat kiriye. Reso, Evdal nediye lê hevçerxa Evdal, Gula Fille diye. Bavê Reso, Welo bi xwe şagirtê ber destê Evdalê Zeynê ye. Apekî Reso bi navê Evdo hebûye ku dengbêjek gelek baş û şagirtê Evdal bûye. Reso jî ji bavê xwe , mam û

birayê xwe fêrî dengbêjiyê bûye ku bingeha wî diçe ser terzê Evdal. Piştî van agahiyan mirov dikare behsa Resoyê Gopala bike bê ka xwediya jiyaneka çewa bû, ji kîjan herema Kurdistanê bû, eşîra wî, malbata wî û kiryar û berhemên wî çi ne. Di dema Reso de ku tê de jiya ye, şert û mercên Kurdistanê çewa bû ne.

BEŞA YEKEM

DENGBÊJ RESO

2.1. DI NAVA ŞOPÎNERÊN EVDALÊ ZEYNÊ DE DENGBÊJ RESOYÊ GOPALA (MIHACIR)

Me di serî de, di behsa Evdalê Zeynê de behsa Gula Filleh kir ku hevçerxê Evdalê Zeynê bûye. Bi wan re Şêx Silê jî hevçerx bûye ku ew dengbêjê Dîwana Qeleniyê bûye. Dîwan Qeleniyê li rojhilatê Kurdistanê ye û jîngeha mezinê eşîra Heyderiyana bû. Lê dema em li şagirtên Evdal dinêrin yek ji wana mamê Reso, Evdo ye ku bi Evdal re kilaman gotiye. Reso di biçûkatiya xwe de li mamê xwe û Gula Filleh guhdarî kiriye. Her weha bavê Reso jî dengbêjek wê demê bû ye.

Bîra di zarotiya însan de, ji bîra her demê baştir e. Reso di wan salên zarotiya xwe de bi zewq li dengbêjan guhdarî kiriye û xwestiye weka wan bistrê. Reso rojek li dîwana Gula Filleh li bajarê Îxdirê di temenek gelek biçûk de, li ber Gulê kilam gotiye. Ahmed Aras ji devê kurê Reso, ji devê Sadiq weha behsa vê bûyêrê dike:

"Bavê min bi texmînî 8 an 9 salî bûye, kirasekî dirêj lê bûye, diçe nav cema'eta Gula Fille. Ew Gula ku bi Evdalê Zeynikê ra ketiye lecê. Gulê êdî pîr bûye, salên wê li ser heştîyî bûne lê strandina wê hêj baş bûye. Giregirên Îxdirê li dorê kom bûne, ew ê jî kilam gotine. Bavê min diçe li bilinga dîwanê rûdine, ji xwe re guhdarî dike. Demekî şûnda yek bavê min destnîşan dike û dibê, "Ev kurikê hanê jî kilaman dibêje." Gulê gazî bavê min dike, dibe kêleka xwe. Dibê "Hela bistrê, çika tu çawa dibêjî?" Bavê min jî dest diavêje pelînga guhê xwe û distrê. Du, sê kilaman dibêje. Gulê dibê "Bes e, bes e. Te perda guhê min qetand lawo!... Eferim ji te ra, welle tu xweş dibêjî, di paşerojê da tu yê bibî dengbêjekî yekta."⁴²

Rast e ku çûye dîwana Gula Filleh lê di wê demê de Reso gelek biçûk e. Ya rast ew e ku dema malbata Resoyê Gopala ji bajarê Îxdirê koç dike û diçe gundê Mele Dawûda, li cem Hecî Sîno yê dengbêj dimîne. Hecî Sîno bi temenê xwe ji Reso mezintir bû ye. Li gor Ahmed Aras Reso ji Hecî Sîno fêrî dengbêjiyê dibe. Li gor Abdulkerîmê kurê Reso, Reso ji Hecî Sîno fêrî kilaman nebûye. Abdulkerîmê kurê Reso ji devê bavê xwe weha dibêje:

"Ne ku dengbêjiya Hecî Sîno kêr e. Lê Hecî Sîno li ber Ferzê kêr bû. Dema Ferzê kilam digot, ez li ber wî mîna mar zirav dibûm. Bandora maqamên wî li min çêdibû."⁴³

⁴² Ahmed Aras, *Kovara Bîr*, "Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê", hej. 7, Diyarbekir, 26 Şubat 2010.

⁴³ Ji hevpeyvîna bi Abdulkerîmê kurê Reso re, Mûş, 16. 07. 2013

Di vir de Reso tenê behsa maqamên zargotina kilamê dike. Ne ku Ferzê hostayê Reso ye. Dema ku Ebdulkerîm behsa hostayên dengbêj yên bavê xwe dike, behsa kalê xwe yê dengbêj, mamê xwe Ahmed û mamê Reso yê bi navê Evdo dike ku hostayên Reso bû ne.

Resoyê Gopala bi gelek dengbêjên hemdemên xwe re hevaltîyê kiriye. Di nava wan de yê herî nêzîkê Reso, Ferzê ye. Ferzê dengbêjek zor baş û dengbêjiya wî di ser xwe re bûye. Ferzê di sala 1951 an de, bi xeletî di dawetekê de tê kuştin û Reso li serê kilamek diafirîne. Wê di behsa kilamên Reso de, behsa vê bûyêrê û kilamê bi berfirehî bê kirin.

Di nava dengbêjan de tiştek din jî heye ku ne li temen û ne li şagirtî û hostatiyê dinêre. Ew jî fêrbûna ji hev e. Her dengbêj ji hev distîne û dide yên din. Ev pir tiştek xwezayî ye. Di nava dengbêj û komên lêkolîneran de, ev gengeşe her tim heye. Gotina "Şahê Dengbêja" bi xwe arîşeyeka mezin e. Gelo kî şah e an ne şah e, ev tê niqaş kirin. Di şûna ku em vê gotinê niqaş bikin, divê em her dengbêjekî weka wî bipejirînin û bixin nava karwanê dengbêjan. Di mijara fêrbûna kilaman de û afirandina hunera wan de Özkul Çobanoğlu weha şirove dike:

“Aşiqên ciwan yên namzet, di pêvajoya gihaştina xwe de, berya ku formulên kesên din, di aşiqiya xwe de hîn bibin, kilamên xwe dikin weka yên wan û kilamên nêzîkê kilamên wan diafirînin. Ev, dibe bingeha hunera wan. Piştî hînî wan formulên dibe, eger ji nûh de wan kompoze neke û ji nû de nikaribe stranan çêbike, di dema distrên de, jê û wêdetir nikaribe gotinan bîne cem hev û stranan çêbike, çiqas formulên bizanibe jî, ew nabe aşiqekî aferîner.”⁴⁴

Li jorê jî me behsa şagirt û hostayan kir ku ev di nava xelkê de bi firehî tê ser ziman. Em ji bo dengbêjên piştî Reso nabêjim lê ji bo Reso bi xwe şagirtê şagirtê Evdalê Zeynê ye. Weka ku lêkolîner Özkul Çobanoğlu jî li jorê dibêje, dengbêjên ku nû hîn dibin, ji xwe re terzê xwe ava dikin. Reso gelek kilamên Evdal gotine. Di mijara berhemên Reso de wê bi firehî li ser mijarê bê rawestandî. Kurê Reso ji Ahmed Aras re, di behsa bavê xwe de gotiye:

“Bavê min kilamên Evdalê Zeynikê jî digot. Ew î hem li Gula Fille guhdarî kiribû, hem jî şagirtên Evdêl yên din. Mala kurê Evdalê Zeynikê yê piçûk Mihê, li gundekî Milazgirê bûye. Rojekê ew û bavê min rastê hevdu tên. Mihê bi bavê min kilaman

⁴⁴ Özkul Çobanoğlu, *b.n.b.*, r. 153

dide gotin. Di pey re dibêje: Bawer bike tu jî bi qasî bavê min xweş dibêjî. Helal be ji te re, dengê te jî tesîrekî mezin li merivan dike.”⁴⁵

Di nava adetên Serhedê de tiştêk din jî heye ku li cem me bi xeletî tê şirovekirin. Dema mirov dibêje Reso dengbêjê filankes bû ye, ev nayê vateya ku Reso her dem dengbêjê wî bû ye. Wek mînakek eger yek ji bo daweta xwe dengbêjek dawet bikira û çend roj li daweta wan bimana, jê re digotin ev dengbêjê me ye. Di derveyê wan rojan de dengbêj ji xwe re serbest digeriya û bixwesta bi ku de biçûya azad bû.

2.2. MALBAT Û EŞÎRA RESOYÊ GOPALA

Ger em bi kurtayî behsa navê eşîr û êla Resoyê Gopala ango Mihacir (koçber) bikin, Reso ji eşîra Bekira ji bavê Êlesoriya ye. Her eşîr di nava xwe de dibe bavik. Ji bavikan jî dibe malbat. Eşîra Bekira li gelek herêmên Kurdistanê belav bûne û zahf caran cî guherandine. Di herema Xerza de, hinek gundên Bekira li Sason û piraniya wan li gundên ser qeza Hezzo (Kozluk) ne. Li dora Amedê sê gundên wan hene. Li Tetwana Bedlîsê, li Ercîşê, li Geliyê Zilanê, li Bûlanixê, li Panosê, li Licê, Agiriyê û li Mûşê hene.

Di dema berya şerê Rûsan û Osmaniyan de hinek ji eşîra Bekira, di ser Diyarbekir da diçin heya Çiyayê Elegezê der û dora Yerîvanê. Eşîra Bekira eşîrek koçere û ji xwedî kirina terş û tareş gelek hizdikin. Di zivistanan de eşîr bi terşên xwe re, xwe berdidan deştê da ku serma zerarê nede terş û tareşên wan. Di havînan de hildikişiyên zozana da pezên wan zererê ji germê nebînin. Malbata Reso jî li gor van şert û mercan tevdigeriya û heya zozanê Elegezê diçe. Di jiyana Reso de şivanî, gavanî û paleyî sê îşên bingehîn hene ku hemû ji pêdiviyên koçeriyê ne.

Malbata Reso di şerê Rûs û Osmaniyan de, ji dora çiyayê Elegezê tê û xwe berdide Deştê Îxdirê. Ev dîrok tê piştî sala 1878 an. Di wê dîrokê de û îro jî Çemê Reş (Eres) di navbera Rûsya û dewleta Tirkîya îro de sînor e. Ne tenê eşîra Bekira lê gelek eşîrên Kurda weka Bekira diçin nava tixûbên Rûsaya ya wê rojê. Weka: Eşîra Stûrkiya, Brûkiya, Sîpkiya, Adiyamaniya, Şikaka û hwd. Ev di tarîxê de her dem qedera eşîrên Kurdan e, ew eşîrên ku heywan xwedî dikirin.

Sedemên siyasî û aboriya wê demê, bi taybetî ya dewleta Osmaniyan çawa bû, mijarên aborî û siyasî yên wê demê bi serê xwe mijarin û ji qanûnên wê demê tînin zanîn.

⁴⁵ Ahmed Aras, “Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê”, hêj. 1, www.kovarabir.com, Diyarbekir, 26 Şubat 2010.

2.3. ŞERT Û MERCÊN DI DEMA JIYANA RESO DE LI KURDÎSTANÊ

Li jorê jî hat behskirin ku di dewra Osmaniyan û derçûna qanûnên siyasî, di derbareyê aborî de kir. Di dema dewleta Osmaniyan de gelek qanûn hatibûn derxistin ku dewletê ji xelkê Kurd bêşê (bac) distandin. Ger em jiyana Reso di navbera salên 1902 û 1983an de qebûl bikin, Reso di dewra Osmaniyan û Cûmhûriyetê de jiya ye. Li gor hinek lêkolîneran sala jidayîkbûna Reso 1906 e. Lê ferq nake ku kîjan sal ji diya xwe bûye ji ber ferqek gelek mezin di navbera van salan de tune ye. Ji demên Osmaniyan yê berê û heya piştî ku Demokrat Parti ya Ednan Menderes û Celal Bayar hat ser îdareya Tirkîyê, gelek qanûn hebûn ku zêdetir li ser Kurdan diceribandin.

Yek ji wan ew bû ku serê her mirovek Kurd bêşa xwe didan. Di malekê de çiqas kes hebûna bêşa xwe ya serî didan. Duyem; pez û heywanên kî an kîjan malbatan hebûya car din serê heywanê bêşa xwe didan. Ji wê bêşê re digotin "qamçûr" an "qamçûra heywanan". Sêyem, bêşa erda hebû ku gelek giran bû. Kurd nikaribûn erdên xwe li ser xwe tapo bikin. Kurd bazirganiyê nedikirin. Milletên di derveyê Kurdan de diçûn erdê Kurdan li ser xwe tapo dikirin. Weka milletê Ermen, Asûrî, Keldanî û hwd. Lewra ku tapoyên gelek milletên din hene lê yê Kurda nînin.

Kurd, li dij wan qanûnên li jorê derdiketin lê nikaribûn biguherandina. Dewleta Osmanî û Tirkan dabû ser piştê Kurdan. Kurd nedixwestin xwe di nufusê de qeyd bikin da bêşa serî nedin. Nedixwestin herin eskeriyê bikin ev jî sedemeka din bû. Ya herî girîng hebûna terş û tareşên Kurda bû ku Kurd bi piranî debara xwe bi heywanan dikirin. Lê nikaribûn qamçûra heywanan bidana.

Dewleta Osmaniyan bi rêya paşa û mutesarifên xwe hemû bêşan li eşîran par dikirin û ji wan pere distandin. Mezinên eşîran, di nava xwe de ew pere tar dikirin, dicivandin û didan dewletê. Li ser vê mijarê gelek caran serhildan çêbûne û di mabeyna eşîrên Kurdan û dewletê de şer derketine. Ew bêşên navborî ji Kurdan re gelek giran dihat û nedixwestin bidin. Li ser van mijaran, serhildaneka ku herî zêde dewam kiriye ya Şerê Sasonê ye ku ji sala 1926 an dest pêdike û heya sala 1938 an dewam dike.

Weka tedbîrek, di gelek deman de eşîrên Kurda li ciyek tenê nediman û her tim cîh diguherandin. Bi vî awayî dewletê nikaribû terş û tareşên wan bijimartina û bêşê bavêtana ser wan. Dema wezîfedarên dewletê ku bi taybetî ji wan re digotin tehsîldar

dihatin gunda, gundî pezên xwe direvandin çiya û dixistin şikeftan. Pêşiya şikeftan dîwar dikirin da tehsîldar heywanên wan nebînin.

Kurdên ku li deştê dijîyan, heywanên xwe direvandin newalan û ciyên kûr, bi vî rengî xwe bi ajalên xwe ve ji tehsîldaran vedişartin. Bi gelek kesên ku di wê demê de jiyane, axîfime ku bi xerabî behsa wan qanûn û kiryarên dewletê dikirin. Di vê mijarê de bi Nezîr Ak re hevpeyvînekî li ser mijara qamçûra heywan kiribû û zahf balkêş bû. Nezîr Ak ji herêma Silîva bû û wê dewrê baş jiyabû. Weha digot:

“Min wê dewrê baş dît. Dewra Îsmet Paşa (Înönü) bû. Me zahf tadê dît. Mînak; ger bihayê pezek 6 TL bûya, qamçûra wê jî 6 TL bû. Gelek caran pez, ew qamçûra ku dewlet ji wan dixwest nedikir. Dixwestin ji dêlva perê dewletê ve, heywan bidin lê dewlet qebûl nedikir. Ji bo ku qamçûr ji bihayê heywan zêdetir bû. Heywan zahf caran pere nedikir.”⁴⁶

Sedema ku me behsa van qanûn û kiryarên dewletê kir ev bû ku gelek eşîr, ji ber bêşa dewletê cîh diguherandin. Eşîra Bekira jî yek ji wan eşîran bû. Malbata Reso jî yek ji wan malbatên eşîrê bû. Ger em li dîroka eşîrên Kurdan binêrin, weka eşîrên Hesenan, Heyderan û hwd. emê bibînin bê çima dem bi dem derbasî Îranê bûne. Sedem, bêşa serê heywan û însana ye. Derwleta Îranê jî ji dewleta Osmaniyan fêrî bêşê bûbû û ji Kurda pere distendin. Kurd weka topê di navbira her du dewletên xedar de diçûn û dihatin.

Ne tenha malbata Resoyê Mihacir lê gelek malbat û eşîr ji ber van sedeman her dem cîh diguhert in. Lewra ye ku vê mijarê di hişê temamê Kurdan cîh girtiye. Piştî sala 1950 an ku Demokrat Parti li ser îdareya Tirkiyê bû, parti qamçûra heywanan hilanîbû. Tenê ya mêşina (mîh) berdewam dikir. Wekîlê milletê Diyarbekirê Mistefa Remzi Bucak, di wê demê de dixwaze qamçûra mêşina jî bi qanûn di meclisê de rake. Wezîrê Darayî yê Tirkiyê di korîdora Meclisê de leqayî Mistefa Remzî dibe û Mistefa Remzî jê daxwaza rakirina qamçûra heywan dike. Wezîrê Darayî Polatkan, ji Mistefa Remzî Beg re weha dibêje:

"Mistefa Remzî! Bihêle bila piçek dûva Kurdan di destê me de bimîne."⁴⁷

46 Hevpeyvîna min bi Nezîr Ak re, Diyarbekir, 22. 06. 2006.

47 Mustafa Remzi Bucak, *Bir Kürt Aydınından İsmet İnönüye Mektup*, Weşanên Dozê, İstanbul, ç. 1, 1991, r. 69.

Ji gotina wezîr jî aşkeraye ku mesele çiyê. Lê ew wezîrê ku dijminahiya Kurdan dikir, di darbeya 1960 an de, bi Adnan Menderes re hat didardekirin

Em dibînin ku malbata Reso û eşîra Reso ji ber sedemên ku li jorê hat behs kirin, gelek caran koçber bûye. Em ê di behsa jiyana Reso de bibînin ku Reso çiqas cîh guherandiye. Bi wan sedemên ku me li jorê diyar kir û bi sedema debara malbata xwe jî.

Di salên ku Reso hêj zaroke de, şerê cîhanê yê yekem dest pê dike. Sal 1914 ye. Li aliyekî hemû hêzên dinyayê şer dikin û li aliyeka din, di nava xelkê temamê dinyayê de xelayî heye. Komkujiya Ermenan û Kurdan heye. Kurd li çar aliyên ser sînorên Osmaniyan, li dij hêzên din yê dinyayê şer dikin. Li dora 800 hezar Kurd koçberê Anadolê û cîyên din dibin. Sedem şer e û xelayî ye. Li aniya Rûsa Kurd hema bêje bi tena serê xwe şer dikin. Di yek carekê de li qeza Sariqamişa ser bajarê Qersê 90 hezar însan hatin kuştin ku piraniya wan Kurd bûn. Di vê babetê de Mevlanzade Rifat weha dibêje:

“Êrîşa ku di meha ewil ya sala 1915an de anîn (Rûs) ser bajarê bi navê ‘Sariqamişê’ artêşa hêja ya dewleta Osmaniyan îmha kiribû. Li gor agahiyên bi belgeyan 75 hezar leşkerên me hatine wenda kirin. Rûsya ya ku ji vê têkçûna artêşa Osmaniyan îstîfade kir û hêzên wan yê ku li ser sînoran in, bi yekîneyên piştekkirinê zexim kirine û derbasî dewra êrîşan bûne. Ji aliyekê de Wanê û di qerexê behrê de Sancaxa Lazistanê, wîlayeta Erzeromê û di nawendê de aliyê Erzerom û Ezirganê kirine hedef û bi pêş de diçin.”⁴⁸

Di vir de her çiqas behsa 75 hezar leşker tekirin jî di gelek çavkaniyan û niqaşan de behsa 90 hezar leşker tekirin.

Ji bilî şerê cîhanê yê yekem, di navbera salên 1918 û 1922 an de car din şer ji bo Tirka û Kurdan berdewame. Di sala 1925 an de şerê Kurda û dewleta Tirkîyê careka din dest pê dike. Di dîrokê de wek Bizava Azadiyê an Tevgera Şêx Seîd tê binavkirin. Di salên navbera salên 1926 û 1932 an de Şerê Agiriyê heye. Ji 1926 an heya sala 1937 an Şerê Sasonê heye. Şerê Dêrsimê heye. Ev şert û mercên ku me behs kir hemû, di dema jiyana Reso de ne û Reso vana bihîstiye. Nabêjim Reso şer kiriye lê bandora aborî û siyasî tev li Reso û malbata wî bûne. Ji xwe giraniya kilamên Reso li ser van şer û serhildanan e.

⁴⁸ Mevlanzade Rifat, *Türkiye İnkilabının İcyüzü*, Pinar Yayınları, ç. 2. İstanbul, 2000, r. 89

Her weha di destpêka Komara Tirkîyê de û heya salên dawîya 1990 an, em dibînin ku axaftina bi zimanê Kurdî car din qedexe ye. Kurd bi pereyên xwe tên cezakirin û di zîndanên dewletê de tên zîndanîkirin. Dema em bi giştî li qewimandinên Kurdistanê dinêrin, em dibînin ku Kurd çewa di wan şertan de, ji ber ku nikaribûne bûyer û qewimandinên di dîroka xwe de binvîsin, hemû hestên xwe weka Reso û jêderên stranên Reso, xistine ser zargotina Kurdî, bi taybetî ser kilamên xwe. Li ser vê mijarê Hozan Brader di hevpeyvînê de dibêje:

"Dengbêjî hunerek xwezayî ye. Însanan bi qirika xwe vê hunerê pêk aniye. Her em çiqas bêjin ji ber ku qedexebûn li ser wêjeya me ya devkî hebû lewra dengbêjî bûye wêjeya me ya devkî jî. Lê ger ew qedexebûn tunebûya jî wê li Kurdistanê dengbêjî hebûya. Ji ber ku dengbêjî berya her tiştî hunereka mezin e. Qedexebûna wêjeya nivîskî, ku dengbêjiyê ew bar daye ser milên xwe, ji vir destpêdike."⁴⁹

Wê di mijara kilamên Reso de bê dîtîna ku li ser kî û kîjan şerî, kîjan kilaman gotiye, şert û mercên wê demê çewa bû ne, wê hemî rohn bibin. Ji ber ku her kilam eksa qewimandinên wê dîrokê ne. Reso dengbêjek dîrokî, siyasî, evîndarê suruştê, beytbêj û destanbêj bûye. Mirov bi rihetî dikare bêje ev taybetmendiyên han di dengbêjiyê de, asta herî bilind e. Raste ku xwenda nîne lê her tim li ser wî qedexebûn heye. Ger tenha yek mînakê bidim; di sala 1980 yan de Kenan Evren û desteya wî qanûnek derxist. Ew kes an kesên ku di dezgeyên fermî de bi Kurdî biaxifiya, dadwer dikaribû di navbera yek salek heya sê salan cezayê zîndanê bida wan. Yek kasetek bi bandrol ku bandrola kasetê ji Wezareta Rewşenbiriya dihat sitendin, cezayê wê 3 sal û 9 meh bû. Ev ceza ji bo kasetê Şivan Perwer ya bi bandrol dabûn hevalem min. Ev her du mînak bi serê xwe mînakên gelek biçûk in.

Ger em behsa salên piştî 1930 an bikin, dikarim bêjim her Kurdek ku bi Kurdî biaxifiya cezayê pere didan wî Kurdî. Di sala 1933 yan de rojek Seyda Mele Evdillayê Xerzî tê Amedê û bi Kurdî diaxife. Zabita û leşker wî digrin û dibin baregeha xwe. Seyda sûcê xwe dipirse. Sûc axaftina bi Kurdî ye. Seyda pereyek zêde cezayê xwe dide û ji wan re dibêje ku wê heya êvarê jî li Amedê bimîne. Ji bilî zimanê Kurdî jî tu zimanek nizane. Ji wan daxwaz dike heya roja din cezayê axaftina wî ya bi zimanê Kurdî çiyê, ew ceza jî jê bistînin lê careka din wî aciz nekin. Di her pêvajoya jiyana Kurdên li bakûr de, pîrsgirêka bêşê, axaftina zimanê Kurdî û çûna leşkeriyê bo dewletê

⁴⁹ Ji hevpeyvîna bi Ozan Brader re, Mêrdîn, 10. 01. 2013.

hebûye. Ji bilî vana jî dewletê tu car nexwestiye Kurd ji xwe re bixwînin û bibin xwedî zanistiyeke baş. Tevî ku perwerde bi zaminê Tirkî jî bû. Di salên 1960 ande, Serokê Fermandeya giştî ya Tirkî Cemal Gürsel digot ger em li rojhilatê Tirkî (Kurdistanê) dibistanan vekin wê fikrêk weka Kurdîniyê bi xwe re bîne. Ev jî ji bo dewleta me xeter e. Ev yek mînakek ji devê desthilatdarek Tirkî ye.

Resoyê Gopala, bi navekî din Resoyê Mihacir, bi malbata xwe ve, her dem li koçberiyê bûye. Nikaribiye bixweyne an here dibistanê. Li ser ziman û dengbêjiya wî her tim qedexe hebûye. Di vê mijarê de wê behskirin bê çewa li ser dengbêjên Kurda, bi taybetî di mijara gotina kilamên siyasî de çawa qedexeyek mezin hebûye. Li ser vê mijarê mînak gelek in. Piştî salên 1980 yan dema ku Kenan Evren tê bajarê Xînusê, Şakiroyê dengbêj tehdît dike. Nabêje kilama nebêje lê dibêje kilamên xerab nebêje. Vateya kilamên xerab, kilamên siyasî ne. Her wisa ji Huseynoyê dengbêj re jî daxwaza wergera hemû kilamên Kurdî bo zimanê Tirkî tînin. Lê Huseyn vê daxwazê napejirîne. Redda vê pêşniyariya Radyo ya Erzeromê dike. Reso jî ne bawere ku di dema jiyana xwe de hinek bêhnfirehiyê bibîne. Gelek caran, di hinek babetan de bi gazî û gilî ye. Ebdulkerîmê kurê Reso weha dibêje:

"Bavê min digot ez ê bimirin û wê du kul di dilê min de bimînin. Yek ji wan ew e ku her kilamek min du an sê vateyên wan hene lê tu kes nizane ez qesda çî dikim. Kes ji min fêm nake. Dûyem jî wê radyo û televisyonên Kurda çê bibin lê ez nabînim. Wê ev her du bi min re herin gorê. Mînak di kilemek xwe de dibêje: Çiya, em hemî çiya ne. Çiyayên biçûk rabûne, çiyayên mezin di berde melûl mane. Di vir de qesda Reso ev e ku biçûk îro rabûne û ji mezinan re dibêjin hun bi tiştêk nizanin. Mînakek din: Kewa xwe ya kubara, di kavilê gunda de, ilmê nehwe, qaîde serf wenda kir."⁵⁰

Gelek mînak hene ku em dikarin bidin. Dewletê qedexeyên xwe danîbû ser zimanê Kurdî lê Kurd di zargotinê de, di ber xwe didan. Bi taybetî di rêya dengbêjiyê de. Reso yek ji dengbêjên piştî salên 1900an e. Li dijî qedexekirina zimanê Kurdî bi kilam, destan, beyt û serpehatiyan di ber xwe daye.

Piştî van agahiyan niha em dikarin behsa jiyana Reso bikim.

⁵⁰ Ji şiroveya Ebdulkerîmê Reso, ji bernameya "Civat û Kilam"ê, Dunya tv. , Gaziantep, 2013.

2.4. JIYANA RESO (1902-1983)

Bavê Reso, Welo bi malbata xwe ve, ji der û dora Yerîvan û Çiyayê Elegezê, ji gundê Varansofkê koç dikin û tên qeza Îxdîrê, li gundê Kerîmbelliyê binecîh dibe. Reso li vî gindî tê dinyayê. Ji bo ku ew kesên ku di wê demê de ji ciyên navborî derbasî vî aliyê dibin, ji wan re tê gotin Mihacirên Çemê Reş (Eresê). Rûbarê Eresê di dîrokê de, di navbera Kurdistan û Rûsyayê de, her dem sînor bûye. Îro jî ev çem, sînorê navbera wan e.

“7 zarokên Welo hebûne. Ahmed, Mihemed, Reso, Hemîd, Ûsiv, Hezê û Cewahir. Ji van zarokên Welo, Ahmed û Mihemed ji Reso mezintirin.”⁵¹

Di nava babeta eşîra Bekiran de me behs kiribû ku ev eşîr ji pez xwedîkirinê zêde hesdikir. Malabata Reso jî ji xwedîkirina pez, terş û tareş gelek hesdikir û weka karê rojane heywanan xwedî dikir. Berê herkes diçû ber terşên xwe. Yê ku heywanên wan zêde buna, ji xwe re şivan, gavan, berxikvan an karikvanan digirtin. Lê Bavê Reso tevî zarokên xwe, ji xwe re pezên xwe xwedî dikirin û şivantiya mala xwe dikirin. Her şivanek di nava xwezaya der û dora xwe de kê an zêde fêrî stranbêjiyê dibe. Reso yek ji vana ye. Çêkerê bernameya Kilam û Civatê Mehdî Mutlu di mijara li ser Reso de ku bernameyê bi kurê Reso Ebdulkerîm re çêkiriye dibêje:

"Li Kerîmbelliyê, di emrekî piçûk de diçû ber pez û karê nava mala xwe dikir. Dema bi bavê xwe yê Welo re diçû ber pez, minemin dikir. Ji ber ku meraqa Reso li ser kilaman hebû. Rojekê dîsa bi bavê xwe re li ber pez, loqa wî di devî wî de kilama "Xemê" minemin dike û bavê wî bi dengê wî yê xweş dihese. Bi navê Evdo apekî wî jî heye. Ew jî dengbêjekî hûr e. Li ser salixên ku min standiye bi Evdal û Gula Fileh re dengbêjî kiriye. Gelek alîkariya wî dike."⁵²

Belê kilama "Xemê" ku bi nav û deng e, ji aliyê Reso de hatiye belav kirin. Lê di serî de jî me behsa Reso kir ku di nava mala xwe de li ber destê apê xwe Evdo fêrî kilaman bûye. Mamê Reso Evdo û birayê wî Ahmed her dû jî dengbêj bûne. Ahmed bi xwe dengbêjekî veşartî bûye. Xwe zêde aşkera nekiriye lê Evdo bi Evdalê Zeynê re û bi Gula Filleh (Xamûrê) re dengbêjî kiriye. Reso bi xwe jî di temenek biçûk de, li ber Gula Fille kilam gotiye lê wê çaxê gelek biçûk bûye.

⁵¹ Ji hevpeyvîna bi Ebdulkerîmê kurê Reso re, Mûş, 2013.

⁵² Ji hevpeyvîna bi derhênerê bernameya "Civat û Kilam" ê ji ya bi pêşkêşvan Mehdî Mütlu re, Gaziantep, 18. 06. 2013.

Reso, bi navê Resoyê Gopala, Resoyê Mihacir, Resoyê Qilîwelo û Mîrê Dengbêjan tê naskirin. Ji bera Êlesoriya, ji eşîra Bekira ye. Reso ji Îxdirê mala xwe tîne gundê Mele Dawûda ya li ser Xinûsê û bavê wî li wir wefat dike. Di jiyana Reso de, gundê Mele Dawûda xwedî ciyek taybete ji ber ku Hecî Sînoyê dengbêj li wî gundî rûdinê. Hecî Sîno bi xwe dengbêjek gelek zana, navdar û xwedî bi rûmeteka mezin e. Ew bi xwe şagirtê Evdalê Zeynê ye. Reso di wê xortaniya xwe de li ba Hecî Sîno dengbêjiya xwe bi pêş dixê û dikeve bin bandora Hecî Sîno. Dema mirov behsa dengbêjiyê dike, ne ku mirov dibêje dibistana dengbêjiyê heye. Ji dengbêjan re dibistan, guhdarkirina li dengbêjen baş e. Pêwîst e mirov baş guhdarî bike. Reso yek ji wan kesaye ku guhdarvanek gelek baş bûye.

Piştî mayîna li gundê Mele Dawûda ya ser qeza Xinûsê, Reso, mala xwe dibe gundê Gopala ku di wê demê de, gundê Gopala li ser qeza Qereyaziya bajarê Erzeromê ye. Li wir gelekî salan dimîne. Yek navekî Reso jî ew e ku jê re tê gotin Resoyê Gopala. Em ji vî navê han dizanin ku Reso li Gopala dengê xwe gihandiye xelkê. Ger ne wisa bûya wê ji Reso re bigotina Resoyê Mele Dawûda an Resoyê Îxdirî.

Wêjeya ku Reso di nava kilamên xwe de bi kar aniye û hevoksaziya ku xistiye nava kilamên xwe, em bala xwe didinê ku di gelek de, di bin bandora ola Îslamê de maye. Bêhtir ber bi tesewifê de diçe. Ew ji malê dinyayê bêhtir behsa evîndariya olî dike. Li ser vê mijarê şagirtê Reso, dengbêj Xeniyê Qereyaziyê weha dibêje:

"Edebiyata Reso ya medresê bû. Mele Yehya (Gündüz) hebû. Zatek dihat hizkirinê. Alimek mezin bû. Li dora 70 an 80 heb feqiyên wî hebûn. Melle Yehya li gundê Çoxreşê dima ku niha li ser qeza Qereçobanê ye. Reso dengbêjê dîwana wî bû. Piraniya dengbêjiya Reso li dîwana Seyda derbas bû. Seyda, ger ez ne xelet bim di sala 1962 an de wefat kir. Lê zarokên Seyda îro jî ji Reso hizdikin. Reso dema bû dengbêj û heya wefata Melle Yehya, li wir dima."⁵³

Em ê di pêş de jî, di mijara berhemên Reso de bibînin ku wêjeya medresê çiqas li ser Reso bandorek mezin kiriye. Bi taybetî di beş ali ser kilamên Reso de, em ê li ser naveroka kilaman rawestî û bêjin ka Reso di bin bandora medreseye de çawa maye. Reso di jiyana xwe de, xwe ji mela û şêxên Kurdan dûr nekiriye û her dem di dîwanên wan de bû ye. Lê Resokilamên govendê jî baş dizanibû. Dikarim bêjim ku gelek

⁵³ Ji hevpeyvîna min û dengbêj Xeniyê Qereyaziyê, İstanbul, 01. 07. 2013.

dengbêj berya her cure kilaman bizanibe, kilamên govendê jî baş dizane. Em di şahiyân, dawet û govendan de dibînin ku Reso li serê civatê ye. Ji ber ku weka her dengbêjek Reso jî dikare kilamên govendê bêje û bo wî, destpêka dengbejiyê ye. Lê her kesê ku kilamên govendê dibêje, dibe ku bi xwe ne dengbêj be. Ji ber ku kilamên govendê sivik in û yê şahiya ne. Di wan de xem, keder û şîn tune. Tenê yê şahiya ne. Ji kilamên dengbejiyê gelek cuda ne.

Reso, çawa di şahiyân û dawetan de bi kilamên govendê bi nav û denge, wisa jî bi dengbejiya xwe dibe xwedî navek mezin. Reso xort e. Kilam ji devê wî kêr nabin. Êdî dilê bavê wî ne pêve. Reso dikare debara xwe bike. Reso dengbêjek wisa ye ku pez û dewar jî bi dengê wî mezin dibin û guhdarvanên wî ne. Reso ji gundê Gopala bar dike û diçe gundê Xirgizê ku li ser qeza Kopê (Bulanix) ye. Xirgiz gundê şêxan e. Şêx ji Reso gelek hizdikin. Reso diçe ber pez û dewarên wan. Lê Reso tu civatek û dawetek ji destê xwe bernade û diçe wan. Reso di her civatê de gula civatê ye. Wisa dibe ku şêxên Xirgizê Şêx Nûreddînê Şêx Silêman û Şêx Bahaddînê Şêx Êsiv, zarokên xwe di şûna Reso de dişînin ber pez û dewaran da Reso ji wan û mêvanên wan re kilam, beyt û destanan bibêje.

Resoyê Mihacir ji gundê Xirgizê bar dike û diçe gundê Arincika ku li ser qeza Kopê (Bulanix) ye. Reso li gundê Arincikê paleyiyê dike. Gundiyên Arincikê ji Reso gelek hizdikin. Koçberî an ku mihacirî her tim qedera Reso ye. Reso mala xwe bar dike û diçe gundê Gopala ku îro li ser qeza Qereçobana Erzeromê ye. Gopala berê li ser Qereyaziyê bû. Piştî Qereçoban bû qeza, gundê Gopala jî çû ser qeza Qereçobanê. Ev cara duyemê ku Reso diçe gundê Gopala.

Ji ber ku Reso, li deşta Mûşê û li qeza Kopê (Bulanixê) zêde dihat hizkirin û naskirin, şêxên heremê ji Reso daxwaz dikin ku here cem wan bimîne. Li ser vê daxwaza şêxan, Reso tê gundê Xoşgeldiyê. Li dora neh salan li wir dimîne.

Şêx Xiyaseddînê kurê Şêx Me'rûfê ku di wan salan de mebûsê Mûşê ye (Giyaseddîn Emre), ji Reso daxwaz dike ku here bibe dengbêjê malbata wan, li gundê Koxakê. Reso teklîfa Şêx Xiyaseddîn qebûl dike û tê li gundê wan yê bi navê Koxakê binecîh dibe. Koxakê gelek qelebalix û şên e. Li ber çemê (rûbar) Mûradê ye. Çemê Mûradê ku milê herî mezin yê rûbarê Feratê ye. Çemê Mûradê ji bo Resoyê dengbêj ciyê sûdwegirtinê ye. Reso gelek cara li ser çemê Mûradê kilaman gotiye û navê Mûradê di nava kilamên xwe de, weka qiyasek bi kar aniyê. Reso ji gundê mala Şêx

gelek hiz dike. Ev sala ku tê behskirin, sala 1958 e. Di wan salan de teyba Şêx Xiyaseddîn heye û dengê Reso qeyd dike. Bi sedan kilamên Reso niha di arşîva wî de ne. Arşîva Şêx Xiyaseddîn ya taybet e. Di derbarê Reso de, malbat û kasetên wî de dengbêj Zahiro weha dibêje:

“Xezîna Reso bi Reso re çû. Dema teyb derketin dengê wî jî çû. Li ser dengê xwe yê esasî ji Şêx Ahmedê Qerayaziyê yê ji gundê Avziravkê re 2 kaset dagirtiye. 2x90 metre. Li ser hemdê xwe gotiye. Ji Şêx Giyaseddîn Emre re 3 an 4 kaset dagirtiye. Dibe ku ew kaset di 12 ê Eylulê de nemabin.”⁵⁴

Di wan salên ku bi Şêx Xiyaseddîn re derbas dike de, dengê Reso gelek xweş e û hêj dengê wî xerab nekirine. Em ê bibînin ku di salên pey de, wê dengê Reso bidin xerab kirin. Gelek kes ku hizkiroxên Reso ne, zahf cara diçin cem Şêx Xiyaseddîn da kasetên Reso ji xwe re kopya bikin, Şêx Xiyaseddîn nade wan. Lê ji bo raya giştî û heyranên Reso baş Reso binasin, pêdiviya wan bi wan kasetên Reso hene. Şêx Xiyaseddîn di sala 2012 ande çû ber rehma Xwedê. Niha kurê wî li şûna wî dinêre û arşîva Şêx li ber destê kurê wî ye. Lê weka ku ji dengbêj Zahiro gotiye, dibe ku van kasetên wan nemabin. Bi taybetî piştî 12 ê Êlûna sala 1980 yan.

Di dema ku Reso li Koxakê ye, du jin û zarokên ku ji wan jinan in hene. Malabata Reso qelebalix e û ji bo debara xwe ya malbatê, di havînan de diçe gundê Şemerşêxa Mûşê. Di sala 1966 an de jî li gundê Melekorkê rênçberiyê kiriye.⁵⁵

Reso di sala 1967 an de diçe gundê eşîra xwe, gundê bi navê Piyongê. Demek li cem pismamên xwe dimîne.

Reso di salên 1967 û 1973 an de diçe qeza Bûlanixê gundê Gebola û li cem Şêx Cemalê (Yetişkin) Şêx Ebdurehîm dimîne. Şêxên Gebola heqşînas û camêr in. Heq û hûqûqên kesî naxwin. Li cem wan sedeqe, destmaçkirin nîne. Di wan de mirîdatî tune ye. Di pêş de, di berhemên Reso de wê bê dîtin ku li ser wefata Şêx Cemal kilamek jî gotiye. Navê vê kilama Reso ‘De Menal, menal’ e ku di pêveka tezê de tamamê metnê wê heye.

Di sala 1974 an de diçe gundê Qaraxliyê û heya sala 1976 an li wir dimîne. Di jiyana Reso de em dibînin ku gelek ciyan guherandiye da debara mala xwe bike. Ez

⁵⁴ Ji hevpeyvîna min ya bi Zahiroyê dengbêj re, Aydın, 24. 01. 2012.

⁵⁵ Ji hevpeyvîna min bi kurê Reso bi Evdilkerîm Güner re, Mûş, 12. 05. 2013.

nabêjim Reso gelek feqîr bû lê hebûn û tunebûnê bi hev re dîbû. Ew du xelayên mezin ya salâ 1914 an heya 1918 an û ya salên navbera 1939 û 1945 an dîtibû. Heya sala 1976 an Resoyê Mihacir li Kurdisatanê bi taybetî li gund û bajarokên herema Serhedê digere.

Di sala 1976 an de Reso, vê carê ne di nava sînorên Kurdistanê an herema Serhedê de koç dike. Ew koçî Anadolê dike. Koçî welatek xerîb ku li wan deran Kurd gelek kêr in. Diçe bajarê Manisayê. Li wir 4 salan dimîne. Mixabin Manisa bo Reso ciyek xerîb e. Reso dibe weka masiyek ku ji avê derketiye. Reso bi zarokên xwe ve, li nava bax û bostanan dixebite. Rojek kela dilê wî radibe û dest davêje guhên xwe dest bi gotina kilaman dike. Dengê Reso dengeke dawûdi ye. Gelek bilind e. Cîranên ku Tirkin hema tîn cem Reso û bi Tirkî jê dipirsin. Dibêjin apo, xêr e? Gelo yek miriye ku tu ewqas hewar dikî. Reso li ser vê gotina wan dilşikestî dibe. Biryara xwe dide ku vegere welatê xwe Kurdistanê. Ji Manisayê mala xwe bar dike û diçe bajarê Mûşê, nahiyeya Ziyaretê, gundê Pagê. Sê sal li wir jiyana xwe dewan dike.

Di sala 1983 an de nexweş dikeve û Şêx Xiyaseddîn Emre, Reso li Ankarayê li nexweşxanê dide razandin. Şêx gelek cara diçe serdana wî. Mixabin Reso qismetê wî li dinyayê nemaye. Di 24ê Çileyê Pêşîn de, di sala 1983 an de diçe ber rehma Xwedê. Cenazê Reso ji Ankarayê tînin gundê wî Pagê. Gora Reso li gundê Pagê ye û çêkiriye.

2.5. JEHRDANA RESO

Ji aliyê dengbêjiyê de, di jiyana Reso de du dewre hene. Dewra beriya jahrdana wî û ya piştî wê. Piştî jahre didin Reso, dengê wî xerab dibe û dest bi gotina kilamên nerm dike ku bi strandina wan naêşe dibêje. Ji jahrdana wî heya du an sê salan morala Reso gelek nebaş e. Li ser jahrdana Reso kurê wî Sadiq ji lêkolîner Ahmed Aras re weha dibêje:

"Wan yên Sûrîyê, di dawetê de neh, deh dengbêjan tînin berî pêsîra bavê min didin. Du, sê rojan ew bi hev ra distrên. Di dawiyê da, ew dengbêjên wana gişk dest li ber bavê min datînin, yanî bavê min berî wan dide. Sibetirê jî, ji bavê min ra qehwe tînin, qehweya tal, navê wê "mira" ye çî ye. Bavê min li qehwê dikeve şikê. Çimkî beriya wê, di nav wan yên Sûrîyê de pistepist çêdibe, bavê min jî dibîne. Bavê min di dilê xwe da dibêje heyran, eger qehwa wan venexwum, dê xelet şirove bikin, paşê dê li ser xeberdan çêbibe. De welle ew zehîr be jî ez ê vexwim. Got dema ku min qehwe vexwar, min usa hîs kir her wekî jehra marê kor bû, di qirika min da çû xwarê. Li ser wê qehwê êdî dengê bavê min tê birîn. Wexta ku ji dawetê hat, nikarîbû xeber de jî.

Deng bi temami çû bû. Dema ku nan, av dixwest bi îşaretan ji me re tarîf dikir. Bêdengiya wî zemanekî dirêj dewam kir. Paşê çû doktor, derman danê, dengê wî hêdî bi hêdî vebû lê êdî mînanî berê nebû.”⁵⁶

Ev jahrdana Reso dikeve navbera salên 1968 û 1969 an. Hinek lêkolînan û dengbêj dibêjin ku wan dengbêjên li dawetê hine xistine nava qehwa wî. Hinek kes ji xelkê û dengbêjên din hene ku dibêjin MÎT (Mûxaberata Tirkiyê) a Tirkiyê bi awayek xwe gihandiye bin konê mala dawetê û jahr dane Reso da nema karibe kilamên siyasî bibêje. Hene ku dibêjin ew jahrdayîn bo qesda kuştina Reso hatiye kirin. Lê deng xerabkirin bêhtir ramanek mantiqiye. Ger dewleta Tirkiyê bixwesta, raste rast dikaribû Reso bikuje. Ji ber wê jî ev ihtîmal zahf qels e.

Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê dibêje:

“Reso piştî ku li mala dawetê hinek derman didin wî, tê Tekmanê cem hevaley xwe ye bi navê Zekî ku bi xwe Almancî bû. Dostên hev bûn. Reso dibe ser doktor. Doktor dibêje di nava qehwê de hinne dane Reso. Paşî doktorek din derman dide Reso û piçek dengê wî vedibe. Lê di wê navberê de Reso li dora 3 sala bê moral kilaman nedigot. Paşî ku piçek dengê wî vebû Reso kilamên evîni û beytan digot. Bi wezna rihet distra da zor negihê.”⁵⁷

Di nava xelkê de xeletiyeka din heye ew jî di têngiştina jahrdanê de ye. Hinek kes behsa Mala Haco dikin ku di binê konê wan de jahr ê dane Reso. Lê ev mijar ne wusa ye. Ji ber ku dawet ne ya Mala Haco bû ye û li bin konê wan ev bûyer ne qewimiye. Di vê mijarê de Mala Haco gelek cara gotine ku ji aliyê wan de tiştêk wisa çênebû ye. Dibe ku ev mijara Mala Haco bi zanîn tê gerandin ji ber ku Mala Haco siyasî ne û Haco Axayê Hevêrkî piştî bizava 1925an koç dike Binê Xetê. Li wê derê bi Celadet Bedirxan û gelek kesên dine re Xoybûnê didamezrîne. Di sala 1940an de diçe ser dilovaniya xwe û kurê wî Hesenê Haco dikeve şuna wî. Hem Mala Haco li aliye Dêrbêsiyê û Qamişlo dimînin. Têkiliya mala Haco bi Deştê Sûrûcê re tune ye. Di navbera wan de 300 km navber heye. Di mijara ku jahr dane Reso de kurê Reso Abdulkerîm Güner weha dibêje:

“Sala 1969an bû. Gundiyekî me bi navê Mihemed Elî di dema mihaciriyê de koçî Misircê (Kurtalan) kiribû. Suneta kurê wî bû. Ji Misircê hat gundê Piyongê da bavê min weka dengbêj bibe Misircê bo suneta kurê xwe. Bavê min Reso û gelek ji xelkên me bi hev re çûn Misircê. Piştî sunetê bavê min dibêje ez bi were nayem û ez ê herim Rihayê qeza Sûrûcê cem dostekî xwe. Navê wî niha nayê bîra min. Bavê min dema

⁵⁶ Ahmed Aras, “Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê”, Kovara Bîr, hej. 7, Diyarbekir, 26 Sibat 2010.

⁵⁷ Ji hevpeyvîna bi Xeniyê Qereyaziyê re, İstanbul, 02. 07. 2013.

diçe Sûrûcê, du roj dimîne û hevalê wî dibêje waye dawetek li ser sînore Sûriyê heye, em herin dawetê. Reso jî qebûl dike û bi hev re diçin dawetê. Li binê konê dawetê 7 dengbêj her carê li piya kilam dibêjin û bavê min rûniştî dibêje. Lê bavê min wan dide rawestandî. Di binê konê dawetê de, hinne dixin nava qehwa wî û dengê wî xerab dibe. Ji wir diçe ser doktorên Mersînê, Adanayê û Îstebolê lê jê re çare nabînin.”⁵⁸

Dema kurê Reso Abdulkerîm vê mijarê rohnî dike, ew gumana li ser malabata Haco yê Kurdperwer bû jî, ji holê radibe.

2.6. MALBATA RESO

Reso sê caran zewici ye. Ji sê jinên Reso Emê û Gulê berê rehmet kirine. Lê Sakîne di sala 2013an de wefat kir. Emê Coşkun, ji eşîra Bekiriya bû. Dotmama Reso bû. Gulê Deniz jî ji eşîra Bekiriya, ji yêna Îxdirê bû. Sakîne Özçelik, ji gundê Koxakê ye ku dikeve ser qeza Bûlanixê. Ji mala Şêx Huseyin bû û qîza Şêx Fetê bû. Paşnavê malbata wan Özçelik e. Çar kurên Reso û 8 qîzên wî hene. Kurên wî Ebdulkerîm, Sadiq, Seîd û Sebrî ne. Qîzên wî Zelîxan, Hediye, Fatma, Perîxan, Belqîzar, Perîzade, Senem û Sînem in. Malbat lig eleka hêrêman belav bûye:

Abdulkerim Güner: Li Mûşê li gundê bavê xwe dimîne. 67 salî ye. Dengbêjiyê dike û mezinê malbatê ye.

Sadiq Güner: Li bajarê Denizli yê dimîne. 66 salî ye. Tu karî nake.

Said Güner: Li Mûşê li gundê bavê xwe dimîne. 60 salî ye. Li gundê bavê xwe dimîne. Karê cotyariyê û heywan dike.

Zelîxan: Bi Heci Zekî Badıkanlı re zewiciye. Hecî Zekî ji gundê Koxakê ye. Zelîxan naxebite. Hecî Zekî ji YSE yê teqawud bûye. Temenê wî li dora 75 salan e. Li Manisa yê dijîn.

Hediye: Bi Ahmed Mutlu re zewicandî ye. Pismamê vaê Reso ye. Karê însaatê dike. Li Manisa yê dimîne.

Fatma: Bi Mustafa Aslan re zewicî ye. Jina mala ye. Mustafa di kare însaatê de dixebite. Li Manisa yê dijîn.

⁵⁸ Ji hevpeyvîna bi Ebdulkerîmê kurê Reso re, Mûş, 12. 11. 2012.

Perîxan: Li gundê Gopala zewicandî ye. Bi Şemsedîn Güneş re. Şemsedîn kurxalê Reso ye. Karê gund dike.

Belqîzar: Bi pismamê xwe Esrafil Serin re zewicî ye. Esrafil karê însaatê dike. Pismamê Reso ye. Li Denizli dijî.

Perîzade: Bi Sadredîn Akbulut re zewicî ye. Sadredîn ji xelkê Bûlanixê ye. Karê însaatê dike û li bajarê Maraşê dijîn.

Senem: Bi Fikret Deniz re zewicandî ye. Fikret kare însaatê dike.

Sînem: Bi pismamê xwe Mustafa Aydın re zewicî ye. Karê markete dike. Li Îstenbolê dijîn.

Malbata Reso jî, ji van kesên ku navên wan li jorê hatiye nivîsandin pêk tê.

2.7. NÊRÎNÊN DENG BÊJAN LI SER RESO

Reso, bandoreke mezin li ser mirovên dema xwe û yê piştî xwe pêkaniye. Dengbêj Şakiro, Xeniyê Qereyaziyê, Zahiro û Ebdurrehîmê Mûşî hin ji wan kesan e ku di demên curbecur de, li ser Reso fikr û ramanên xwe anîne ser ziman. Me ev gotinên ku ji aliyê kesên curbecur ve hatine gotin, bi vî şiklî rêz kiriye:

Dengbêj Şakiro:

Dengbêj Şakiro ji rojnamevan Rahmi Batûr re weha gotiye:

"Ez dilşikestî me. Kurd qedrê dengbêjan nizanin û li nîrxên xwe jî xwedî dernakevin. Li Tirka binêrin! Yek Aşiq Weyselek wan hebû lê xwedî bûn. Wî bi hemû cîhanê dan nasîn. Lê dengbêj Resoyê me jî hebû. Ez çewa wî ji te re bînim ziman, ew mamosteyê me hemûyan bû. Mixabin me ew ji birçîna kuşt. Ka ji min re bibêje ez çewa derê dîwana dilê xwe yê birîndar ji te re vekim û bi te re biaxifim!"⁵⁹

Hinek bîranînên Reso ji devê Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê:

1- "Sadiqê xwarziyê Reso heye ku niha temenê wî li dora 90 salan e. Ew jî dengbêje. Sadiq daîma kilamên Ferzê digot. Dema ku kilaman digot û kilamê şaş digot an xerab fikir, Reso jê re digot wey la çavên te gewr bûyo. Yanî tu bimrî. Ferzê hem hevalê Reso bû û hem dengbêjeke gelek baş bû. Kilamên wî gelek mukemmel bûn. Lewra Reso qebûl nedikir ku kilamên wî bi şaşî bînin gotin an bînin xerab kirin."⁶⁰

⁵⁹ Ji nivîsa dengbêj Ebdurrehîmê Mûşî, www.serhed.org.

⁶⁰ Ji hevpeyvîna min bi dengbêj Xeniyê Qereyaziyê re, İstanbul, 21. 07. 2013.

2- "Ez ji eskeriyê hatim Qereyaziyê gundê Söylemezê da ji wir herim gundê xwe Gopala. Di gund de dawet hebû. Ez çûm dawetê û min dît dengê du dengbêjan ji odê tê ku dane ber hev. Ez jî çûm cem wan û min li wan guhdarî kir. Di nava her duyan de yek ji wan navê wî Sofî Bahaddîn bû. Ji ber ruyê wî sor bû jê re digotin Sofiyê Rû Sor. Kilaman xweş digot lê dema digot, pê re bi destê xwe rihê xwe şe fikir. Sofî ji min pirsî got tu ji ku derêyî? Min got ez ji Gopala me. Got tu Reso nasdikî? Reso nizanibû derewan bike. Reso hema raste rast dibêje: Reso ez im. Sofî Bahaddîn Reso dide pêşberê xwe û du rojan pê kilam dide gotin. Ger yekî din di şûna Reso de bû ya wê biçûya mala xwe. Ewqas aşiqê dengbêjiyê bû û nikaribû dilê tu kesî bihiştta."⁶¹

3- "Reso û du hevalên xwe, herkesek heywanek daye pêşiya xwe wê bibin bajarê Erzeromê bifroşin da pêdiviyên xwe yên zivistanê ji xwe re bikin. Bi peyatî diçin. Di gundê Taşkesanê de wê derbas bibin. Tê binê Taşkesanê û Reso dibêje ka em herin gund, ji xwe re limêja xwe bikin û xwarinê bixwun. Reso û hevalên xwe diçin gund, dibînin ku li gund dawetek heye. Du dengbêj jî li dawetêne. Dengbêj berê li ser balgîvan rûdiniştin û kilaman digotin. Reso dibêje herin ji wan dengbêjan re bêjin yek li civatê heye dixwaze ji we re kilaman bêje. Yek ji wan dengbêjan aqilê Reso ew digre. Navê wî Husê Polo ye ku ji gundê Xanbega Tekmanê ye. Bi Reso sê kilam didin gotin. Dema sê kilam xelas dibe yek ji mezinê civatê bi milê Reso digre û datîne hember Husê Polo. Dikevin ber hev 9 an 10 kilaman dibêjin. Husê Polo ji Reso dipirse bê ka ew kî ye. Reso navê xwe ji wan re dibêje. Reso 3 rojan ji wan re kilaman dibêje. Paşî di nava pêşgîrek de hinek pere didin Reso. Du xortan jî didin pêşiya Reso da wan bibin heya hafa Erzeromê. Heywanên wana jî ew xort didin pêşiya xwe û alîkariya wan dikin. Dema xort dizivirin, Reso dibêje em ê perên xwe li hev parvebikin. Perên xwe dikin 3 paran. Ew perê ku ji dawetê dighêje wan ji perên her sê heywanên wan zêdetir bûye. Dewarên wan weka wan perên wan yên dengbêjiyê nekirin."⁶²

Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê:

"Reso wisa mutewazî û sofî bû, rabûn û rûniştandina wî gelek maqûl bû. Heya mirov tişteke jê nepirsiya xeber nedida. Dema dikete halê gotina kilamê, weka însanek bikeve îbadetê. Heya xelas nekira xwe tev nedida. Tizbî nedixist destê xwe. Reso ji xeyrî kilama beytan jî digot. Yên olî û nivîsarên din. Ji Feqiyê Teyra û Cegerxwîn jî digot.

⁶¹ Ji hevpeyvîna min bi dengbêj Xeniyê Qereyaziyê re, İstanbul, 21. 07. 2013.

⁶² Ji hevpeyvîna min bi dengbêj Xeniyê Qereyaziyê re, İstanbul, 21. 07. 2013.

Reso behr bû. Kilama Gula Di Zinêr de digot. Di nava kilamê de bawerî, evîn, mirin, ilm û meznahiya Xwedê heye."⁶³

Di beşa şiroveyan ku li ser berhemên Reso wê bên kirin de, kilama ku Xeniyê Qereyaziyê behs dike heye. Kilama bi navê 'Gul a Di Zinêr de'.

Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê:

"Reso ji yekî re gotiye torbeyek şekirê 50 kilo vala bike. Ez serê her şekirê kilamek bêjim û tu şekirê bixe torbe. Eger kilam ji hebên şekir kêmtir man, torba şekir bila ji te re be. Eger neman torba şekir bila ji min re be. Reso gelek kilaman dizanibû û gelek jî çêkiribû."⁶⁴

Ahmed Aras rojek berê xwe dide Manisayê û diçe mala zavayên Reso ku ew jî eqrebayên Reso ne û her qîzên Reso jî li civata wî ne. Li gundê Horozköy. Ahmed bi kamera xwe çûye. Li gor wan qeydiyên kamera ya Ahmed Aras:

Birayê zavayê Reso Hecî Evdilkerîm Badıkanlı ku temenê wî di ser 80 salî de ye, weha dibêje:

"Ez 15 salan bi Reso re geriyam. Nasîna Reso ji aliyê xelkê de, li dora salên 1940 û 1945 an de ye. Rast e mirov li dora dengbêjan kom dibûn lê cemaeta Reso ne weka ya dengbêjên dinan bû. Reso ji cemaetê re serdest bû. Reso dilê tu kesekî ji xwe nedihîşt."⁶⁵

Dengbêj Zahiro di derbarê Reso de weha dibêje:

"Seydayê Mele Yehya nexweş dikeve. Zarokên wî dixwazin wî bibin ser doktor. Mele Yehya dibêje bila Reso were û li cem 3 kilam hene. Bila wan ji min re bêje. Eger ez baş bûm, bûm. Ege baş nebûm, diktora bo nexweşîna min bê fêde ye. Min nebin ser doktor. Ez yê çûyîne me. Reso diçe cem seyda û jê re wan sê kilaman û gelek kilamên din dibêje û seyda baş dibe. Ji xwe Reso mirîde wan bû."⁶⁶

Zavayê Reso Hecî **Zekî Badıkanlı** ku temenê wî li dora 75 salan heye, weha dibêje:

⁶³ Ji hevpeyvîna min bi dengbêj Xeniyê Qereyaziyê re, İstanbul, 14. 07. 2013.

⁶⁴ Ji hevpeyvîna min bi dengbêj Xeniyê Qereyaziyê re, İstanbul, 21. 07. 2013.

⁶⁵ Ji hevpeyvîna lêkolîner Ahmed Aras ya bi malbata Reso re, Manisa.

⁶⁶ Ji hevpeyvîna min bi Dengbêj Zahiro re, Aydın, 24. 01. 2013.

"Ez û Reso carek ji gundê Gopala bi hev re dihatin. Ez xort bûm. Ser û guhên Reso pêçayî bûn. Egala wî li serê wî bû. Ez û Reso di berjêrek de dihatin û du siwar jî berjor diçûn. Ji me derbas bûn û ji hev re gotin ev ne dengbêj Reso ye? Em li dora 50 mêtro ji hev dûr bûbûn. Gazî min kirin û ji min pirsîn, gotin ew ne dengbêj Reso ye? Min got belê. Zivistanek dijwar bû berf hebû li erdê. Gelek jî serma bû. Siwarek ji wan hema ji ser piştê hespê zivirî û got Reso. Tu bi xatirê Xwedê bikî, hema tu kilamek ji me re bêje. Reso got vê zivistana Xwedê, çileyê, li dora serê min egal heye. Lê ka ez çî bikim got ji bo xatira Xwedê. Reso gelek sofî bû jî. Ji wan her du siwaran re hema li ser piştê hespê du kilaman got. Ewqas nedixwest dilê xelkê jê bimîne."⁶⁷

Keça Reso **Hediye Mutlu** weha dibêje:

"Kilamên bavê min gelek in û hinek dengbêj kilamên wî diguherînin û dibêjin ev kilam yê me ne. Ez bi vê kiryarê gelek xemgîn dibim. Radyo û tv li ser bavê min bernamayan çênakin. Di dema bavê min de radyo an tv yê Kurdî tunebûn. Qet nebe hema îro çêbikin."⁶⁸

Keça Reso rast dibêje ku kesek heya wê demê giringiyê nedaye dengbêj Reso. Lê piştî wê axaftina ku kiriye, min bi xwe, bê ku agahiya min ji gotinên wê hebin, li ser Resoyê Gopala yek sietek bernamê amade kir û weşand. Navê bernamê " Dengên Axê" bû, di Kurd 1 Tv de, hat weşandin. Ev beş niha di arşîva min de heye.

Ji bilî min paşî Dunya Tv bi navê bernamê Civat û Kilam ku hevalê min Mehdi Mutlu derhêneriya wê û pêşkêşvaniya wê dike, sietek û nîv li ser Reso bernamê amade kir û weşand.

Ji devê Lêkolîner Ahmed Aras:

"Min di havîna sala 1966 an de, li Qereyaziyê li Reso guhdarî kir. Wî ji me re sê sietan stran got. Min jê pirsî Evdalê Zeynê kir. Min jê pirsî û got bi qene'eta te Evdalê Zeynê dengbêjek çewa bû ye? Reso got ku Evdalê Zeynikê dengbêjek pir baş bû ye. Lê ew tiştên ku hatiye serê wî, nehatine serê tu kesî. Lê ew dayîna ku Xwedê daye wî jî, nedaye tu kesî. Reso şair û dengbêj bû. Wî gelek kilam afirandine. Ji wan kilamên wî gelek ji wan niha di nava gel de tên gotin."⁶⁹

Dengbêj Zahiro di derbarê Reso de weha dibêje:

⁶⁷ Ji hevpeyvîna lêkolîner Ahmed Aras ya bi malbata Reso re, Manisa, ji arşîva Ahmed Aras.

⁶⁸ Ji hevpeyvîna lêkolîner Ahmed Aras ya bi malbata Reso re, Manisa, ji arşîva Ahmed Aras.

⁶⁹ Ahmed Aras, *Kovara Bîr*, "Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê", hej. 7, Diyarbekir, 26 Sibat 2010.

“Ez bi xwe bi Reso re bûm. Em ji dawetê dihatin. Li gundê Îspeya ku li ser Gimgimê ye, li ser pišta hespê kilam got. Quling li ser serê Reso diçûn û dihatin. Min bi çavên xwe dît. Zahf ecêb bû bê van qulingan û Reso çawa karibûn wê pêwendiyê di navbera xwe de deynin. Lê quling zahf xerîbdost in û denga ji hev derdixin. Reso dema niv sietê kilam bigota, germ dibû û dikaribû 24 sietan ji hev veneqetî ne.”⁷⁰

Dengbêj **Ebdurehîmê Mûşî** dibêje:

Dengbêj Ebdurehîmê Mûşî jî piştî ku gelek tiştan li ser Reso nivîsandiye, helbestek jî li ser Reso nivîsandiye. Ez wê helbesta dengbêj Ebdurehîmê Mûşî bi temamî nebe jî hinek jê didim. Helbest gelek dirêje û hatiye weşandin.

MÎRÊ DENG BÊJAN RESO

Pêşengê dengbêja mîrê dîwanê
Awaza bilbil di hat ji 'eywanê
Mînanî sewta qulingê Rewanê
Deryakî mezin bû wek behra Wanê

Li seyrangêhê wî tim dikir seyran
Ji dilên birîndar radikir qeyran
Van dilên evîndar tev jêra heyran
Stêrka mezin wek Feqiyê Teyran

Dengbêjê navdar ahenga sitranê
Awaza Evdal, nalîna destanê
Wî mînanî bilbil dixwend sitranê
Bihar, payîzê, şevên zivistanê

Peykerê wî daynin li Tuxtewanê
Nûnerê Evdal Reso bû'l dîwanê
Şagirtno giş kom bin di bin sîwanê
Ew mîrê dengbêja şahê me kanê?

Taca destanê, hostayê sitranê
Dila diheland wek donê biryanê
Şaîrek mezin bû li Kurdistanê
Mînanî Evdal navdarê cîhanê

⁷⁰ Ji hevpeyvîna min bi Dengbêj Zahiro re, Aydın, 24. 05. 2013.

Hozanê serhedê mîrê dengbêjan
Pîrê sitranê hostay destanbêjan
Mîrê bi nav û deng şahê dengbêjan
Dilê min îro ji bonê di de jan

Reso mîrek bi kefil û deman bû
Dengê mîrê min ne dengê însan bû
Awaza qulingê li asîman bû
Şaîr-Dengbêjê axirê zeman bû

Bilbilê mezin wek şahê Îranê
Dîla dihêra bi kilam, destanê
Carek din rabe bibêje sitranê
Xweş bike govendê bigre dîlanê

Bi şev û rojan bêje bêrawestan
Bi oktava bilind, awaz û destan
Dilê min bihêre min bike mestan
Tuye mîrê min arama bindestan

Reso dengbêj bû, şaîrek bê mîsal
Xwedê hê îro nedaye wî emsal
Destana xweş digot wî pir bi fesal
Ji awaza bilbil têr nabim demsal

Şagirtê Sîno bû wekî şêra bû
Fîxan û feryada evîndara bû
Dermanê di dilê birîndara bû
Ew axîna dilê dost û yara bû

Newa wî pir xweş e, berz û bilind e
Reso wekî hîva ku li ser gund e
Wî dîla di heland mînanî find e
Hemtayê Ferzê bû ew gula gund e.⁷¹

⁷¹ Ji pênûsa Dengbêj Evdirehîmê Mûşî, www.serhed.org. 08. 12. 2010

BEŞA DUYEM

BERHEMÊN DENG BÊJ RESO

3.1. NIRXANDÎN Û ANALÎZA BERHEMÊN RESO.

Mirov nikare bêje bê çend kilamên Reso hene. Ev pirseka gelek zahmete. Gelek sedem hene ku meriv nagihîje tu encamekê. Sedemek ew e ku kilamên berya wî hatine gotin, Reso li ser hinek ji wana zêde kiriye. Ev zêdekirin di her şaxek wêjeya Kurdî de heye. Lê zêdekirina li ser kilaman xwedî hinek pîvan in. Pêwiste naveroka stranê û tiştên girîng ku di nava stranê de hene, neyên guhertin. Li ser mijara zêdekirinê an guhertina naveroka stranê de Reso dengbêjek gelek bi wijdan e. Tu carî kes nikare bêje Reso bi eslê kilamê leyîstiyê û guherandiye. Mijareka din ya li ser dengbêjiyê de, kilam hene ku tenê ji devê jinek an zilamek tenê du an sê rêzik hatine gotin lê dengbêj bi xeyala xwe ya fireh, ji nuh de kilamê li hev honandiye, li ser zêde kiriye û gotiye. Di haleteka wisa de ew kilam dibe ya dengbêjî.

Kilam hene ku gelek bi qelsî hatine gotin an ser û dawî ne li hev bûye. Dengbêjek radibe wê kilamê ji nuh de li hev tîne. Wê çaxê kilam nabe malê dengbêjê ku kilamê li hev rast kiriye. Lê zêdekirin û li hevanîna hevokên navê dibe yên dengbêjê dawiyê. Di haletek weha de mirov dikare bêje kilam ya dengbêjê berê ye lê honandina kilamê dibe malê dengbêjek din. Di vê mijarê de Huseynoyê dengbêj dibêje ku ew gelek çaran kilaman pîne kiriye. Bi sedema ku kilam ne li hev bûye.

Li gor Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê ku şagirtê Reso ye, di mijara jimareyên kilamên Reso de weha got:

"Li dora 2000 kilaman dizanibû. Ji wan kilaman li dora 40 an 50 kilaman, kilamên wî bi xwe bûn. Reso weka behr bû. Tevî ku xwendin û nivîsandina wî tunebû jî xezîneyek wî ya fireh hebû."⁷²

Di mijara jimara stranên Reso de, lêkolîner Zeynep Yaş jî di heman ramanê de ye. Ew jî li dora 2000 kilaman texmîn dike. Lê Ahmed Aras di derbarê kilamên ku ji

⁷² Ji hevpeyvîna min ya bi dengbêj Xeniyê Qereyaziyê re, İstanbul, 15. 07. 2013.

aliyê Reso de hatine çêkirin de, behsa li dora 15 an 16 an dike. Lê pêzanîna Zeynep û Xeniyê Qereyaziyê bêhtir nêzî hevin.

Di vê beşa li ser berhemên Reso de, wê jêdera kilamam bi tamamî ji hev bîn veqetandin. Tişteka din ya giring jî heye ku Reso gelek kilamên kesên din gotiye. Dema kilamên kesên din gotiye, ev tê wateya ku ji wan kilaman hizkiriye û wateyek wan ji bo Reso hebûye. Mînak; di nava kilamên ku Reso gotiye de kilamek heye bi navê "Lo Mîro" ye. Ev kilam ji devê jinek hatiye gotin lê li ser jêdera kilamê ramanên ji hev cuda hene.

Di nava kilamên wî de, li gor mijarên wan:

1- Kilamên siyasî yên dîrokî, 2- Kilamên evînî, 3- Kilamên suruştî, 4- Kilamên olî 5- Kilamên li ser Quling (Xerîbiyê), 6- Destanên Kurdî, 7- Maqamên ku daye helbestan hene.

Di nava kilamên Reso de 14 kilamên wî hatin bijartin û wê li ser wan şirove bîn kirin û em ê biçin nava kûrahiya kilamên wî. Kilamên ku wê şirove li ser wan bîn kirin, bi hesêb mijara xwe ji hev cûda hatine bijartin. Li gor mijara xwe kilam ne tenê di heman babetê de hatine gotin. Di nava wan de her cure kilam hene. Di nava kilamên Reso de, di serî de dixwazim li ser çend kilamên siyasî- dîrokî rawestim. Kilama " Lo Mîro" yek ji wana ye.

3.2. KILAMA LO MÎRO:

Ev kilam, kilamek siyasî û hem dîrokiye. Kilam li ser Keremê Qolaxasî hatiye gotin. Li ser vê kilamê du fikir hene ku yek ji wan ji aliyê dengbêj Xeniyê Qereyaziyê de tê gotin. Dengbêj Xenî min di serî de jî got ku şagirtê Reso ye. Eqrebayê mala Kerem ê Qolaxasî ye. Gundê wî û Reso cîranên hev in. Li gor ku dibêje Reso salê 4 an 5 caran dihat gundê wan bo dawet û dîwanan. Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê di sala 1955an de hatiye dunyayê lê di temenê xwe yê 14 salî de Reso naskiriye û li ser terzê wî kilam gotiye. Hevnaskirina wan di sala 1969an de ye. Niha dengbêjekî bi navê deng e. Arşîveka wî ya baş heye û di zanîna gelek bûyerên Kurdistanê de serdest e. Ji bilî kilamên din ku dizane, li dora 37 heb kilamên ku afirandiye he ne. Niha li Îstebolê dijî. Gelek bîranînên wî bi Reso re hene. Weha dibêje:

"Reso, di havînekê de, dibe mêvanê gundekî û li ber maleka gund rûdinê. Li ber malê jinek dew dikule. Tasek av ji jina malê dixwaze lê jinik tasek dew dide Reso. Reso dibîne dema ku ew dewê xwe dikile, pêre di ber xwe de dilorîne. Reso dipirse bê ka ev çi kilame ku jinik dibêje. Jin ji xwe şerm dike. Lê Reso dev jê bernade. Jin ji Reso re kilamê dibêje û Reso jiber dike. Ew jin jineka ku mirova mala Kerem e û ne diya Kerem û Evdal e. Ji ber ku Kerem û Evdal ne birane."⁷³

Li ser vê mijarê Abdulkerîmê kurê Reso berfirehtir behsa qewimandinê dike. Abdulkerîm ê kurê Resoyê dengbêj, weha behsa bûyerê dike:

"Beriya 1940 î ye. Bavê min ji qeza Qereyaziyê tê gundê Gopala. Di gundê Beyro de, tê gundê Qisqaniyê. Qisqaniyê gundê Keremê Qolaxasî ye. Birçî bûye û dixwaze li wir taştê bixwe û derbasî gundê Gopala bibe. Xwe nêzî malekê dike. Dibîne dengê tê. Jinek ji xwe re dewê xwe dikile, pêre jî kilam dibêje û bi kilamê re digrî. Pîrejinek e. Bavê min bê ku haya jinikê jê çêbibe lê gelek guhdarî dike. Paşî jê re dibêje: Metê! Ji dewê te re bereket be. Tu îro taştêyek nadî kurê xwe? Jinik jê re taştê tîne û datîne ber wî. Bavê min jê re dibêje: Metê! Ez taştê naxwum heya tu wê kilamê ji min re nebêjî. Jinik dibêje lawo tu xerîbî ka ez çewa ji te re kilamê bêjim. Di dawiyê de bavê min pê kilamê dide gotin. Bavê min hem nanê xwe dixwe û hem li kilamê guhdarî dike. Paşê ji jinikê re dibêje: Metê! Îzna te heye ez jî vê kilamê bêjim? Jin dibêje kerem bike bêje. Bavê min dest pêdike û kilama li ser Kerem û Evdal dibêje. Kilama bi navê Lo Mîro. Piştî kilamê xelas dike, jinik dibêje Elhemdûlîllah heya dinya hebe Evdal û Kerem her dû jî nemirin e, sax in. Navên wan wenda nabe. Dibêje Evdal û Kerem her dû kurên min in."⁷⁴

Dibe ku jin ne diya Kerem û Evdal be. Welew wisa be jî di encamê de kilam ji devê jineka Kurd hatiye gotin. Reso wê kilamê li gelek deveran gotiye û belav kiriye. Kilam li ser bûyera 1925 a ye ku hêzên Kurdan derbasî dewleta Îranê dibin.

Di sala 1925 an de, di dema ku Bizava Azadiyê ya di bin serokatiya Şêx Seîdê Palo de têkdîçe, gelek şervanên Kurd derbasî aliyê Îranê dibin. Di nava wan de, xelkê eşîra Hesenan jî hene. Bi wan re Şêx Elî Riza yê kurê Şêx Seîd heye. Keremê Qolaxasî û kurmamê wî Evdal hene. Navên ku di nava kilamê de derbas dibin ev in: 1- Keremê Qolaxasi, 2-Evdal, 3- Eyûbê Kurmxwarî, 4- Fersende, 5-Besra, 6-Ehmê Keko

⁷³ Ji hevpeyvîna min bi Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê re, İstanbul, 07. 07. 2013

⁷⁴ Ji bernama "Civat û Kilam" ya Dunya tv ku derhênerê wê Mehdî Mutlu ye, Gaziantep, 12. 10. 2012.

Kerem ê Qolaxasî: Keremê Qolaxasî ji eşîra Zirka ye. Zirkayên jorîn ku dikeve aliyê Qereyaziya Erzeromê. Zirka eşîrek gelek fireye û beşek ji wan jî li aliyê Hezroyê û Licê dimînin. Qolaxasi di dema dewleta Osmaniyan de dihat wateya " Kıdemli Yüzbaşı" tiyê. Di Kurdî de ji ber ku ew pile nînin Kurdiya wan jî nîne. Di sala 1925 an de Kerem bi xwe gelek gênc e. Kerem kurê Ahmedê Qolaxasiye. Ne ku ew bi xwe qolaxasiye. Di serhildana 1925 an de fermanarek şervanên Şêx Seîd e. Di dema ku derbasî Îranê dibin de, dewleta Îranê dixwaze ku çekên xwe deynin. Lê Kerem û hevalên xwe çek nadeynin. Leşkerên îraniyan bi çeken giran li wan didin û gelek kes tên kuştin ku Kerem yek ji wan şehîdan e.

Evdal: Evdal jî kurapê Kerem e. Ev jî ji eşîra Zirkanê Jorîn e. Kurê Mistê ye. Mistê û Ahmed her du birane. Evdal jî li Îranê bi Kerem re şehîd dikeve. Ji wan re dibêjin Mala Mistefa Axa.

Eyûbê Kurmxwarî: Di vir de qesda ji Eyûb, Eyûb Pêxember e ku kurm canê wî dixwin. Ji ber kurmên di bedena xwe de gelek rencê diye. Li dora 18 salan vê êşê kişandiye û paşî xwe bi ava şifayê dişo û baş dibe. Gora wî li beldeya bi navê xwe ye ku ji Wêranşehrê ber bi Qerejdaxê ve ye.

Ferzende: Ferzende şervanek ji eşîra Hesena ye. Ji 4 lehengên Serhildana Agiriyê yek ji wan Ferzende ye. Beşdarî Şorişa Şêx Seîd dibe. Dema hereket têk diçe, Ferzende diçe ser sînorê Îranê. Li sînor derbas dibin û fermanarek leşkerî yê Îraniyan dixwaze ku kemû Kurd çekên xwe berdin û teslîmî wan bibin. Di mevbera wan de şer dertê û Ferzende bi xwe birîndar dibe. Bavê wî Silêmanê Ahmed bi Kerem û Evdal re şehîd dikeve. Di mijara kilama "Axayo" de, ez ê bi berfirehî behsa Fersende bikim. Ferzende paşî diçe nava Şerê Agiriyê bi Îhsan Nûrî Paşa û Biroyê Heskê Têlî re, li dij dewleta Tirkiyê şerî dikin.

Besra: Jina Ferzende ye. Diya Fesîhê Mûşî ye. Lê Fesîh ne kurê Ferzende ye. Paşî bi Ferzende re dizewice.

Ehmê Keko: Yek ji mezinên eşîra Celaliya ye. Celalî eşîrek gelek fireh e ku tixûbên wan heya Rojhilatê Kurdistanê diçe. Hîmê serhildana Agiriyê ne. Dema Ferzende birîndar dibe tê mala Ehmê Keko. Ehmê Keko Ferzende nahewîne û birînen wî derman nake. Lewra ye di kilamê de bi xayîntî tê tewanbarkirin.

" Lo mîro! lo mîro! lo mîro!

Ez hatim Qisqaniya şewîf

Kerem ba dikir Evdal, Evdal dengê xwe nekir."

Di kilamê de ji mîro armanc Kerem beg bi xwe ye. Qisqaniyê bi xwe gundê Kerem e.. Kerem bang dikir Evdal, Evdal dengê xwe nedikir. Ev tê wateya ku Evdal şehîd ketiye û nemaye. Lê Kerem hêj sax e. Di vir de weka ku bûyer li Qisqaniyê derbas dibe tê famkirin lê ev ne wisa ye. Di pesindayîna her du pismaman de jî " Evdalê pozberan û Keremê bejnzirav " derbas dibe. Pozberan remzek ji ya mêraniyê ye di wêjeya Kurdî de. Bejnziravî ji bo jin û mêran tev tê wateya bejna li hevhatî. Bexê Mala Mistefa Axa, di vir de mêrên baş her tim bi berx tê şuhubandin. Berx bi xwe di kilaman de nêre û tê wateya kurê. Dibêjin " berxê nêr ji bona kêr " Ev gotineka bav û kala ye.

"Her du berxê Mala Mistefa Axa

Li biniya kona rûniştin, her duya qasê bi hev re mişewere kir."

Ji kilamê aşkeraye ku berya herin derbasî Îranê bibin, bi hev re şewra xwe kirine bo çûyîne. Di renckîşandina Evdal û Kerem de, di nava Îraniyan de, teşbîhê bi eziyet kîşandina Eyub pêxember re dike. Emîr Tuman ku fermanarê hêzên leşkerên Îranê ye, ji bo ku wan esîr kiriye û ji wan teslîm kirina çekan xwestiye, ev eziyet û zilma dewleta Îranê ji kuştina Kerem û Evdal zortir dibîne. Ji ber ku di mêraniya Kurdan de gelek tişt hene, ji kuştina wan, ji wan re girantir tîn.

Di derek kilamê de dibêje:

" Şane şûrê (şihûdê) berxê Mala Emer bavê Elfesya li dinyayê gelek hene

Bîst mêr kuştîye gava xwe dirêj kiriye

Heta nekuje 125 ê mêrê Ecem e,

Tu carê nayê ser cenazê Evdal û Kerem e."

Di vê dera kilamê de car din mesele tê ser Ferzendê Sileymanê Ahmed ku di şer de birîndar dibe. Bi wê birîndariya xwe gelek ji leşkerên Îraniyan yên Ecem dikuje. Dema dibe behsa Îraniyan, gotina "Ecem" tê bîra mirovî. Ecem, her dem bo Farisan hatiye gotin. Hetta bo Azeriyan jî.

Bi nava kilamê de zêdetir diçe û dibêje "heya nekuje 125 eskerê Ecem e, naçe ser cenazê Evdal û Kerem e." Em dizanin heya ku tiliya Fersende digere bi Îraniyan re şer dike. Ev taybetmendiyeke Fersendê Heseniye di dîroka Kurdan de.

Li wir, ji bilî Kerem û Evdal gelek kes hatine kuştin. Di her stranek de behsa hinekan heye. Nabe ku hemû nav di nava yek kilamek de derbas bibin. Ji xwe ferqa helbestê û kilamê jî ev e. Dema em li "Şehname Şehîdan" ya Cegerxwîn dinêrin, di nav de gelek nav hene. Lê ji bo ku helbeste dibe. Ev tişt bo kilamê gelek zahmet e.

Em ê di kilama li ser Fersendê Silêmanê Ahmed de bibînin ku cardin behsa navê Kerem û Evdal derbas dibe. Li gor hinek lêkolînavan, du kilam tevlihev bûne û li gor yê din temamê wê yek kilam e. Bes ev kilama hanê kilamek bi serê xwe ye. Ji ber ku di nava bûyerê de Evdal û Kerem jî hene, navê wan jî di kilamên din yê li ser vî şerî de derbas dibin.

3.3. KILAMA AXAWO

Ev kilama "Axawo" li gor lêkolîner Menderesê Cano ku pismamê dengbêj Huseyno ye, ya Resoyê Gopala ye.

Kilam bi xwe li ser Ferzende Begê Hesênî hatiye gotin. Ev kilam û ya li ser Keremê Qolaxasî hatiye gotin zahf ketine nava hev. Ev yek, ji tevlihevkirina dengbêjan nayê famkirin. Weka me di gelek ciyan de behsa jêderên stranan kir ku gelek ji wana jinan gotiye. Kilam hene ku dengbêjên wan ne diyar in. Wê demê kilam dibe anonîm ango malê gelêrî.

Weka di kilama li ser Kerem û Evdal, di vê kilamê de jî mijar bêhtir li ser komên eşîra Hesenan e. Giraniya kilamê dikeve ser Fersende Beg, jina wî û diya wî ku çewa dane ber hev û ji hev re gotine. Kilam bi xwe ne ji devê yek kesî ye. Carna ji devê Asiyayê ye. Carna ji devê Besrayê hatiye gotin. Fersende bersiva wan dide lê Kerem bi xwe jî dikeve nava axaftinê û ew jî ya xwe dibêje. Ev temamî li hevanîna dengbêj e.

Bûyer: Bûyer car din bûyera ku li Îranê diqewime. Piştî şerê Şêx Seîd, bi piranî jî ji eşîra Heseniyan gelek kes bi jin û zarokên xwe ve derbasî Îranê dibin. Di nava kilamê de navên gelek kesan derbas dibe lê hene ku navê wan derbas nabin. Navên yê din di kilamên din de derbas bibin.

Mînak; Xalid Begê Hesenî yek ji wan e ku kurê wî li wir tê kuştin. Xalid Begê Hesenî bi xwe yek ji damezrênerên Komîta Îstîqlala Kurdistanê ye. Zor hevalek nêz yê Xalid Begê Cibrî ye. Kerem bi xwe jî damezrênerê vê komîteyê ye. Ev Komîta Îstîqlala Kurdistanê bi kurtayî bi navê ‘Azadî’ tê naskirin. Azadî di salên 1919 û 1920 ande hatiye damezrandin. Temamê rêxistinên wê demê yên Kurda di nav de cîh digrin: Rêxistina Kurdistan Tealiyê, Hêvî, Rêxistina Îctîmaiye ya Kurdistanê û hwd. Serokê wê Mîralay Xalid Begê Cibrî ye. Xalid Begê Cibrî fermanarê alayîya Siwarî ya Erzeromê ye. Di nava damezrênerê wê de Xalid Begê Hesenî, Hecî Mûsa Begê Xwêtî, Kor Huseyin Paşayê Heyderî, Yûsif Zîya Begê Bedlîsî, Îsmâil Heqê Şawêyz û gelek rewşenbîr, mezinên eşîran, şêxên Kurdan hene. Li her 8 bajarên Kurdistanê yên wê deme xwe birê xistine. Nawenda Azadiyê Erzerom e. Tevgera Şêx Seîdê Kal jî dewama vê rêxistinê ye. Ji berk u Şêx Seîd di sala 1924an de dibe endamê Azadî yê.⁷⁵

Navên ku di nava kilama "Axawo" de derbas dibin ev in:

1- Ferzende 2- Silêmanê Ahmed 3- Asiya 4- Besra 5- Elfesya 6- Keremê Qolaxasi

Ferzende: Ferzende yek ji şorişvanê bizava 1925 a ye. Yên ku ew dinasiyan gelek bi rêz behsa wî dikirin. Zilamek mêrxas û kesî di ser pozê xwe re ne didît. Dema derbasî Îranê dibin, li wir birîndar dibe. Ji Îranê, bi kom û kulfetê xwe ve derbasî Çiyayê Agiriyê dibe. Di şerê Agiriyê de, ji 4 lehengên sereke ye. Di payîza 1930 an de, bi Îhsan Nûrî Paşayê ku fermanarê Tevgera Agiriyê ye derbasî Îranê dibe. Dewleta Îranê wî dixin zîndanê. Di zîndanê de gelek tade û ezîyetê lê dikin. Dema derbasî Îranê dibin, gelek qelebalix in û dewleta Îranê rê nade wan. Bi Îraniyan re şer dikin. Di zîndanê de dimre. Cenazê wî ji aliyê Şêx Ewdilqadirê Tendûrekî de tê şûştin. Tê gotin ku çavên wî derxistinê lê li gor neviyê Şêx Ewdilqadir, Reşo Zilan ku min di 22 Hezîrana 2013 an de li Mêrdînê pê re hevdişînek çêkiribû, ev çavderxistin ne rast e. Di dema şûştina cenazê wî de eskerek di xwaze têkilî çavên wî bibe lê Şêx nahêle.⁷⁶

Silêmanê Ahmed: Bavê Ferzende bi xwe ye. Di şerê bi Eceman re tê kuştinê. Yek ji giregirê eşîra Hesenan e û ji bera Mala Emer e.

⁷⁵ Tahsîn Sever, “1925 Kürt Hareketinin Yapısı ve Hedefleri”, *Kovara Bîr*, Hêjmar 4, Diyarbekir, 19 Eylûl 2010.

⁷⁶ Hevpeyvîna min bi Reşo Zilan re, Mêrdîn, 22 Hezîran 2013.

Besra: Jina Ferzende ye. Lê ji mêrekî zêdetir bi cesaret e û tirs di dilê wê de tune ye. Piştî mirina Ferzende Beg vedigere welat û heya dereng jî dijî.

Asiya: Diya Ferzende ye.

Elfesya: Keça Ferzende ye. Ji aliyê dewleta Îraniyan de tê kuştin.

Keremê Qolaxasî: Li jorê di kilama li ser Kerem de jî me behsa wî kir ku ji eşîra Zirkanê jorîn e. Ji Erzeromê ji Qereyaziyê ye. Navê gundê wî Qisqaniyê ye. Di kilama li ser Fersende, di ya li ser Xalid Begê Hesenî, di ya li ser wî bi xwe de, her navê Kerem derbas dibe. Sedem jî ji nava eşîra Zirkiyan Kerem û Evdal di nava komên Hesenîyan de diçin Îranê. Ji xeyrî wî Şêx Elî Riza heye. Şêx Elî Riza kurê şêx Seîd ye mezin e.

Di mijara qewimandina vî şerê navborî de du tişt hene ku tên gotin. Yek ji wana ew e ku dema Kurd diçin derbasî axa Îranê dibin, fermandarê Ecem Emir Tuman ji wan dixwaze ku sîlihên xwe deynin. Lê Kurd razî nabin û şer dertê. Fikra din ev e ku bi xeletî sîlihek ji destê Kurdek diteqe û leşkerên Ecem gule dibarînin ser Kurdên penaber û şereke dijwar di nevbera wan de dertê. Her kîjan fikir rast be jî di encamê de şereke nexweş di navbera wan de peyda dibe.

Di kilamê de fikreka din dertê pêş ku ew jî fikra mezhebi ye. Desthilatdariya Îranê şî ye û Kurdên ku derbasî Îranê bû ne şafî ne. Di stranê de Asiyayê ji Besrayê re weha dibêje:

" Îro ji êvara Xwedê de tê girmîna otomatîka vî gawirî li ser vê boriyê."

Ecem e, beşîncî mezheb e, dîn û duşman e,

Gule barî li ser serê me de, fenanî taviyê."

"Di dinyayê de kî diye ku esîr têne gulebarankirin! Ecem e, beşinci mezhebe, dîn û duşman e." Ev hevoka hanê dide zanîn ku di navbera her du mezheban de dijîtiyek dîrokî heye. Beşinci mezheb weka ji oleka din tê pejirandin. Ger biratiya olî hebe çima weka taviyên di baranê gule bîn reşandin ser birayên misilman. Her wisa jî "girmîna otomatîka vî gawirî " di vateya ku Ecem ne misilmanin de tê bikaranînê. Di kilamên Serhedê de carna peyvên Tirkî jî hene. Weka beşinci mezheb.

Besra, di şer de nav bi Fersende dide. Ev kiryar di her demê de, di her şerê Kurdan de heye. " Bavê Elfesya, siwarê Eynzawir im, xwedanê biçûk çapiliyê me. " Şervan gelek caran bi navê keça xwe an kurê xwe nav di xwe didin. Çapilî jî sîliha dirêj e ku 5 fişek dikevin xezîna wê û guleyan yek e yek davêje. Gelek cureyên çapiliyan hene ku ew jî dibe markeyên wan.

"Digot Besrayê derî kulê, li qamê te ketê ". Ev di nava Kurdan de weka nifir tê hesab kirin û ku yek li meriv neyê rehmê an tiştê ji qeweta mirov zêdetir ji mirov bixwaze, jê re tê gotin. Ango kul bikeve derê te. Nexweşineka bê derman bikeve mala te. "Derî kulê" tê vê wateyê. Di vir de weka gazinde mirov dikare qebûl bike. Ne gotinên dijminane lê yên dostane ne ku mirov ji kesên nezî xwe dike.

Di hevoka " Ji êvar de, bi du gulên otomotîkan birîndar im." de tê zanîn ku Ferzende birîndar e û hew dikare şer bike.

Di berdewama kilamê de dengbêj diçe bingeha bûyerê:

" Ev a ne şerê Hesenan e, ne şerê Heyderan e, ne şerê du biran e

Ne şerê dozdeh bavê eşîran e. Hewşa kafirê Mîr Tuman e,

Ecem e bêşîncî mezhebe, bê dîn e bê îman e

Ji êvara Xwedê de li ser serê me hirmînên topan e,

Giregirên otomotîkan e, makînaliyan e

Di navbera me de birîn, tu deqe û tu muhlet û ne tu aman e."

Şerê ku qewimiye ne şerê eşîran, ne yên du birayan an yên Hesenan û Heyderan e. Eşîra Heyderan jî paşî wê bikevin nava Şerê Agiriyê lê di 1929 an de. Di navbera Heyderan û Hesenan de, di dîrokê de daîm şer derketiye û ji hev mêran kuştine. Her du eşîr ji hev netirsiyane. Kilama " Xêlido Li Girê Melezgirê" an ya bi navê " Nema " ku Kawis Axa dibêje naveroka wê, şerê her du eşîran e.⁷⁷

Ji ber ku şer, di hewşa Mîr Tuman de dibe, di vir de cîh jî hatiye binavkirin. Di mijara sîlihan de, di destê Kurdan de tiving hene lê di yên Ecem de makînelî hene û tev otomotîk in. Ev jî qiyaseka din e ya di nava kilamê de ye.

⁷⁷ Ji albuma "Lawik", Kawis Axa, weşanên Kom Mîzîk, İstanbul, 22. 09. 1999.

"Di navbera me de birîn tu deqe û tu muhlet û ne tu aman e

Li qarşî şerîeta Mihemed sekinîn, ji min re dixwînin meydan û ferman e.

Ca tu seyr bike li cenazê Silêmanê Ahmed, komê Hesenan li pêş çavên min e

Heyfa min nayê li kuştina şêran û mêran, bi Silêmanê Ahmed, bi konê Hesenan e

Heyfa min tê li wê heyfê, îro ji êvar de ji mila vekirin ritbe û nîşan û elametên Hemîdiyê."

Dengbêj şerê ku qewimiye bê navbir pêşkêşî guhdarvan dike. Dijmin ango Eceman weka dijminê ola Îslamê qebûl dike. Tevî ku cenazên Silêmanê Ahmed bavê Fersende û yê din li erdê ne jî, heyfa wî li jêkirina pile û nîşanên Hemîdiyê tê. Weka ku tê zanîn, nîşanên Hemîdiyê weka remza Kurdayetiyê û misilmantiyê dipejirîne dengbêj. Jêkirina wan pileyan ji Kurdan, ji xwe re kêmasiyek qebûl dikin û bo wan ji mirinê xerabtire. Ji ber ku Alayiyên Hemîdî tenê ji Kurdan hatibûn avakirin û beranberê pileyên dewletên din dihatin qebûl kirin. Mînak di nava wan de Xalid Begê Hesênî Albay e.

Di behsa Kerem de, bi şêweyeka din navê Kerem dikeve nava bûyerê û hevokên sazîkirin. Lê di vir de Kerem ne "berxê Mala Emer e". Ger xwe weka yek ji Hesenan qebûl kiribe, dibe lê di eslê xwe de mesele ne wusa ye.

"Ez Kerem bim, ez Kerem bim, ez berxê mala Emer bim,

Qaçaxê Romê, firarê dewletê bim

Kerem digot Ewdal; peyayê mala Mistefa Axa du tayê bi tenê bin

Hun ê bala xwe bidin li me û vê zilmê

Çardaxê Qeçara, Sihêrbaza, li Papaxgeniya

Ji me re dibêjin tivingê destên xwe deynin, ji êvar da teslîmî serhengê me bin."

Rast e Kerem firar û qaçaxê Romê ye. Lê mirov dibîne ku dengbêj, dijminên li hember xwe gelek biçûk dixîne. Qeçara, Sihêrbaza û Papaxgeniya dixê bin erdê û derdixê. Ji ber heman kêmetewe li ser axa Kurdistanê dijiyan û herkes wan baş nasdikir ku çi kesin. Dibêje ku çewa van kesên han çawa ji Kerem, Fersende û Xalid

Beg re dibêjin çeken xwe teslîmê serhengê me bikin. Mîr Tuman serhengê leşkerên Îranê ye.

"Biçûk û mezinên me rabûne, nerabûne mirîd û canfîdayê mala Şêx in."

Ji vê hevokê car din bûyera berê ya Şêx Seîd dertê holê. Canfîdayê mala Şêx yanî yên Şêx Seîd. Şêx Elî Riza bi xwe jî bi wan re di nava şer de ye. Koça wan ya Îranê jî, her dewama şerê Şêx Seîd e. Şêx Elî Rizayê kurê Şêx Seîd jî bi wan re ye.

Di nava kilamê de peyva "Gulîbirê" heye ku dixwazim rave bikim. Di nava jinên Kurdan de berê tu cara por nedihat jêkirin an kurkirin. Dema yek pora xwe kur bikira, ciyê wê jinê di nava xelkê de nedima. Lewra dema li jinek nifirek bê kirin, jê re dibêjin gulîbirê. Lî gelek hêrêmên dine "porkurê" an "porê te kur be" jî tê gotin. Lê divir de behsa keziyên jinê ye. Ne guliyeka din e.

Hevokeka din heye ku her tim di nava kilamên Kurdan de tê bikaranîn:

"Heyfa min nayê li kuştina Silêmanê Ahmed, komê Hesenan e,

Heyfa min tê li wê heyfê, ji êvar de dikim nakim tiliya min ya eşedê li min nagere."

Bi raya min tê wateya tiştê ku çû nema vedigere lê ya giring ya mayî ye. Tiştê ku diçe mirov nikare bo wê tiştê bike lê ya ku heye divê bo wê tiştê bê kirin. Ji ber ku Silêmanê Ahmed, bavê Fersende hatiye kuştin lê Fersende hêj sax e. Ji bo miriya tiştê nayê kirin lê bo Fersende ji ber ku sax e, divê jê re dermanek bê dîtin. Şiroveyek weha jî, ji her du rêzên kilamê dertê ku tiliya eşedê ya ku mirov pê tetika çapiliyê dikêşîne, pê bi dijmin re şer dike, nemaye ku tevgerek bike. Lewra heyfa Fersende lê tê. Birîna wî giran e û nikare heyfa bavê xwe hilde.

"Bawer bike qelebalix e, yeqîn şer e

Asiyayê digot Besrayê dayê

Dayê dergûşa milê te lawîn e.

Tu bi destê Elfesyayê bigre ji navê derkeve, here."

Di nava Kurdan de giringîyeka din jî dertê holê ku ew jî "dergûşa lawîn" e. Ango Kurd gelek giringiyê didin dergûşa kurî lê bo keça heman tişt nakin. Kur an law

bo Kurdan piştgirî ye, tivingeka wan pê zêde dibû. Ji bo kirina karê malê zilamek li wan zêde dibû. Ji bo nesla bavê bide dewam kirin giring bû. Gelek sedem hene ku dergûşa lawîn bo wan giring bûye. Tevî ku ewqas kur ji bo Kurdan giringe jî, dema mirov li bersivê dinêre:

" Got; de dayê ji te re ne eybe tu ji min re dibêjî gotinên were

Bila dergûşa milê min li dora lingê eşîra mala Emer,

Her du peyayê Mala Mistefa Axa tevbigere."

Dayîkek dikare kurê xwe bike qurbana şerefa eşîra xwe û xwe ji meydana şer nade alî. Di şeran de gelek caran tê dîtîn ku zilam reviyane lê jin zû bi zû nereviyane. Ev taybetmendiyeka jina Kurd e. Lewraye di ristên kilamê de jina Fersende kurê xwe dike qurbana bavikê Mala Emer û her du xortên Mala Mistefa Axa, Kerem û Evdal.

Di nava Kurdan de hevalînî gelek giring e. Ev dibe ku di navbera du eşîran de be jî. Dibêjin " herkesek bi refê xwe re ". Malbata mala Mistefa Axayê Zirkî û Hesenan di dîrokê de tim bi hev re tevgeriyane. Lewra li Îranê jî qedera wan bi hev re dibe yek. Di du rêzên jêr yên nava kilamê de giringiya dostaniya wan dixe ser ziman û weha dibêje:

" Kerem digote Evdal her du peyayê mala Mistefa Axa du tayê bi tenê bin

Berxê mala Evdalê Mistê bin, bi malekî mînana mala Emerê Gulîxwir re heval bin."

Li Îranê gelek Kurd hatin kuştin lê di berdewamiya jiyana Fersende Beg de, Fersende wê gelek cara bi Îraniyan re şer bike û heyfa bavê xwe û Kurdan ji Îraniyan hilde. Lewra ku Îranî, ji cenazeyê Fersende jî ditirsiyan û jê hiznedikirin.

3.4. KILAMA LI SER XALID BEGÊ CİBRÎ

Li gor dengbêj Xeniyê Qereyaziyê, ev kilam ya Mistefayê Xelê Heyran e. Lê ji bo ku Reso zahftir vê kilamê gotiye wek ya Reso tê zanîn. Li ser çêkirina kilamê jî bûyerek hatiye serê Mistefa. Xeniyê Qereyaziyê li ser mijarê weha axiff:

"Li cem me Celalê Qolaxasî hebû. Ji kilaman gelek hezdikir. Ji xwe re kilaman digot. Rojek vê kilama li ser Xalid Begê Cibrî dibêje. Giliyê wî dikin. Femandarek leşkerî îfadeya wî digre. Celal jî dibêje ku ew kilamê ji Mistefayê Xelê Heyran fêr bûye. Li ser îfada wî Mistefa digrin. Dema ji Mistefa dipirsin, Mistefa rastiya mijarê dibêje.

Heta ji fermanar re dibêje ger tu bixwazî niha dikarim li ser te jî kilamek çêbikim û dest bi kilamê dike û wesfê wî dide. Fermanar yekî baş bûye û Mistefa berdide.⁷⁸

Li gor van agahiyan rast e ku dibe ku Mistefa ev kilama hanê çêkiribe. Ji ber ku kilamek belave ye û di nava xelkê de bêhtir tê guhdarkirin, min ew xiste nava kilamên ku Reso gotiye.

Resoyê dengbêj xwediyê gelek kilamên siyasî ye. Di gelek civatan de rûniştîye û ji wan fêrî bûyerên di nava dîroka Kurdan de bû ye. Di nava civatên ku Reso di wan de rûniştîye, civatên axa, bega, şêxa û mezinên eşîrên Kurdan hene. Li gor pêzanîna min gelek cara di dîwana kurên Xalid Begê Cibrî, di dîwana Mehmûd Beg û Îbrahîm Beg de rûniştîye. Malên zarokên Xalid Begê Cibrî li qeza Gumgumê (Varto) bûn. Her du kurên wî jî ji dengbêjan hezdikirin. Neviyê birayê Xalid Begê Cibrî Tahsin Sever di hevpeyvîna bi min re de weha got:

"Di sala 1970 an de, ez li mala Îbrahîm Begê Xalid Beg de dimam û diçûm dibistanê. Min Resoyê Gopala li wir dît. Îbrahîm û Mehmûd Beg bira bûn. Ez salek li mala Îbrahîm Beg mam. Rojek Reso hat dîwana Îbrahîm Beg. Xwest kilama li ser Xalid Beg bêje lê Îbrahîm Beg îzîn neda ku bêje. Belkî bi bavê xwe xemgîn dibû, baş nayê bîra min. Lê dema Reso kilamên din digot pê gelek kêfxweş dibû. Carna Şakiro û dengbêjên din jî dihatin dîwanê."⁷⁹

Kilama ku Reso li ser Xalid Beg gotiye kilameka gelek dirêje. Di nava kilama wî de gelek motîf hene. Berya behsa wan bikim dixwazim bêjim ku lehengên di nava kilamê de gelek in. Dema ku mirov bi kilamên dinyayê re qiyas dike, ev dertê holê ku kilam ne weka yên gelên din in. Lehengên di nava kilamê de li gor balladên dinyayê zahfin. Berya şiroveya li ser kilamê ger qehremanên di nava kilamê de bi nav bêjim; Xalid Begê Cibrî, Mistefa Kemal, Îlyas Xoce (Îlyas Samiyê Mûşî) , Mehmûd, Nafiya û Bavê Şêx Elî Riza (Şêx Seîdê Pîran) hene. Lê ev kesên ku navên wan di nava kilamê de derbas dibin kî ne, divê mirov behsa wan bike. Di her kilamek Kurdan de dema navek derbas bû be û kes nizanî ev kes kî ye, di dilê mirov de dibe derd û kul. Bi sedema ku ev kilam û bûyera di nava kilamê de ku tê behs kirin gelek giring e, ez ê danasîna navên di nava kilamê de biberfirehî binîvsînim.

1- **Xalid Begê Cibrî:** Xalid Begê Cibrî di sala 1882 an de li qeza Gimgimê ya ser bajarê Mûşê hatiye dinyayê. Bavê wî mezinê eşîra Cibran bû ye. Eşîra Cibra li dora Mûşê û Bîngolê nişteci ye. Cîranê eşîra Hesenan, Lolan , Xormekiyan û gelek eşîrên din

⁷⁸ Ji hevpeyvîna min ya bi Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê re, İstanbul, 17. 07. 2013.

⁷⁹ Ji albuma "Lawik", Kawis Axa, weşanên Kom Mîzîk, İstanbul, 22. 09. 1999.

in. Xalid Begê Cibrî di Eşîrê Mektebiya ku Siltan Ewdilhemîd danîbû de dixwîne. Xalid Beg ji Mistefa Kemal yek salekî biçûktir e. Di Dibistana Herbiyê ya Yildizê de bi hev re xwendine. Hesab bikin Xalid di sala 1902 an de mekteba xwe xelas dike lê Mistefa Kemal di 1905 an de xelas dike. Ev ferqa navbeyna her duwa ye. Bi pileya Yawer yüzbaşı mektebê xelas dike. Di dema ku şerê dinyayê yê yekem di 1914 an de dest pê dike, Xalid Beg li eniya Sûriyê û Filîstînê di şer de ye. Mistefa Kemal jî li wir şer dike. Ji dewleta Osmanîyan fermanek ji Xalid Beg re diçe da were ser serê Alayên Eşîra Cibran wek wezîfedarê dewletê bibe fermanar. Xalid Beg dev ji cepheya Filîstînê bi emrê dewletê berdide û tê Helebê. Mixabin Mistefa Kemal berya wî hatiye Helebê bê ku dewletê fermanek dabe wî.

Xalid Beg jê gelek aciz dibe. Di berê de jî Xalid Beg di dema xwendina xwe de ji Kemal heznake ji bo ku jiyana wî ya kêfê gelek bê ser û ber e. Xalid Beg bi xwe oldar e lê ne însanek req e di warê ola Îslamê de. Xalid Beg tê Mûşê û bi alayên eşîra xwe re diçe cepha Erzeromê ya Pasînê. Li dij dagirkeriya Rûsan şer dike. Heya sala 1917 an ku Şorişa Oktobirê di nava Rûsan de çêdibe.⁸⁰

Piştî şerê cihanê yê yekem xelas dibe, Xalid Beg dibe fermanarê Alaya Siwarî ya Erzeromê. Milletê Kurd, di wê demê de li çarenûsa xwe digere. Mutarekeya Mondrosê îmza bûye û Dewleta Osmanîyan li gor peymanê nemaye. Ne tenê Kurd her weha Tirk jî li çareya serê xwe dinêrin. Xalid Beg bi gelek hevalên xwe re rêxistina Azadî ava dikin. Dibe serokê wê. Azadî navê Komîta Îstîqlala Kurdistanê ye, ya bi kurtî. Di nava Azadiyê de Kurdistan Tealî Cemiyetî, Hêvî û Kurdistan Teşkilatî Îctima'îye hene. Di wê demê de li seranserê Kurdistanê rêxistina xwe ava dikin. Di nav rêxistinê de sê perçên Kurdistanê hene.

Xalid Beg di dema Kongra Erzeroma ku Kemal çêdike de, tevî kongreyê nabe. Komek ji Kurdên Mûşê dema tên Erzeromê bo kongreyê, berê serdana Xalid Beg dikin lê Xalid Beg naxwaze ew tevî kongreyê bibin. Ev bala Mistefa Kemal dikşîne. Xalid Beg ji bo rizgariya Kurdan berê ji Bolşevîkan re nameyek şandiye lê Stalin û bi îdareya xwe ve, nameyê dane Mistefa Kemal. Ev jî sedemeke ku Kemal dijminahiya Xalid dike. Li gor raporên Îngîlîzan jî ku di sala 1924ande, dane Mistefa Kemal û gotine Xalid Beg bo serxwebûna Kurdistanê dixebite. Ev tev dibin sebeb ku di pêşde wê Mistefa Kemal birayara îdama Xalid Begê bide.⁸¹

⁸⁰ Ji hevpeyvîna min bi Tahsîn Sever re, Diyarbekir, 13. 09. 2008.

⁸¹ Ji hevpeyvîna min bi Tahsîn Sever re, Diyarbekir, 13. 09. 2008.

Xalid Beg, di qolordiya Erzeromê de herî dawî serokê komîsyona kirîn û firotanê ye. Femandarên wî, ji Xalid Beg re dibêjin ku li Sariqamişê, di nava eskeriyê de ruşwet hatiye xwarin. Divê tu herî teftêşa wan bikî ka mesele çiyê. Di dema ku Xalid Beg diçe Sariqamişê, destê wî di rê de kelepçe dikin û berê wî didin Zîndana Bedlîsê. Di îfadeyên xwe de tu tawîzek nade dadgeha leşkerî. Çîrokeka wan ya dirêj heye. Di 14 an 15 ê Nîsana 1925 ande, bi hevalên xwe Yûsûf Ziya ku wekîl milletê Bedlîsê ye û berpîrsê pêwendiyên navbera Azadiyê ye, bi du zabitên Kurdên din ve, bi biryara gulebarankirinê tînin kuştin. Ev tarîx tê roja girtina Şêx Seîd bi xwe jî.⁸²

2-Kemal: Mistefa Kemal Atatürk e. Damezrênerê Dewleta Tirkîyê ye. Li jorê jî me behs kir bê pêwendiya wî bi Xalid Begê Cibrî re çî ye. Di pêş de wê firehtir behsa pêwendiyên wan bînin kirin.

3- İlyas Xoce: Navê wî İlyas Samî ye. Ji bajarê Mûşê ye. İnsanek alim e û di nava xelkê Mûşê de gelek tê hezkirin. Li gor Tahsin Sever dibêje ew berê endamê Cemiyeta Kurdistan Tealiyê bûye. Xalid Beg gelek qedrê wî digirt. Li jorê me behs kir ku di dema serdana komêk însanên Mûşê bo Erzeromê ku diçin dîtina Mistefa Kemal, berê diçin dîtina Xalid Begê. Di nava wan de İlyas Xoce jî heye.

"Di roja 02. 10. 1924 an de li Erzeromê, li qeza Pasînê erdhejek çêdibe û Mistefa Kemal tê serdana xelkê wê derê. Êvarê Mistefa Kemal Xalid Beg dawetê şîvê dîke. Şîv bi protokole. Xalid Beg bi pîsmamê xwe bi binbaşî Reşîd Beg re diçe. Nabe ku binbaşîyek bikeve protokolê lê ji Xalid Beg re dengê xwe nakin. Reşîd Beg ji wan cuda rûdinê. Ji Xalid Beg re kursiyek di navbera Femandarê Qolordiyê û Mistefa Kemal de veqetandine. Berya xwarin dest pêbike Femandarê qolordûyê bi Xalid Beg re diaxife. Xalid Beg ji bo teqawid bibe serdanê kiriye. Femandar jê re dibêje tu amadekariyê dikî da li me îxanetê bikî? Xalid bersiva wî dide: Ger ew kesên ku ji derve de hatine xwediyê dewletê bin, mafek me Kurda jî, mafek me yê wisa heye. Di pey de qet axaftin nabe. Mistefa Kemal qet dengê xwe nake. Xalid Beg xwarin naxwe û tenê cixareyek dikêşîne. Ji masa şîvê radibe."⁸³

Li ser vê bûyerê paşî Mistefa Kemal İlyas Samî Xoceyê Mûşî dişîne bajarê Erzeromê cem Xalid Begê. Mistefa Kemal dizane ku Xalid Beg rêxistina xwe bi hevalên xwe re çêkiriye û bo Kurdistaneka serbixwe dixebite. Dema ku Mistefa Kemal dibe desthilatdar İlyas Xoce jî dibe terefdarê Kemal. İlyas Xoce tê li otêla bi navê Fûadiye ji xwe re cîh vediqetîne û ji Xalid Beg re notek dişîne da were serdana wî. Lê Xalid Beg naçe. Jê re notek rewane dîke û tê de dibêje: "Ne hewce ye em hev bibînin."

⁸² Ji hevpeyvîna min bi Tahsîn Sever re, Diyarbekir, 13. 09. 2008.

⁸³ Ji hevpeyvîna min bi Tahsin Sever re, Diyarbekir, 15. 07. 2013.

"Li ser vê bersiva Xalid Beg Îlyas Xoce gelek hêrs dibe. Ew bi xwe diçe mala Xalid Begê Cibrî. Xalid Beg li hember wî gelek sar tevdigere. Ji Xalid Beg re dibêje ku Gazî Mistefa Kemal gotiye Xalid Beg çî bixwaze em amade ne ku bidinê. Bes dev ji doza Kurdîniyê berde."⁸⁴

Piştî vê hevdişîna bi Xalid Beg re Îlyas Xoce çî rapor dide Mistefa Kemal kes nizane. Lê piştî ku Xalid Beg berdest dikin û dibin zîndana bajarê Bedlisê, Mistefa Kemal careka din bi riya mala Şêxên Oxîn re, ji Xalid Beg re heman gotinan dişîne zîndanê. Ji Xalid Beg re dibêjin ku Mistefa Kemal gotiye çiyê min ne tê de, Xalid çî bixwaze ez amademe ku bidim wî. Xalid Beg gelek bi tundî bersivek dide wan. Dema bersiv ji mala şêxên Oxîn re diçe, şêx dibê mala minê. Welleh Xalid Beg gelek heyf bû. Ev jî tê wateya ku wê di demên pêş de Xalid Beg îdam bikin.

Ez car din ji gotinên Tahsin Sever ku neviyê Ahmed Begê birayê Xalid Beg e neqil bikim:

"Piştî hereketa Şêx Seîd bapîrê min bi gelek kesan re çû bû Sûriyê. Di sala 1930 an de, bi Elî Rizayê kurê Şêx Seîd re wan dibin zîndana Ankarayê. Piştî ji zîndanê dertên diçin serdana Îlyas Xoce. Ew, du dewre bû bû wekîl millet di meclîsa yekem û ya duyem de, di ya Ankarayê de. Kalê min bi Îlyas Xoce re diaxife. Îlyas dibêje ew tiştên ku dewletê aniye serê we gelek kême."⁸⁵

Eşîra Cibran ji destê dewletê gelek kişandiye. Piştî bizava Azadiyê têk diçe, gelek kes ji eşîra Cibran tevî Ahmed Begê birayê Xalid Begê, derbasî Binxetê (Sûriyê) dibin. Piştî efûya 1928 an, di sala 1930 an de, tîne welatê xwe û tîne girtin. (⁸⁶)

4- **Mehmûd:** Navekî ku di nava kilamê de derbas dibe Mehmûd e. Mehmûd bi xwe kurê Xalid Begê ye. Piştî Xalid Beg, ew diwana bavê xwe dide dewam kirin.

5- **Nafiya Çerkez:** Yek ji navên ku di nava kilamê de derbas dibe jî Nafiye ye. Lê ew bi xwe ne Çerkez e. Hêwiya wê Çerkez e. Jina Xalid Begê Cibriye. Nafiya Xanim ji mala Bahaddîn Axayê Xinûsê ye. ⁸⁷

6- **Bavê Şêx Elî Riza:** Şêx Elî Riza kurê Şêx Seîd e. Şêx Seîdê Palo, Pîran an Xinûsê tev heman kes e. Şêx Seîdê Şêx Elî jî jê re tê gotin. Ew yek ji şêxên nexşebendiya bûye. Herkes wan weka Zaza dizane lê ew bi xwe Kurmancin. Hemû malbat bi Zazakî dizane. Di nava Kurdên berê de û îro jî rêzek heye ku kes bi navê kurên xwe tîne navandinê. Lewra ye Resoyê dengbêj dibêje bavê Şêx Elî Riza. ⁸⁸

⁸⁴ Ji hevpeyvîna min bi Tahsin Sever re, Diyarbekir, 15. 07. 2013.

⁸⁵ Ji hevpeyvîna min bi Tahsin Sever re, Diyarbekir, 15. 07. 2013.

⁸⁶ Ji hevpeyvîna min bi Tahsin Sever re, Diyarbekir, 15. 07. 2013.

⁸⁷ Ji hevpeyvîna min bi Tahsin Sever re, Diyarbekir, 15. 07. 2013.

⁸⁸ Hevpeyvîna min ya bi neviyê Şêx Seîd bi Mahmut Aygören re, Diyarbekir, 21. 09. 2010.

Şêx Seîd kurê xaltiya Xalid Beg e. Ji rexekek din de zavayê Xalid Beg e. Xweha Xalid Beg li cem Şêx Seîd e. Ev mesele di nava xelkê de gelek kêmtê zanîn. Xalid Beg di sala 1924 an de, bi pêwendiyeka dûr û dirêj bi Şêx Seîd dide qebûl kirin da bibe endamê Komîteya Îstîqlala Kurdistanê. Di dema ku Xalid Beg li bajarê Bedlîsê girtiye, hereketa Şêx Seîd dest pê dike. Di demeke kurt de, gelek bajarên Kurdistanê dixin destê xwe. Lê hevlingek Şêx Seîd heye ku di nava hereketê de xayîn e. Hem zavayê Xalid Beg e hem jî kurapê Xalid Beg e. Pileya wî bînbaşi ye. Navê wî Binbaşi Qasim e.

Binbaşi Qasim bi dizî raporê dide dewletê. Di nava kilamê de navê wî derbas nabe. Şêx Seîd û eşîra Cibran gelek cara jî Xalid Beg re xeber dişînin zîndana Bedlîsê. Dibêjin ku ger Xalid Beg bixwaze em ê wî ji zîndanê xelas bikin. Lê Xalid Beg dibêje nabe. Di roja ku Şêx Seîd bi hevalên xwe re li ser pira Vartoyê, li ser Pira Evdîrehman Paşa tê girtin, di heman rojê de an jî di rojek berya wê de Xalid Beg hatiye îdam kirin. Gotinek din jî heye ku tê gotin. Min bi xwe ji devê neviyê Şêx Şerîfê fermanarê cepha Xêrpûtê bihîst ku digot Xalid Begê Cibrî, mezinê Nexşebendiyên heremê ye. Ev heya çî astê rast e nayê zanîn. Lê rast e ku Xalid Beg gelek oldarek baş bûye.⁸⁹

Agahiyên berfireh di derbarê kesên ku navên wan di nava kilama Resoyê dengbêj de derbas dibin ev kesin ku bi berfirehî min behsa wan kir. Ger em herin nava gotinên di kilamê de, em ê bibînin bê ka Reso heya çî astê ristan an rohiyê xistiye ser bûyerê em ê bibînin.

Gotin û tevna kilamê:

Di serê kilamê de dibêje:

"Min dît Kemal digot; Xalid Beg ca were
Mala te ava bûyo bidim te mal û perane wiyo, wiyo
Ez ê te bikim reîsê alaya Kurdan e
Were ji bo meslek arkadaşiya min qebûl bike
Qanûna Bolşewîk, zagona Eleman e
Ax de mîrê min hayê, mîrê min hayê.."

Weka li jorê jî di behsa qehremanên di kilamê de hat gotin, Mistefa Kemal û Xalid Beg bi hev re di heman mektebê de xwendine. Ji xwe Xalid Beg berê serokê Alaya Siwarî ya Erzeromê bû ye. Paşî wî ji wê wezîfê digrin û didin wezîfeyeka pasîf. Mistefa Kemal ji Xalid re du caran teklîf dike da dev ji doza Kurdan berde û di şûna wê de çî bixwaze wê Kemal bide wî. Lê Xalid qebûl nake. Lê tiştê balkêş ew e ku behsa "qanûna bolşewîk û "Zagona Elemana" derbas dibe. Mistefa Kemal bi Bolşewîkan re di

⁸⁹ Hevpeyvîna min bi neviyê Şêx Şerîf bi Ferhad Aydın re, Diyarbekir, 05. 05. 2012.

nava pêwendiyên de ye. Hem dostê Lenîn e û piştî ku Lenin di sala 1923 an de dimre bi Stalin re dibe dost. Di berya Hereketa Şêx Seîd de Xalid Beg nameyek dişîne bo Dewleta Sowyetê û ji wan daxwaza alikariya navneteweyî dike. Lê Sowyet nameya Xalid Begê ku bi navê Serokê Komîta Îstîqlala Kurdistanê dişîne ji Sowyetê re, didin Mistefa Kemal. Mistefa Kemal ji wir bi Xalid Beg dihise ku rêxistinek di nava Kurdan de çêkiriye.

"Zagona Eleman" zahf bala mirov dikşîne ku ev çend sale em wateya zagonê dizanin. Lê Reso di wê demê de çewa zagona Elmanan dizane. Bingeha dewleta Tirkîyê Almanan daniye. Alman û Îttîhad û Terraqî bi hev re tevgeriyane. Her du di qada navneteweyî de yek in. Ev rêzên han gelek bala mirov dikşîne. Di kilamê de Xalid Beg li dij van her du nîzaman jî dertê.

Di stranê de li ser Îlyas Xoce jî rexneyek gelek delal heye ku dibêje tu çawa dev ji ola xwe berdidî û dibî reftarê Bolşevîk û Elmanan:

"Qebûl nakim qanûna Bolşevîk, zagona Eleman e wî wî
Xoce Îlyasê deşta Mûşê hey mala te mîrat bûyo
Ne tu alimî, tu çî zû welgeriyayî, tu dibêjî were vê qanûnê qebûl bike
De tu were rêkî bibîne ji bona emirkirina vê kitêba hane
Lê mala te mîrat bûyo hustiyê min bi şer'a Mihemed zirave
Şer'a Mihemed li dû min tê şer'eke pir girane
Mîrê min wayê, mîrê min wayê....."

Reso li hember van her du nîzaman şerî'etê derdixe pêş û çawayîya zivirîna ji şerî'eta Hz. Mihemed ji aliyê Îlyas Xoce de, bi ecêb dibîne. Herkes li ber ola îslamê ser datîne lê Resoyê Gopala Îlyas Xocê deşta Mûşê weka ji dîn derketiye dipejirîne.

"Wexta Xalid Begê Cibrî, bavê Şêx Elî Riza kalê nûranî dibin Bedlîsê berbendayê." Li vir tenê xeletiyek di gotina nava kilamê de hatiye kirin. Şêx Seîd nabin bajarê Bedlîsê. Ew rast tînin bajarê Amedê. Lê berê di nava xelkê de gotinek wisa hebû ku wan birine hebsa Bedlîsê. Paşî hat famkirin ku mesele ne wusa ye.

Di nava xelkê Tirk de daîma ol û rîberdan weka tiştê ecêb dihat dîtin. Bi taybetî piştî damezrandina Komara Tirkîyê ya 1923yan. Kesek ji tirsê dewletê newêribû egalek an kumek bida serê xwe. Eskerên Tirk, wan diçirandin û ji serê xelkê dikirin. Dema yekî bi kum, rîh an şalwar bidîtina tinaz û henekên xwe bi wan dikirin. Lewra di kilamê de behsa tîq e tîq a Tirkan dike:

"Tîq e tîq a wan bû bi hev dikeniyên digot rabin bala xwe bidnê
Ev kalê han jî şêxê Kurda ye

Murşîdo ez nemînim li dinyayê ji çira.."

Kilam, heya vê derê mirov nizane gelo Reso ji devê kî daye lê diyare ji devê xwe bi xwe dibêje. Paşî di kilamê de ku dibêje 'Ez a kora her du çavên min rijiyayî ', mirov dizane ku ji devê jineka Kurd hatiye gotin. Ango Reso weka ku jineka Kurd kilamê gotiye çêkiriye. Di hinek kilaman de, ev yeka han, tenê di nava hevokan de diyar dibe û di hinekan de bi tamamî aşkera ye ku ji devê kî an kê ye.

Beşeka kilamê jî weha dewam dike ku bi tamamî li gor xeyal û tesewira dengbêj hatiye ristin:

" Lo Lo mîro ez hatim Erzeroma şewitî lehzeke sekinîm
Li derê qesr û qonaxa Xalid Begê Cibrî min seyr fikir li wê serayê
Ez a kora her du çavên min rijiyayê, min ji êvar de çiqas guhên xwe dagirt
Min dît dengê Xalid Begê Cibrî, kewê ribat, seda Yasîn û Qur'anê
Mîna carê, îdî tê de wî yû, wî yû nayê.
Min nizanibû bi gotinên çar mektebliya mesela vê siyasetê
Berê bavê Mehmûd bi bavê Şêx Elî Riza re dane bajarê Bedlisa şewitî
Şandin ber irfiyayê, mîrêm wayê, mîrêm wayê. "

Dengbêj di beşeka kilamê de xeyal dike ku diçe temaşa qesra ku Xalid Beg lê dima ya li bajarê Erzeromê dike. Ji ber ku Xalid Beg her sibe Qur'anê dixwend, dengbêj dibêje nema dengê Qur'anê ji mala Xalid Beg tê. Yanî xanî vala ye. Di nava ristan de "Îrfiyayê" derbas dibe. Ew jî tê wateya ku îdareya Orfî. Ya bi kêfa dewletê. Di wê demê de jî bi qanûnan rewşa awarte beyan dikirin weka ku di salên 1980 ande çewa li Kurdistanê hebû.

Di nava kilamên Kurdî de gotina "Kewê Ribat" an Rebat gelek belave ye. " Kewê ribat" ew kew e ku her daîma ji xeyrî xwe re meydan dixwîne. Her tim qeb e qeba wî ye. Bê minnet e, bê tawîz e, mêr e, mêrxas e. Ribat kewê nêr e. Remza mêraniyê û cengaweriyê ye. Dengê kewê ribat jî gelek xweş e.

3.5. KILAMA LI SER DENGBÊJ FERZÊ (FERZÊ BAVÊ MIHEMED SALIH)

Dengbêj Ferzê, di dengbêjiya Serhedê û seranserê Kurdistanê de gelek zana û têgihiştî bû ye. Gelek kilaman çêkiriye. Hem Ferzê dewama Evdalê Zeynê ye. Di şopa Evdalê Zeynê de, kilamên wî gotiye û hatine heya roja me. Li ser bingeha tevna Evdal jî bi xwe gelek kilaman gotiye. Reso ji Ferzê fêrî gelek kilaman bûye ji bo ku Ferzê di dengbêjiya xwe de ji Reso kevintir bû û bi temenê xwe jî ji Reso gelek mezintir bû.

Mixabin Ferzê, di dawetekê de bi xeletî guleya demançê lê dikeve û pir dewam nake jiyana xwe ji dest dide. Ferzê ji gundê Xelê ye ku dikeve ser qeza Melezgirê. Dawetek li gundê Kevir çêdibe. Ferzê jî hatiye vexwendin bo daweta gundê Kevir. Li ser ku guleya demançê ku bi xeletî lê ketiye de, dengbêj Xeniyê Qereyaziyê ku xwedî arşîveka baş ya kilamên dengbêja ye, dibêje:

"Min ew merivê ku gule ji destê wî dertê û li Ferzê dikeve dît. Pê re hevpeyvînek çêkir. Digot ez pir ber Ferzê ketim. Akrabayê me tê. Nizanibû ku guleya dawiyê di sîlihê de maye. Dihat cem me zozana. Navê wî Zekî Mêralî bû. Ji gundê Moriyân . Ev bûyer di sala 1951 an de çêdibe. Dema ku Ferzê birîndar e, li ser xwe kilamê gotiye. Min bi dermankiroxê wî re xeber da. Bi Mihemedê Elo re. Mihemed balgîv dide ber piştê wî û Ferzê kilam dibêje. Gotiye îro dengê min dernayê. Reso kilamê dibihîze û fireh dike. Dema behsa Ferzê dibû Reso digiriya."⁹⁰

Ji bo ku Ferzê dizanibû Zekiyê Mêralî ne bi zanîn lê daye, tu cara li derê dewletê ne Ferzê û ne pismamên wî giliyên Zekî nakin. Zekî naxin zîndanê. Ev wesiyeta Ferzê bi xwe bû ye.

Reso û Ferzê her du hevalên hev yên gelek nêz bûne. Kilama ku Reso li ser Ferzê gotiyê navê kilamê " Ferzê Bavê Mihemed Salih " e. Di nava kilamê de tevneka gelek xweş heye.

Kesayetiyên girîng ên di nava kilamê de:

Bavê Mihemed Salih: Ew Ferzê bi xwe ye. Bi navê bavê kurê xwe tê navandinê.

Silheddîn: Biraziyê Ferzê ye.

Mihemedê Elîkê: Apê dengbêj Ferzê ye.

Zekiyê Mêralî: Ji gundê Moriyân e. Ew kese ku bi xeletî ji demançeya wî gule dertê û li Ferzê dikeve.

Gulnaz: Jina dengbêj Ferzê ye

Beyaz: Jina apê Ferzê ye. Jina Mihemedê Elîkê ye.

90 Ji hevpeyvîna min bi dengbêj Xeniyê Qereyaziyê re, Îstanbul, 11. 07. 2013.

Şêx Evdilayê Hecî Heyder: Ji şêxên Mûşê ye. Ferzê mirîdê wî dihat hesabê. Lê şêxîtiyek malbata wan ya nerm heye.

Tevna Kilamê:

Ji kilamê diyar e ku ji wext pâyîz e. Ferzê ne bi serê xwe, bi biraziyê xwe Silhedîn û pismamê xwe Mihemedê Elîkê re diçe dawetê. Lê bi siwariya hespa diçin dawetê. Ev taybetmendiyeke dawetên berê bû. Li kujerê Ferzê, di kilamê de nifir heye ku dibêje "Zekiyê Mêralî xêrê bike wayê nebîne". "Wayê nebîne" tê vateya ku qet xêrê ji xwe nebîne. Ev gotineka herema Serhedê ye. Di ciyeka din yê kilamê de nifirek din heye ku dibêje "Hazir û guhdarê gundê Kevir xêrê nebînin dawetek siwar kirin..." de ne tenê nifir li kujer lê li temamî amadevanên dawetê tê kirin.

Gotinên tevna stranê gelek safî ne ku dibêje "Mîrata guleyê çar tiliya cegeza Bavê Mihemed Salih xelas kir", tê vateya ku birîna Ferzê zahf xedar e. Di beşeka din ya kilamê de dibêje; "Birîna wî kûr û xedar e, doktor û sertebîb rakirin ji Kela Melezigirê, dikin nakin nagire fitîlê, naxwe kewê". Berê fitîl dixistin birîna da ku xwîna wê raweste û kêr negire. Kewandina birînan di zimanê Kurmancî de gotineka taybet ya bi serê xwe ye.

Di paşiya her beşek stranê de hevoka "Melûl, melûl siwaro..." derbas dibe. Ev gotina di vir de tê wateya ku Ferzê bi her awayî melûl bûye û gunehê mirov pê tê.

Piştî benda yekê ya kilamê, kilam ji devê Gulnazê bo Beyazê dewam dike û bêjerê kilamê diguhire. Danasîneka biçûk bo gundê Kevir tê kirin ku dibêje "Bi gundê Kevir ketin li zinêr e" de rastiya ciyê gundê Kevir jî ew e. Di bendek din yê kilamê de, gundê Kevir weka "hêlîna kewê" dide nasîn. Di dema min ji xelkê heremê van pirsan kir, min dît ku hemû rast in. Bûk ji navbera gundê Azo û Kara Sipî yê hatiye barkirin bo gundê Kevirê. Kara Sipî ji ber ku xwêya sipî ji wir dertê, bi wî awayî hatiye navandin.

Şhibandina dengbêj Ferzê di hevoka "Şahê dengbêja dixwûne mîna şalûr û bilbil, kewê gozelê nêr e" de bi wan dengên xweş yê heywanan, dide zanîn ku dengê Ferzê gelek xweş bûye.

Di tevnê de behsa cureya guleya demançê dike ku jê re dibêje 'manhêr'. Ferzê bi guleya Manhêr birîndar dibe.

Ji hevoka "Bavê Mihemed Salih, şahê dengbêja sofiyê Şêx Evdillayê Hecî Heyder" tê famkirin ku Ferzê mirîdê mala Şêv Evdila ye jî. Ji şêxên Melezgirê ye. Di Serhedê de, şêxîti û mirîdatî gelek xwurt e lê mirîd ne wisa serberdayî ne.

Di dawetê de birîndariya Ferzê tu tamedî di dawetê de nahêle û hemû xelkên der û dorê ku hatine dawetê sar mane û nizanin çî bikin. Ev yeka ha zor normal e ku kêfa herkesên li dawetê nemîne û xemgîn bibin. Di kilamê de bi "Xerab kiriye rewşa her çar gundê dora Heftreng e" yê hatiye ser ziman. Heftreng çemek ji milê çemê Mûradê ye ku gelek gund li dora wî çemî hene. Lê Reso tenê behsa çar gundan dike. Belkî ew jî ji bo lihevanîna weznê ye. Lê çemê Heftreng di gundê Ferzê de diçe û derbas dibe.

Di dawîya stranê de hevokek din hatiye sazîkirin ku dibêje "Ez dikim nakim Silhedînê birazî nade min kulmek ava sar e." de behsa Silhedînê biraziyê xwe dike ku avê nade Ferzê. Her kesên ku birîndar dibin dilê wan diçe avê. Daîma têhnî ne. Lê ne doktor ne jî kesek din avê nade birîndaran ji bo ku bi wê avê birîndar gelek caran dimrin. Ev jî gazîneka Ferzê ye di kilama ji devê Resoyê Gopalan de.

Di eslê xwe de ev strana li ser Ferzê straneka şînî ye, ya girîniye.

3.6. KILAMA LI SER XALID BEGÊ HESENÎ

Ev kilam ji aliyê Resoyê dengbêj de hatiye gotin. Di nava dengbêjan de kesên ku li ser Xalid Begê Hesenî kilam gotine gelek kêmin. Kilama li ser Xalid Begê Hesenî her ji bakûrê Kurdistanê ji nava qewimandinên şerê 1925 an dest pêdike û heya axa Ecem ya Îranê dewam dike. Di nava kilamê de behsa du qehremanên Kurdan tê kirin. Behsa qehremaniya wan di şeran de zahfe lê li axa Îranê dest û lingên wan tê girêdan. Ji bo ku ji wî welatî re xerb in.

Lehengên di kilamê de:

Xalid Begê Hesenî: Xalid Begê Hesenî zabitek dewleta Osmanîyan bû. Pileya wî albay bû. Albayek ku bi eslê xwe Kurd bû. Ji eşîra Hesenan e. Hevalek gelek nêz yê Xalid Begê Cîbrî bû. Di sala 1920 an de, bi Xalid Begê Cîbrî û çend kesên din re Komîteya Îstîqlala Kurdistanê didamezrînin. Di dema xwe de xebatkarek baş yê siyasî ye. Di şerê 1925 ande, bi Şêx Seîd re dikeve nava tevgera serhildanê. Dema serhildan dişkê, Xalid Beg bi şervanê serhildanê re derbasî axa Îranê dibe. Xalid, kurê xwe û biraziyê xwe ji yek malekî ne ku diçin Îranê . Di şerê bi Ecevan re kurê wî şehîd

dikeve. Fersendê pismamê wî birîndar dibe. Silêmanê Ahmed, Keremê Qolaxasi û Evdal jî şehîd dikevin.

Xalid Beg paşî diçe cem Îsmâîl Axayê Şikakî (Simko). Li dora salek li wir dimîne. Paşê tê der û dora Mûşê û li ber devê çemek ku mala dostên wî li wir in xwe vedişêre. Giliyê wî têkirin û tê girtin. Wî tînin Dîwana Qasimiyê ya Rizayê Xêlid ku pismamên hevîn lê di wê demê de Riza nema ye. Ji wir tînin dadgeha Amedê ya Îstîqlalê. Paşî jî Xalid Beg tê îdam kirin. Jiyaneke wî ya tije nexweşî û zahmet hebû ye.

Keremê Qolaxasi: Min di behsa kilama li ser Keremê Qolaxasi de behsa wî kiribû. Ji eşîra Zirkanê jorîne. Li gundên Qereyaziya Erzeromê dima.

Ristên nava Kilamê:

Di serê stranê de behsa şerê ku li Xelatê bûye dike. Paşî behsa şerê Eyntabê (Dûtaxê) dike û heya diçe axa Ecem. Xalid û Kerem bi hev re di nava şer de ne û kilam ji devê her duyan hatiye gotin. Di şerê Xelatê de, hêzên dewletê gelek giran diçin ser wan ku di kilamê de bi " Li ber û berê Xelatê, hirmînên topan, girmînên makîneliyên e" tîne ser ziman.

Lê ji aliyê din de Reso jî ber ku oldar e, bi awayek bawermendî dibêje " Temamê melayîketê li rû asîmana jî bo xatirê dînê Mihemed, li van xweşmêran rabûn selewatê". Ev tê vateya ku jî bo dozeka heq şer dikirin. Car din di kilamê de navtêdanek heye ku ji devê Kerem tê gotin: " Ez berxê mala Mistefayê Evdilla Begê me, qaçax û şêrê li serê çiyê me." Di tu şerek de Kurd, ji navdana xwe û mêraniya xwe nayên xwarê. Lê tişteka din di kilamê de aşkera ye ku her du hêz, yên dewletê û Kurdan ne weka hev in û rehma wan jî ne weka hev e. Moxol gelek bêrehm in. Ji rista " Qanûna vî kafirî qanûnekî zorî, zert î, bênamûs e, destê xwe avêtiye dînê Mihemed" tê zanîn ku gelek zor û eziyetê li Kurdan dikirin. Ger mijar şervan bin, tu caran li ba Kurdan nedibû xem. Lê zarok, jin, pîr, heywan û hwd. li ba Tirka ferq nedikir. Terş û tareşên Kurda diavêtin mazatê û difrotin. Perê wan goya diçû xezîneya dewletê. Di hevoka "Berê şêxan û melan, egîdan daye îstîqlalê, nîvê wan li sirgûnê, nîvê wan li îdamê, nîvê wan li birînê" de, tê vateya ku di encama têkçûna Şerê Şêx Seîd de, gelek Kurd hatin sirgûn kirin. Bi deh hezaran. Ev tesbîtek gelek rast e.

Wek îdam ku em behs bikin, bi hezaran însan hatin îdam kirin. Di nava hevokê de behsa " Îstîqlalê" derbas dibe ku mebesta dengbêj jê Dadgehên Îstîqlalê ne. Dadgehên

Îstîqlalê xwedî erkeka bêsinor bûn ku bixwestina biryara îdamê didan. Bixwestana biryara sirgûnê didan. Ger nexwestana girtiyan bigihîjin dadgehê, wan birê de didan kuştin. An pere didan hinek celladan, dema ku keysa xwe li Kurdên siyasî dianîn wan dikuştin. Ev hemû bi biryara Mufetîşên Giştî, dadgehên Îstîqlalê û fermanarên giştî dibûn. Lewra ye dibêje qanûneka zorî, zertî, bênamûse.

“Min her pêvajoya dadgeha Îstîqlalê ya Diyarbekirê dişopand. Mixabin beriya ku dest bi dadgehkirinê bikin an îfadê yekî bigrin, di mêjiyê xwe de biryara xwe dabûn. Dadgeh hema ji bo usule bû. Dadgeh bê sûc û sebeb bi hezaran mirovan dardakirin û komkujiyê kirin. Xelkê Amedê yê merd û paqij nikaribû xwe ji vê dadgehê rizgar bikira.”⁹¹

Di bendek din ya kilamê de behsa şerê Eyntabê dike ku îro bi Tirkî jêre dibêjin Dutak. Li welatê Serhedê ye. Niha qeza Agiriyê ye. Car din li wir Kerem û Xalid Beg bi hev re ne. Bi rista "ber û berê welatê bi çem û kanî" teswîra Eyntabê dike ku ciyek bi av û şînahî ye.

Dewlet kiryarên wisa dikir, ku bi yek şexsek re 10 kes tevbigeriya, ew nedihîştin û dişandin surgunê an îdamê. Lewra ku di rêzîkek nava kilamê de dibêje "Koka şêxan û melan, egîdan û seyîdan nema, tamam li me anî". Ne tenê ev cure însan lê dema li serê Kurdek egala Kurdî bidîtina, wê egalê li stuyê xwedî digrandin û di nava sûkê de ew kaş dikirin.

Ji xwe serhildanên Kurdan yê ku piştî 1923 an li dijî dewleta Tirkiyê çêbûne, du sebebên wan hebûn. Yek jê înkara hebûna Kurdan bû. Ya din jî li dijî ola îslamê dewlet bi bê olî tevdiageriya. Dema rêvebirên dewletê digotin ku dewlet laîke an resmî ola dewletê tune ye, ev dihat wateya ku dewlet bê ol e. Xelk wisa têdigihîşt. Lewra ku di kilamê de dibêje "ol û mezinên Kurdan tev dane ber xwe."

Di paşîya kilamê de hevokê zahf bi vate heye ku qiyasek baş dike. Dibêje "Axayê min lêxe tu xweşmêrî, sed û bîst cara tu mêrî. Yazix tu li welatê Ecem bê pişmêrî". Her du cengawer rast e di welatê xwe de xweşmêr bûn. Piştî wan nedihat erdê lê li welatê Ecem wê kî pişmêriya wan camêran bikira. Belkî ew Kurdên ku derbasî Îranê bûn û asê man, kêman careka din tişteka wisa hatibe serê wan. Dema mirov

⁹¹ İbrahim Sediyanî, "Kürt Tarihinin En Acı günü 28 Haziran 1925", *Kovara Bir*, Diyarbekir, 29 Haziran 2014.

bi giştî hizra xwe dide ser kilamê, kilam gelek bi vate ye û di kilamê de wext, cîh, bûyer û teref hemû aşkera ne.

3.7. GULA DI ZINÊR DE

Kes nizane ev stran ya Reso ye an ya Ferzê ye. Lê bi giştî dengbêj li ser Reso hemfikirin ku ya wî ye. Ji ber ku her du jî oldar bûn, carna peyv û hevokên di nava kilaman de weka hev in. Lê ger mirov li xwezayê binêre, mirov nikare bêje ku Ferzê weka Reso geriya ye û ji xwezayê sûd welgirtiyê. Di gelek kilaman de şuhubandina çanda xwezayî û ya çêkirî bi hev re li hev in. Di vê kilama Reso de xweza heye, evîna mecazî heye û evîna heqîqî heye. Mirin jî tê de xwuya ye. Xwe şikandina li ber Xwedê di kilamê de xwiya dike. Bi van taybetmendiyên re xerîbî jî di nava kilamê de heye.

Di hevokek kilamê de Reso dibêje "Ez gul im, gula di zinêr da". Gula di zinêr de ew gule ku gelek zahmete mirov xwe bigihîne wê gulê. Lê dide xwuyakirin ku herkes gulên xwe çirpandiyê, tenê ya wî maye. Ji hezkiriyê xwe dûr e. Tevî wê dûriya wan ji hev, gul a wî li çiyayê bilind e û stuyê xwe xwar kiriye bi ser sosinê de. Ew li benda xwediyê xwe ye.

Di kilamê de soz û peymanek di mabeyna her du hizkiryên de diyar dibe ku dengbêj dibêje: " Felek mala te mîrat be, min sond xwariye ez terka çelengsiwarê xwe nakim". Dema dev jê berdan bikeve navbera du aliyan, yê berdide dikeve nava îxanetê. Di ola îslamê de tiştê weha heye ku Melayê Cizîrî dibêje: "Ez li ser ehda elestim ta bi roja axirîn". Ev gotin di dîwana Melayê Cizîrî de derbas dibe û hem serê helbesteka wî ye. Soz, bext û qerar her sê sondên Kurdên berê bûn.

Gul dibêje ez terka evîndarê xwe nakim, " heta bi destê min bigrin min daxin qebra germ û sar da". Ev dibe evînek û sozê ebedî. Heta dibêje: Heta nê ser min melekê mewtê , qasidê şahê Merdan. Qesda wî ji Şahê Merdan, Xwedê ye. Melekê mewtê jî Ezraîl e.

"Felek mala te mîrat be emrê min 13 û 14 bû .

Te dilê min li dinyayê gelek şa kir, xapandim".

Di van malikan de tiştê balkêş heye ku ew jî dilşadkirina felekê ye. Lê dengbêj vê dilşadkirinê weka xapandinê dipejirîne. Ger xapandin be, mijareka din dertê holê ku ew jî evîna mecazî û ya heqîqî ye. Dilê xwe, di serî de ango di gêncatiyê de, bi

evîna mecazî rihet dike. Lê ya heqîqî dixwaze ku ew jî hizkirina ji Xwedê ye. Tê wateya evîna Xwedê. Ew kêfa di xortaniyê de, weka xapandinê dipejirîne.

Berê di nava xelkê de ger diranê yekî biketa ew destpêka extiyariyê dihat hesabandin. Extiyarî û mayîna ji refê xwe her dem mijara mijarê ye. Di jiyane de, ev her du jî, tiştên nexweş tînin qebûl kirin. Lewra dibêje:

"Di dawiya emrê min da te 2 diranên min xist

Li pey heval û hogirên xwe, ez mam feqîr û stûxwar û belengazî".

"Gula li ber qefayê" ew gule ku zû bi zû tiştêk nikare zererê bide wê. Ba lê naxe. Naşikê û hwd. Lê rewşa hizkiryê xwe û xerabûna rewşa wî dike sedema xerîbiyê. Seqaya li xerîbiyê û arandina li xerîbiyê ye. Ger hizkirî jî weka gulê li ber qefayek bûye, ne xerîbî ne serma nikaribû zererê bidayê. Her çendî li xerîbiyê be jî. Rêzên dengbêj weha dewam dike:

"Ez gul im gula li ber qefayê,

Îro çend û çend ro ne rewşa çelengsiwarê min xerab bûye

Ez nizanim ji arê ye ji seqemê ye, sê payê wî ji xerîbiyê û ji sermayê ye".

Di dawiya stranê de car din dengbêj destê xwe ji Xwedê re vedike û jê lave lav dike, dibêje ma Xwedê ez jî ne ebdê te me. Ez jî weka herkesî. Çima herkes gulên xwe çirpandin, ez tenê mame bêgul. Gula min ma weka stûxwaran li zinaran û li ber qefayan maye.

3.8. KILAMA QULING Û RESO

Di nava dengbêjiya Kurdan de quling gelek cara mijara kilama ye. Ne tenê di nava Kurdan de, di nava Tirkan de jî ev heye. Quling bi xwe gelek wateyan dide kilaman. Dema em li kilamên Evdalê Zeynê dinêrin, em di gelek awayan de kilamên li ser quling dibînin. Quling bi xwe temsîla zozan, berî, bêwariyê û xerîbiyê dike. Her weha jî carna demsalan nîşanî me dide. Li ser babeta ciyê quling di dengbêjiyê de Mehdî Mutlu şiroveyeka weha kir:

"Quling sembol û nîşaneyê xerîbî, koçkirin û xûrbetê ye. Bêwelat û bê weten e. Quling zivistanan li germiyana ne. Di havînan de, li zozanan û li ser avên cemidî ne. Dengê quling gelek xweş e. Bi êş û şewat e. Bi kom û kulfetê xwe ve her dem koçber e.

Weka Reso. Sembola herî zêde ya di kilamên Evdalê Zeynê de quling e. Reso ji vê şopê sûd girtiye û di nava xwe û qulingan de jî xalên hevpar dîtiye. Ji ber vê yekê Reso kilama xwe ya qulingo bi dengê xwe yê herî şewat dibêje. Di nava gelek kilamên wî de jî quling deng dide. Quling jê re saloxan tîne. Mîna Reso baskşikestiye, xerîb e, biyan e, bêcîh û bêwar e."⁹²

Refên qulingan her yek ji wan rêberekî wan heye. Rêber wan bi cîh û waran de difirîne. Her dem koçber in. Dema li esmana difirin, ref bi ref bi hev re difirin. Carna nîzama xwe diguhêrin, ji şikleke firê dikevin şikleka din. Weka leşkeran bi rêz difirin. Esman dinexşînin.

Di havînan de, dema difirin û diçin ber bi zozanan ve, hesreta dilê kerkesê yê ku qulingan nasdike, dixwaze hema bo demeke kurt be jî wan bibîne. Lê dengê wan ew çend xweş e, hêja ye ku mirov lê guhdarî bike. Ji ber wê xweşiya dengê qulingan, gelek caran dengbêj hene ku ji dengê wan re tê gotin "Dengê Qulingî". Ew kesên ku li qulingan temaşe kiribin û dengê qulingan bihîstibin gelek ji wan dibin evîndarê dengê qulingî.

Lê carna quling hene ku bûne baskşikestî û ji refê xwe qetiyar e an li paş refê xwe mane. Wê çaxê derdê dengbêj radibe û kesên weka wê qulinga baskşikestî, bi hev re tînin ser ziman. Dişibînin hev. Ne tenê di kilaman de lê di helbestan de jî quling bi xwe mijara helbestvane ye.

Li ser mijara qulingan, dengbêj Xeniyê Qereyaziyê weha dibêje:

"Quling ji evîna xwezayiyê tê. Evîne tîne bîra mirovî. Quling heywaneke weka melaîketa ye. Mirov dibê qêy ji bihiştê derketî ye."⁹³

Piştî van agahiyan niha mirov dikare here nava kilama Reso ku li ser quling çêkiriye. Di destpêka kilamê de jinek deng li Mamedo dike ku bi îhtîmalek mezin evîndarê Mamedo ye. Kilam tev li dora Mamedo diçe û tê. Di kilamê de quling weka ku mirov li benda mizgîniyekî ye ku ji mirov re bîne.

Mamedo li xûrbetê ye. Li xerîbiyê ye. Evîndara wî her tim çavên wê li benda xeberekê ye ku quling jê re bîne. Weha tîne ser ziman:

⁹² Ji hevpeyvîna min bi derhênerê bernameya "Civat û Kilam"ê, bi Mehdî Mutlu re, Gaziantep, 18. 06. 2013.

⁹³ Ji hevpeyvîna min bi dengbêj Xeniyê Qereyaziyê re, İstanbul, 10. 05. 2013.

"Mamedo quling rabû ji Rewanê, daniye ser çayir û çîmenê mala bavê min gulîkurê".

Ev nêzikayiya quling nîşan dide ku hatiye ber mala bavê keçîkê. Hêlîna xwe jî li ser caxê eywana mala bavê keçîkê çêkiriye. Keçîk her dem li benda xebera xêrê ye ku quling bide wê. Di " Ji xêra Xwedê re, mizgînxwaza mizgîniyek bida min rebenê " de xweziya dilê xwe dide derve.

"Bigotina Mamedê te bi xêr û selametî ji xûrbetê vegebiya

Bila şevên payîzê bihata biba mêvanê min keleşê, min seyranê"

Dema di serê kilamê de dibêje quling tên ji Rewanê ev tê wateya ku demsal payîz e. Di her du rêzikên li jorê de behsa xûrbetê û payîzan dike. Weka tê famkirin, payîz e û quling xwe ji zozanên Rewanê berdidin ber bi beriyê de. Da zivistana xwe li welatê germ bibuhirînin.

"Mamedo bihar e quling rabûn ji Sêweregê

Daniye li ser mêrg û çîmenê mala bavê min gulîkurê "

Di vir de, vê carê behsa welatê jêrîne ku behsa Sêweregê dike ku dikeve deşta navbera Rihayê û Amedê. Evîndar pîrsa xwe ji qulingên ji beriyê tên dike. Ger quling ji Sêweregê rabin û bihar be, wê çaxê quling wê herin zozanan. Car din evîndar dimîne li welatê jêrîn.

Di kilamê de, du dewre hene ku yek bihare û yek payîze. Di her du demsalan de jî evîndar pîrsa agahiyek ji quling dike bê ka ji delaliyê dilê wê, ji Mamedo xeberek xêrê aniye an na.

Lê di dawiya beşên kilamê de her tim behsa bêwelatiya quling û xwe dike. Hêlîna quling her daîma xerabe ye. Ew sembola xerîbiyê û bêwelatiyê ye.

3.9. DÎLBER

Ev kilama Reso bi xwe ye. Ev kilam di sala 1957 an de hatiye qeyd kirin. Tenê dîlber û wesfên dîlberê tê de hene. Ne ku dîlber naveka taybet e. Ya rastî ev e ku balê dikşîne ser lehengan, bê çima lehengên kilamê tune ne. Tenê navên hinek şûnwaran di nava kilamê de hene. Ev jî bû meroq bê çima lehengên wê tune ne. An dema ku dibêje dîlber behsa kê dike. Xeniyê Qereyaziyê weha behsa mijarê kir:

"Bi navê Dîlber gelek kilam hene. Ya Reso jî heye ku ew bi xwe çêkiriye û gotiye. Reso li gundê Mele Dawûda şivan bûye. Hevalek wî hebûye ku aşiqê jineka bi mêr dibe. Ji ber wê ye ku di kilamê de navê jinê an navê gundê wê derbas nabe. Tenê navên ciyên der û dorên wê di kilamê de hene."⁹⁴

Sembolên di nava kilamê de:

Di nava wêjeya Kurdan de, bi taybetî di dengbêjiyê de û di helbestan de "çavên reş" her dem hatiye gotin. Çavên reşê gir remzeke di dengbêjiyê de. Lê ger çavên reş gelek xweşik bin, her dem bela ne. Dîlber digel ku di wêjeyê de, nav e jî, ew bi xwe di heman demê de wesf e. Sifeteke bo jinê. Ger çav, birû û kilê çavan jî li hev be, ji layek de jinek tamam e.

Çav, gelek caran mala xelkê xerab kirine. Ew nêrînên çav û awirên çavên reş gelek zilam û xortan ber bi xwe de dikşînin. Lê bejin! Di kilaman de bejna jinê tayek bi serê xwe ye. Lewra dengbêjê me dibêje "Gelek camêra senem bejna te ya zirav, çavên belek, bi destên jinên xwe girtin, ji mal derxistin, ji xwe berdane."

Di nava Kurdan de "birû girê" jî tê gotin. Birûyên gir rûyê jinê xweş nîşan dide. Birûyên gir, çavên girê reş. Ev di kilama Reso de wisa derbas dibe. Lê di hinek kilaman de "birû pûşê" dibêjin. Ew jî ji bo birûyên zirav re tê gotin. "Birû pahn" jî gotineke di dengbêjiya Kurdan de. Reso di kilamê de wê jî bi kar tîne.

Reso li ser rengê singa dîlberê jî gelek xweş dibêje. Singa jinê gelek cara bi berfê re tê şuhubandin. Di stranê de dibêje "Te sing sipiyê, mîna teletêk (beleka berfê) berfa li eteka (qûntara) Çiyayê Qongrê" ku ev çiya nêzî Gumgumê ye. Di zargotînê de singa sipî gelek giring e ku di vir de bi keviyeka berfê dişuhubîn e. Dîsa li ser rengê singê dibêje "Sing sipiyê, mîna berfa eteka Çiyayê Bîlcanê" ku ev çiya, nêzî qeza Kopê ye û gelek bilind e. Em dibînin ku singa sipî her tim bi berfa çiyayek tê şuhubandin.

"Bila meriv qatîlê mêra be, girtiyê hebsa be li dinyayê

Nekeve tora te sêrbazê, cahilê, te nezanê dilo yar yar."

Li jorê, di her du rêzikan de, tezatek heye lê divê bê zanîn. Ger dîlber sêhrebaz be, dibe ku cahil be an na ev tezatek e. Reso di vir de sêhrebaziyê weka karê cahila dibîne. Sêhrebazî dikeve karê fenekan û hîleyan. Tevî van taybetmendiyên jî Reso evîna

⁹⁴ Ji hevpeyvîna min bi dengbêj Xeniyê Qereyaziyê re, İstanbul, 12. 07. 2013.

Di rista " Êvar e, ez rêwî me, li min dereng e, heval û hogirên min tev çûne ji Mûradê derbas bû ne" de, mebesta dengbêj ew e ku di wateya heqîqî de gotiye. Nabe ku di her du wateyan de hatibe bi karanîn. Di maneya rasterast de ku hevalên wî li Çemê Mûradê derbas bûne. Çemê Mûradê her dem li pêşiya Serhediyane û ew çemê Ferat bi xwe ye. Lê ger di wateya koçkirina dinya wî alî de gotibe, mijar diguhire. Lê di hevoka berya vê de, behsa ramûsanê heye; nabe ku ev wate mecaz be.

"Delaliyê, bejna te zirave mîna taka rihana di golê da". Di vê hevokê de " mîna taka rihana di golê de", di gelek stranên de heye lê peyva golê bêhtir divê kilamê de tê dîtîn. Sedema ku golê xistiye wê derê ew e ku bikaribe hevoka li pey wê bêje. Dema dibêje " Zerî! Qama min tunebû, min gavekî bi aşberî xwe berda pê da". Ger mirov aşberî nizanibe û evîna meriv weka taka rihanê di nava ava golê de be, mirov nikare xwe bigihîne. Aşberî di wateya evînî de, ew kesên ku aşberiyê dizanin, tê wateya ku evînê baş dizanin.

Kurd, di zargotinê de bi taybetî di dengbêjiyê de li hemberî jinan gelek qels in. Dema ku ji jinek an keçek hezbikin, ji dil û can hezdikin. Dengbêj ji bo yek ramûsanek weha dibêje: Sedemê ramûsana te bila ez heft sala bimama li Kela Romê, di hebsê da. Ku Kela Romê zîndaneka gelek zor û zahmete. Bi yek ramûsanek heft sal zîndan! Di kilama Edûlê de ku Garabêtê Xaço dibêje, em heman gotinê lê bi awayek din dibînin. Ramûsanek bedêla heft xwûnê mêra qebûl dike. Ev hezkirina bi mubalexe di nava dengbêjên Kurdan de gelek caran hene.

Di "De lê lê delaliyê xelk bi şev û rojê ketiye heyra mal û temelê dinyalikê" de em dibînin ku di gelek kilaman de Reso behsa "heyra mal û temelê dinyalikê" dike. Ew kesên ku guh didin malê dinyayê û ji bo malê dinyayê dilê xelkê ji xwe dihêlin û dîn û îmana wan bûye pere, li gor Reso ew ne tiştê in, ne mêr û camêr in. Di şûna mal û milkê dinyayê de Reso tiştê din dibêje ku ew jî : Ez ê bi xulama bejna te li girêdanê û li wê timtêlê ye. "Timtêl" tê wateya xeml û girêdana yekî an yekê. Jin an mêr ferq nake. Em heman peyva " timtêlê" di kilama Evdal de jî dibînin. Bi taybetî di kilama "Wey Xozanê" de. Behsa " Timtêla Qeymezê Êzîdî " dike. Heta Evdalê Zeynê " mal û temelîkê dinyayê" jî dibêje. Ji xwe divê bê zanîn ku Reso, wek tredişyon şagirdê Evdalê Zeynê ye.

Resoyê dengbêj vê kilama xwe bi awayekî sade û ku bê famkirin nivîsandiye. Ne hewce ye ku kes li ser vê kilamê tiştê zêde bike.

3.11. KILAMA MENAL MENAL

Reso di salên 1967 û 1973 an de diçe qeza Bûlanixê gundê Gebola û li cem Şêx Cemalê Şêx Ebdurehîm dimîne. Şêx Cemal Yetişkin. Şêxên Gebola heqşînas û camêr in. Heq û hûqûqên kesî naxwun. Reso bi xwe ji malbata van şêxan gelek hezdike. Dema Şex Cemalê kurê Şêx Ebdurehîm dimre, Resoyê degbêj li ser wî kilamek çêdike û dibêje. Navê kilama Reso "Menal, Menal" e.

Di kilamê de lehengênên ku behsa wan tê kirin:

Şêx Cemal: Li jorê min behsa wî kir û li ser wî şirove jî kir.

Mîhriya: Xweha Şêx Cemal e. Kilam ji devê wê dewam dike.

Qudbeddîn: Kurê Şêx Cemal e. Bi hesêb îro hê jî li heyatê ye.

Şêx Mihemed Elî û Miheyeddîn: Her du jî pismamên Şêx Cemal in.

Mirovên ku ji maddiyatê bêhtir bi manewiyatê pêwendîdarin û zêde guh nadin malê dinyayê gelek kêr in ku Reso yek ji wan kesan e. Di stranê de dema dibêje "Xelkê wenda kiriye mal û temelê dinyalikê, min wenda kiriye gula Şêxê Abiriyê û Gebola Şêx Cemalê delal." Reso balê dikşîne ser qedr û qîmeta însanan ku dema însan ji vê dinyayê koç bike, qîmet ji mal û milkê dinyayê re namîne. Di hevoka ku behsa Şêxê Abiriyê û Gebola dibêje, ev her du gundên han gundên mala Şêx Cemal in. Li ser qeza Kopê (Bûlanixê) ne. Di kilamê de firyad, fixan û heyflêhatinek heye di derbarê şêx de. Serê kilamê, ji devê dengbêj dest pê dike û ji devê jineka malê, xwuşka Şêx Cemalî dewam dike.

Di gelek kilamên Reso de, her dem behsa cî tê kirin. Weka piraniya kilamên wî, di vê de jî diyare ku taziye li Gundê Gebola çêbû ye û gund li serê girekiye an li kir e. Di devoka Serhedê de 'kir' tê wateya ciyê bilind û bilindahiya çiya jî. Hunereka xweş di kilamê de heye ku dibêje : Bejna Cemalê delalî hêşîn dike mîna taka rihanê bi qaîde ye. Hêşînkirina bejna Şêx Cemal ji bo şuhubandina taka rihanê ye an ji ber hêşînayiya cubeyê wî tê baş ne diyare. Ger her dû bin jî dibe. Aşkeraye ku bejna Cemalî bejneka li hev e.

Tevî mirina birayê mirov, ji mirov re gelek zahmete jî dîsa xweha wî ji Xwedê re şikir dike û dibêje ku mirin layîqê Şêx Cemal e. Ev mijareka felsefiye ku tu kesek ji mirinê xelas nabe. Pêwiste mirov ji mirinê jî aciz nebe ji bo ku emrê Xweda ye.

"Hêlkanê dilê min rabûn e mîna pêlên Mûradê, pêl li ser pêla lêdixe, nade rêwî û rêcala, ne qam e ne buhur e."

Hêlkan an hilkehilka dilê mirovî, ji heyecana dilî re tê gotin ku teşbîhek gelek xweş di vir de heye. Pêlên çemê Mûradê çewa lê dixê, dilê xwişka Şêx Cemal jî wisa lê dide. Ev hunereka wêjeyîye di wêjeya Kurdan de, di ya devkî û nivîskî tev de. Ne dilê wê û ne bi teşbîha pêlên çemê Mûradê nikare heyecana xwe rawestîne ji ber ku birayê xwe wenda kiriye.

Di dewama stranê de vê carê gotin derbasî aliyê pismamê Şêx Cemal, Şêx Mihemed Elî dibe û xîtabê Mihyeddîn dike û dibêje ka piştî Cemal koçî dinya din kir, ji wê rojê û bi şûnde wê bi kî şad bibe an bi kî sebra dilê xwe bîne. Ji hevoka jorê û ji hevokên di peyda jî tê famkirin ku demsal bihar e. Dema însan bê çare dimîne ku yek ji wan, li hember mirinê nikare çi tiştê bike, di haleka wiha de herkes, gelek cara bi "şikandina per û bask" merama xwe tîne ser ziman.

Di dema taziyan de daîma tê gotin ku çavên xwediyê mirî kor e. Mîhriya ji biraziyê xwe re, ji Qutbeddîn re ferman dike û dixwaze dîwana bavê xwe ji nuh de bixe pergalek û taziye gelek qelebalix e, ji her derê xelk hatiye serdana wan. Dixwaze ku xwe bernede. Ew rewş û pergala berê ya dîwanê her weka berê bide dewam kirin. Ev gotinên han tevî ku gazinin jî di heman demê de weka fermaneke ku divê Qutbeddînê Şêx Cemal ev yeka hanê bike.

Di gelek malbatan de dema mezinê malbatê bi civata xwe re li malê rûdinê, dibêje dema ku ew mir, wê were diyarê wan bê ka wê halê wan çawa bibe. Lewra ku Reso dibêje "xwezî mirin du cara bûya. Şêx Cemal îro ji gora xwe serê xwe rakira û li halê tekyexana xwe, pismam û zarokên xwe binhêta." Ev gotinên Reso gazin e an na, ne diyar e. Lê dema mirov li hevokên berê yên di kilamê de binêre, weka gazin xuya ye.

3.12. KILAMA TOWBE

Ev kilameka ku Reso bi xwe çêkiriye. Kilameka evînî ye. Di paşiya her bendeka wê de gotina towbe heye. Lewra ku navê kilamê wisa danî ye. Qehremana di kilamê de ne diyar e. Raste ku deng li jinekê dike lê nav nedaye. Kilamên wisa hene welew li ser keçek an jinek hatibe gotinê jî dengbêj gelek cara nikare navên wan bixe nava kilamê. Ev taybetmendiyeke dengbêja ye.

Di nava kilamê de hevok û gotinên weka qalib û balkêş hene ku di nava termê zargotina Kurdî de bi cîh bûne. Ger hatibin jibîrkin jî ev term divê careka din sax bibe û bikeve nava zargotina zimanê Kurdî.

Weka di gelek kilaman de geryanek bo Mûsil, Humus, Kuma û Hekayê heye. Lê tevî ku ewqas cî hatiye gerandin jî tu jin an keçek weka ya di kilamê de behsa wê têkirin nediye. Ev jî erdnîgariyeke gelek fireh e. Bejna zirav, çavên reş û belek dîsa termek ji gotinên wesifdayîna dengbêj e.

"Tilî û pêçiyên te tev ji mûmê ji şimayê" ne. Mûm û şima her dû jî nerm in. Mûmên berê nîşana ziraviyê bû ku tiliyên zirav gelek meqbûl bûn û bi mûman dihatin şuhandin. Şima jî bi xwe ew mûma hingive ku şêrîne û hem nerm e. Tiliyên zirav û nerm, remza xweşikbûna perçeyek ji wesleyên jinê ye. Ger du dilên meriv hebin di dinyayê de, yek di mal de bimîne û yek bigere, risteka gelek xweş e. Yek li malê be ev tê vateya ku pêdiviya zarok û jina meriv bi meriv heye û ew dil divê hebe.

Dilê din li dinyayê bigere bê ka çi heye, xweşî, xweşkayî, rihetî an mirov dinyayê binase. Heta jinên din jî di nava wan de. Ji bo jinan tesbîtek Reso yeka baş heye. Dibêje: Di dinyayê zor û pir zahmet e, jina çê bikeve destê kotiyê mêra, ne tê kuştin, ne tê berdan, Min towbe....Û kilam dewam dike. Jina baş gelek cara para mêrê xerab e. Carna jî jina xerab para mêrê baş e. Ev weka mêzêneke di dinyayê de dewam dike û diçe. Jina baş û mêrê baş kêma cara meriv bi hev re dibîne. Mêzêna dinyayê jî wisa hatiye danîn. Ger jin û mêrê baş bi hev re û yên xerab jî bi hev re bizewicin, dinya bê mêzên dimîne û kes nikare bi hev re bijî.

Di gotina " Şê û şê biskê dişê gewra min di hevda" de, porê evîna wî şekiriye û li hev e. Di dema li serê xanî savar tevdiye û bayê Ecem lê dide de gelek bi evîna wî dikeve. "Soz û qerara berê" di nava Kurdên berê de gelek giring bû. Niha ew taybetmendiya berê nemaye. Ger sozêk ji devê mêrek an jinek Kurd derketa, ew weka

çek û senedan bû. Peyman bi xwe bû. Sozên niha qet nemane û bawerî bi wan nayê anînê.

3.13. KILAMA HEY LÊ

Resoyê dengbêj li dora 1950 yan vê kilamê gotiye. Kilameka evînî ye. Di nava kilamê de navê însanan, jin ne jî mêr derbas nabe. Tenê navên hinek deverên Kurdistanê derbas dibin ku ew jî gelek ji wana navên ku tê zanîn. Ji wan navan tenê navê Taşmaxana Leterê ya sîvîl derbas dibe ku ew jî di demên berê de weka zîndan hatiye bikaranîn. Ev Leterê navê gündeke ye li qeza Xamûrê.

Di wêjeya Kurdî de qîzên bedew û xweşik daîma bi xezalê re tîn şihibandin. Xweşkayîya di xezalê de, sekna wê û çavên wê bûye babeta helbest û kilaman. Di erdnîgariya Kurdistanê de Kaniya Xezala heye ku dikeve Deşta Mêrdînê. Rewana payîtexta Ermenan jî bi xezalên xwe tê naskirin. Lewra ye dengbêj dibêje " De lê lê muhubê sibe bû min xezalek rakiriye ji sazê Mêrdînê û Rewanê" ku her du jîngeh jî ji hev gelekî dûr in. Lê ger xezalek ji wan dera rakiribe, berê xezalê daye Dûtaxê û piştî wê ketiye Yekmalê. Ango ketiye navbera her du ciyan.

Di dema ku nêçîrvan çav bi xezala dikevin, didine pey wan û dixwazin nêçîra wan bikin. Di stranê de dema dibêje "Sekvana ji êvar da berê xezala min daye Zozanê Elenderê" , di vir tê wateya ku herkes dide pey xezalê lê ew xezal dibe para yekî. Dema dibêje "Xwezî tu bûka mala bavê min bû ya yî" de dertê holê ku ew xezal teşbîha navbera wê û qîzeka bedew e. Di zahf kilaman de daîma behsa xezalê heye. Gelek kilam bi navê "Xezal" hene. Kêm ji wan kilaman hene ku navê keçikê bi xwe Xezal be û ew nav dabin kilamê. Keçikên xweşik, bi xezalê re hatine dirûv lêxistin û di xweşkayî û bedewî ya xezalê re, pesnê keçikan hatiye dayîn. Reso jî di vir de ewilî behsa xezala heqîqî dike û paşî tevna kilama xwe tîne ser delaliya xwe an keçika ku ew behs dike. Çawa xezal ji aliyê nêçîrvanan de tîn nêçîrkin, wisa jî qîzên delal, ji aliyê evîndarên xwe de tîn nêçîrkin.

3.14. KILAMA RABE RABE

Reso piştî sala 1970 yan vê kilamê gotiye. Kilam bi temamî li ser pîratiyê ye. Qiyasa ciwanî û pîratiyê dike. Lê ne bi temen, bi hal û hereketên însanan. Di nava kilamê de gelek gotin û peyv hene ku ferqa navbera pîratiyê û ciwanîyê datîne ber çavan.

Reso di gelek kilamên xwe de û di vê kilama xwe de jî behsa felekê dike. Felek weka 360 derece girover tê qebûl kirin û her noqteyeka li ser çerxa felekê pêvajoyek jiyana mirovan e. Gelek kes hene ku dema behsa felekê dibe nizane jê re wateyek deyne bê ka tê çî wateyê.

Reso di vê kilama xwe de havîn û payîzê weka extiyariyê bi gelek bûyerên xwezayî bi me dide fam kirin. Her wekî ji bo extiyariyê dibêje " Havîne, li me zer bûye giyayê mêrga, miçiqîne avên çavkaniyan." Di hevokek din de jî dibêje: Payîze tenik bûye mîna însanek emrê xwe derbas bike. Payîzê weka extiyariya mirov teswîr dike. Di temenê mezin de, mirov hew dikare xwe bide ber hinek tiştên ku di ciwanî yê de, mirov dike. Weka dibêje: Xwe nade kapê xam caniya". Meriv mezin dibe, dibe xwedî tecrubeyên zêde. Mirov hew dikare weka canûyên xam ku hêj ne yê siwarbûnê ye, bike. Kiryarên meriv li gor temenê meriv diguherin û îdî mirov ne xam e.

Di dewama kilama xwe de Reso gêncatiyê weka çawa di biharê de çemê Mûradê radibe û har dibe, rê nade tu kesî, wisa teswîr dike. Di dema 13 û 14 saliya xwe de, her wekî felekê ew xapandibe dipejirîne. Kes ne bawere ku piştî gêncatiyê wê extiyarî were û mirov bikeve nava dest û piyan. Di gêncatiyê de, dema mirov diçe civat û cemaeta, herkes ji ber meriv radibe û ji meriv re rêz digre lê dema extiyariyê Reso weka " Bûn tîq e tîq ê wan û bi min kenîyan" ê tîne ser ziman. Fikreka din ya dengbêjî jî ew e ku diranketin û rûsipîbûna însanan weka nîşanên pîratîyê dipejirîne.

Di serî de me çawa tarîfa felekê kir, dengbêjê me, ji felekê bi gazin e. Ji halê xwe neraziye. Lê çerxa felekê jî wisa digere. Xweşî, nexweşî, hezkirin û dijminahî, hemû di felekê de birane. Reso şibandinek gelek di cîh de dike ku dibêje " Te ez kirim mînanî takî kinkorkê, li Çiyayê Bîngol û Şerefîdînê, ez hêşîn kirim". Giyayê kinkorkê ku xwarna wî nexweş e, xwe dişibîne wê. Bayê seherê her dem babeta kilaman e û weka termek di nava wêjeya Kurdî de, xwe bi cîh kiriye. Li Gola Şêlû, Gola Nazîkê, (di navbera Xelat û Kopê de ne) li Behra Wanê ez werkir im. Di vir de em dibînin ku dengbêj xwe ber bi rojhilat ve dikşîne. Ka di dawîya kilamê de wê çî bide destê me, wê diyar bibe.

"Temamê qîz û bûka bi serê min dikevin

Ji min re dibêjin tu kalî

Min got zalim ez ne kal im

Kal bim kalekî bi galegal im

Koçer im xerab mal im

Re'ya me bê pergal im

Rêwî me ji hevalên xwe mame
Bê heval im
Ev tev derd û kulên te ne
Ez dibêjim pê dinalim
De rabe rabe rabe
Ev a welata îdî ji min û te re nabe".

Ji kilamê tê zanîn ku Reso vê carê berevajî gotinan dibêje û li dijî felekê dertê. Ji ber ku mirov exlaqê Reso dizane, tam behsa xwe û xelkê ku di nav de dijî, dike. Gazina ji hevaltîyê, ji nepaqîjîya microvan dike. Weka her pêvajoya jiyana xwe, behsa koçeriya xwe dike û dibêje ku ev welat jê re nabe. Daxwaza dilê xwe ya ku dinyayek çewa dixwaze, hevaltîyeka çawa û însanên çawa dixwaze, wê behsê dike. Reso dewam dike:

"Welatekî şorbe gilgilê, nan garisê,
Jin tolê, mêr qehpe ye, ji me re nabe."

Di her du rêzikan de behsa feqîriyê û nemerdiya însanan heye. Şorba gilgil, nanê garis ku di gewriya mirov de dimîne, naçe xwarê, xerabiya jinan û bênamûsiya mêran çiqas belave ye. Paşî behsa rastiya însanan, bi hevalên rast re dike. Behsa dostaniya Xwedê dike ku mirov Xwedayî be. Bila însan rast be û bi hezaran dijminê wî hebin.

"Rabe li kumeytekî kapreş siwar be
Bila kumê te mîna cara li nav çavên te xwar be
Ji pira Bendûmayê tu derbas bibe
Bi yekî mîna Surmeli Mehmet Paşa re tu heval be
Bi însanên xerab re tu ranebe rûnenê..."

Hespê kumeyt û kapreş di wêjeya siwariyan de gelek bi nav û deng e. Ev cureyeke hespa ye. Kumê xwar di nava çavên însan de tê vateya însanê bê minnet, însanê rast û rastgo. " Here ji Pira Bendûmayê derbas bibe" tê vateya ku ber bi Surmeli Mehmet Paşa ve diçe. Gora wî nêzikê Agiriyê ye. Ji ber ku ev pir pireka kevn e û li bajêrê Ercişê ye. Ango Reso xwe ber bi Agiriyê de dide. Agirî ciyê Surmeli Mehmet Paşa ye ku hevalê dengbêj Evdalê Zeynê bû ye û tu carî nehiştiye ku dengbêjê wî Evdal, di jiyana xwe ya debarî de perîşan bibe. Evdal bi xwe jî ji Surmeli Mehmet Paşa gelek xweş bû ye û her gotinên wî yên rast ku dema wan hatiye, ji Surmeli re gotiye. Lê tu carî Paşa, ji bo rastgotina Evdal xwe jê nexeyîdandîye û li Evdal guhdarî kiriye. Sedem ev e ku Reso dibêje bi yekî mîna Sürmeli Mehmet Paşa re heval be. Ji bilî van tiştên ku

min got jî Reso şagirtê Evdalê Zeynê bû ye û xwe di exlaqê Evdal de dibîne. Dixwaze hevalên wî jî weka Surmeli Mehmet Paşa bin.

3.15. RESOYÊ DESTANBÊJ

Resoyê Mihacir ne tenê kilamên ku heya niha behsa wan hat kirin gotiye û çêkiriye. Dema mirov li dengbêjiya wî binêre, Reso destanbêjekî gelek baş bûye. Destana Memê Alan yek ji destanên ku wî jî gotiye. Siyamend û Xecê destaneka dine ye ku gotiye. Cembeliyê kurê Mîrê Hekkariya û Binevşa Narîn jî bi berfîrehî di nava xezîna wî ya dengbêjî û destanbêjiyê de ye. Di nava detanbêjan de, destana "Zozanê Bavê Siltanê" heye ku kêmkî kes vê destanê gotine. Reso vê destanê jî gotiye. Destanan bi gotin û kilamkî tev gotiye. Kilamên nava destanan ku dibêje, dibe dengbêjî bi xwe.

Resoyê Qilîwelo an Gopala, di heman demê de beytên Feqiyê Teyra jî gotiye. Ew helbestên ku 400 sal berê Feqî nivîsandiye, ji aliyê Reso de ji nuh de hatine gotin. Dixwazim di vir de mînakek bidim ku vê helbestê Reso gotiye lê bi kilamkî:

"Ewan teyran awaz digot

Şalûr û bilbil bûne cot

Ewan kêfek li min disot

Ya Reb ez ji kê gazin bikim." ⁹⁶

Resoyê Gopala vê helbesta Feqiyê Teyra bi maqam gotiye. Ne tenê wê lê gelek beytên olî jî gotiye. Li gelek ciyan û ji devê gelek kesan tê dizanin ku Reso 6 an 7 helbestên Cegerxwîn beste kiriye û gotiye. Lê ji xwe gazina Reso ev bûye ku gotiye wê roj we re her tişt rihet û hêsantir bibe lê ez wê rojê nebînim. Di vir de behsa tv, cd û kasetan dike. Ji ber ku qeydiyên wan yên kasetan tune ne. Me berê jî behs kir ku di demên desthilatdariyên leşkerî de, hatine civandin, şewitandin an xelk ji tîrsa xwe, kasetan xistiye binê axê û di wir de rizandin e. Ji ber van sedeman, gelek berhem negihîştine heya roja me.

⁹⁶ Ji hevpeyvîna bi dengbêj Xeniyê Qereyaziyê re, Îstanbul, 22. 10. 2012.

ENCAM

Di vê lêkolîna li ser dengbêj Resoyê Gopalan de, gelek mijar hatin şirovekirin. Di nava lêkolînê de teoriya stranbêjiya dunyayê ango rêbaza wê, neteweyên cîran û kêmeteweyên li ser axa Kurdistanê vî karê hanê çewa kirine hene. Di nava dengbêjiya Kurdan de jî piçek li ser dengbêjiya Evdalê Zeynê û bi berfirehî li ser dengbêjiya Resoyê Gopala hat rawestan.

Di dewrên berê de sînorên mabeyna qewman û neteweyan zêde ne asê bûn. Xelk gelek caran kes sînoran derbas dikirin û dibûn mêvanên hev. Ji hev re kilaman digotin. Şêvbêrkên xwe bi hev re derbas dikirin. Her dengbêj bi zimanê xwe kilamên xwe digotin. Dayîn, sitendina çandî û însanî di navbera wan de bi xurtî hebû. Dengbêjên dinyayê û yên Kurda weka peyamnêrên milletên xwe bi hev re di nava pêwendiyên de bûn. Ev pêwendiyên navbera wan di warê dengbêjiyê de li ser hev bandorê dikirin û ji hev sîd digirtin. Sedem ev e ku di warê dengbêjiyê de tam û meqamên gelek kilamên neteweyan weka hev in. Mînak: Kilamên Kurdan, Ereb, Suryan û Ermeniyên ji aliyê meqamên xwe de gelek dişibin hev.

Ger em behsa terzên strandina nava kilamên Kurdî bikin, ev yek herêm bi herêm diguherin. Lê di nava wan de terzek heye ku di nava dengbêjên seranserê Kurdistanê de xwe parastîye û heya roja me hatiye: Terzê Evdalê Zeynê. Terzê Evdalê Zeynê di nava dengbêjiya Kurdan de terzek taybet e û heya roja me hatiye. Wê paşî jî di nava dengbêjan de dewam bike ji ber ku terzek xurt, bi rêk û pêk e. Dengbêjiya Evdalê Zeynê, du sed sal berê dest pê dîke û şopa wî heya roja me dewam dîke. Îro jî bi sedan dengbêj li ser şopa wî kilamên xwe çêdikin. Ji bo rêzgirtin û bîranîna Evdalê jî, gelek dengbêj li ser Evdalê kilam gotine. Di nava şopînerên Evdalê de dengbêjê xwedî bîra herî fireh dengbêj Resoyê Gopala ye ku ew jî di hinek kilamên xwe de behsa Evdalê dîke. Bi berfirehî jî li ser şopa Evdalê dewam kiriye.

Jiyan û berhemên dengbêj Resoyê Gopala mijara vê tîzê ye ku bi berfirehî li ser lêkolîn hat kirin. Kilamên ku Resoyê Gopala gotîye hêjmara wan bi hezaran e. Di nava wan de yên ku ew bi xwe çêkiriye jî wek jimar ji yên dengbêjên din gelek zêdetir in. Bi vê sedema zêdebûna kilaman, xebatek hinek zahmet û tevlihev bû. Lê di encamê de gelek mijarên li ser Reso û berhemên wî rohnî bûn.

Resoyê Gopala gelek kilamên Evdalê Zeynê gotine. Ji xwe dengbêjiya Reso bi wan kilaman dest pê dîke. Reso yek ji wan kesan e ku kilamên Evdalê heya koça xwe ya dawî gotîye û anîye. Ji bilî kilamên Evdalê Zeynê jî, di gelek heremên Kurdistanê de geriyayê û ji dengbêjiya wan gelek tiştan bidest xistiye û kiriye nava dengbêjiya xwe.

Dengbêjiya Serhedê, Qafqasyayê, Xerza, Silîva û Binxetê, ew dengbêjîne ku Reso ji wan girtiye.

Ji bilî dengbêjiyê, kilamên govendê û yên kar, bi serê xwe ew kilamin ku gelek dengbêj wan dizanin. Reso bi berfirehî kilamên govendê dizanibû. Di her govendeka nas û dostan de, Reso di serê govendê û cemaetê de bûye. Ji bilî dawetan Reso karê paleyiyê jî kiriye. Li jorê di gelek pêvajoya jiyana Reso de, hat behskirin ku Reso paleyêkî gelek baş bûye. Di dema paleyiyê de, strandina kilamên kar, zewqeka bi serê xwe ye. Bi taybetî bo paleyan. Ger paletî bi zibare be jî, tama wan kilam û karan bêhtir zêde dibe. Reso ew kes bû ku di dema paleyiyê de, ji kar û gotina kilamên bi paleyiyê hezdikir.

Bi sedema ku Reso însanek oldar bû û di civat û caxiyên şêx, axa û mezinên eşîran de rûdinişt, li gor wan civata tevdişerîya. Di dewra jiyana Reso de, di civatên şêxan de, beytbêjî di asteka bilind de bû. Reso ji civatê re beytan digot. Di nava wan de, beytên Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî û nivîsarên din hebûn. Li jorê, min mînakekî ji wan beytan nivîsand. Reso ji aliyek de jî milletperwerê welatê xwe bû. Lewra ji helbestên helbestvanên Kurd yên siyasî besteyan çêdikir û digot. Kesên ku dîtine Reso wan helbestan bi kilamkî gotiye ji me re behs dikin. Ne ku di destê me de qeydek, kasetek an CD yek Reso di derbarê wan helbestên siyasî de heye.

Reso ji bo ku dîroka Kurda wenda nebe gelek kilaman gotiye û aniye heya roja îro. Reso şahidê gelek bûyeran bû. Kilamên ku li ser bûyeran hatine gotin, gotiye û ew bi xwe jî çêkiriye. Paşî jî dewrî dengbêjên pey xwe kiriye. Di nava zarokên dengbêj Resoyê Gopala de hene ku li pey şopa bavê xwe dengbêjiyê dewam dikin lê zê de bi berfirehî nakin.

Mixabin di dema ku Reso li jiyana bû de, dengê Reso bi awayek pisporî nehatiye tomarkirin. Kasetên wî ew kasetin ku hinek kes ji xwe re tomar kirine û paşî di nava xelkê de balav bû ne. Dîsa jî dikarim bêjim kilamên ku Reso gotine gelek ji wana di nava xelkê de hene. Tevî ku dengê wî yê di nava kasetan de nebaş jî bi berfirehî tê guhdarîkirin. Mixabin ew dengê Reso yê dawûdî, di wan kasetan de, rengê xwe yê esasî nade.

ÇAVKANÎ

Pirtûk

Aras, Ahmed: "Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê", Kovara Bîr, hej. 7, Diyarbekir, 26 Sibat 2010, <http://www.kovarabir.com/2010/02/ahmed-aras-kilama-kurdi-u-denbejiya-serhede/>

Benjamin, Walter: *Son Bakışta Aşk*, Weşanên Metisê, ç. 6. , werg. Nurdan Gürbilek, İstanbul, 2012.

Benjamin, Walter: *Son Bakışta Aşk*, Weşanên Metis ê, werg. Nurdan Gürbilek-Sabir Yücesoy, ç. 6. , İstanbul, 2012.

Bucak, Mustafa Remzi: *Bir Kürt Aydınından İsmet İnönüye Mektup* , Weşanên Dozê, ç. 1, İstanbul, 1991.

Cewarî, Nûra: Kürt Müziği Sorunları, Mûzîk, *Dans û Şarqiyên Kurdî*, Berhevkar Mehmet Bayrak, Weşanên Özge, c. 1, Ankara, 2002.

Çobanoğlu, Özkul: *Sözlü Kompozisyon Teorisi ve Günümüz Halk Çalışmalarındaki Yeri*, 1998, Ankara.

Gümgüm, Abdurahman: Kürt Folklorü ve Reso'nun Stranlarında Kürt Folklor Unsurları, Kovara Bîr, Diyarbekir, 16 Hezîran 2012 <http://www.kovarabir.com/2012/06/abdurrahman-gumgum-kurt-folkloru-ve-resonun-stranlarinda-kurt-folklor-unsurlari-1/>

Hobsbawm, Eric J. : *Eşkiyalar*, Weşanên Avestayê, werg. Orhan Akalın- Necdet Hasgül, ç. 1. , İstanbul, 1997.

<http://www.kovarabir.com/2014/06/ibrahim-sediyani-kurt-tarihinin-en-aci-gunu-28-haziran-1925/>

Nezan, Kendal: "Kürt Müziği", *Mûzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî*, Berhevkar: Mehmet Bayrak, c. 1, Weşanên Özge, Ankara, 2002.

Ong, Walter J. : *Sözlü ve Yazılı Kültür*, Weşanên Metis ê, ç. 4. , İstanbul, 2013.

Osmanyân, Zozan: *Muzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî*, Kürt Folklorunda Epik Destanlar, Amad. Mehmet Bayrak, Weşanên Özge, c. 1, Ankara, 2002.

Poche, Chiristian: Kürt Müziği, Berhevkar Mehmet Bayrak, *Mûzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî*, Weşanên Özge, c. 1., Ankara, 2002.

Propp, Vladimir: *Folklor, Teori ve Tarih*, Weşanên Avestayê, ç. 1. , İstanbul, 1998.

Rifat, Mevlanzade: *Türkiye İnkilabının İçyüzü*, Pınar Yayınları, ç. 2. İstanbul, 2000.

Sanders, Barry: *Öküzün A' sı*, Elektronik Çağda Yazılı Kültürün Çöküşü ve Şiddetin Yükselişi, Weşanên Ayrıntı, ç. 2. Werg. Şehnaz Tahir, ç. 2. , İstanbul, 2010.

Sediyânî, İbrahim: "Kürt Tarihinin En Acı günü 28 Haziran 1925", Kovara Bîr, 29 Haziran 2014.

Sever, Tahsîn: “1925 Kürt Hareketinin Yapısı ve Hedefleri”, *Kovara Bîr*, Hêjmar 4, Diyarbekir, 19 Eylûl 2010.

Arşîva Taybet

Azîzî û Bedirxanî: Ji bernameya ‘Azîzî û Bedirxanî’, Rêzefîlma belgeyî ya Kurdistan tv yê, ji arşîva Mahmut Beğik.

Bernameya ‘Dengên Axê’, Televîzyona Kurd 1 ê, 2008, Paris, ji arşîva Mahmut Beğik.

Dengbêj Egîdê Têcir, ji arşîva Prîskê Mihoyî, Yerîvan, 1965.

Dengbêj Şebabê Egîd, 1965, Yerîvan.

Kawis Axa, albuma “Lawik”, Kom muzîk, İstanbul, 22. 02. 1999.

Çavkaniyên Şexsî

Abdulkerîmê Reso: Hevpeyvîna min bi Abdulkerîmê kurê Reso re, Mûş, 16. 07. 2013.

Ahmed Aras: Hevpeyvîna Ahmed Aras ya bi malbata Reso re, Manisa, ji arşîva Ahmed Aras.

Dengbêj Zahiro: Hevpeyvîna min bi Dengbêj Zahiro re, Aydın, 24. 01. 2012.

Ferhad Aydın: Hevpeyvîna min bi Ferhad Aydın re, Diyarbekir, 05. 05. 2012.

Hecî Şerîfê Qado: Hevpeyvîna min bi Hecî Şerîfê Qado yê Ûsiv re, Farqîn, 25. 04. 20013.

Kafî Alevî: Hevpeyvîna min bi nivîsar Kafî Alevî re, Hewlêr, 15. 01. 2013.

Mahmut Aygören : Hevpeyvîna min ya bi neviyê Şêx Seîd, bi Mahmut Aygören re, Dicle, 21. 09. 2010.

Mehdî Mutlu: Hevpeyvîna bi derhênerê bernameya “Civat û Kilam” ê ya bi Mehdî Mûtlû re, Gaziantep, 18. 06. 2013.

Nezir Ak: Hevpeyvîna min bi Nezîr Ak re, Diyarbakır, 22. 06. 2006.

Ozan Brader: Hevpeyvîna min ya bi Hozan Brader re, Mêrdîn, 10. 01. 2013.

Reşo Zîlan: Hevpeyvîna min bi Reşo Zîlan re, Mêrdîn, 22 Hezîran 2013.

Tahsin Sever: Hevpeyvîna min bi Tahsîn Sever re, Diyarbekir, 13. 09. 2008.

Tosinê Reşîd: Hevpeyvîna min bi Tosinê Reşîd re, Diyarbekir, 12. 12. 2012.

Xeniyê Qereyaziyê: Hevpeyvîna min û dengbêj Xeniyê Qereyaziyê, İstanbul, 01. 07. 2013.

Zeynep Yaş: Hevpeyvîna min ya bi Zeynep Yaş re, Diyarbekir, 15. 12. 2012.

PÊVEK

KILAMÊN KU LI SER WAN ŞIROVE HATINE KIRIN Û GOTINÊN WAN BI TEMAMÎ

1- LO MÎRO

Lo mîro! lo mîro! lo mîro!

Ez hatim Qisqaniya şewitî

Sibe ye Kerem ba dikir Evdal, Evdal dengê xwe nekir

Evdalê pozberan û Keremê bejinzirav

Her du berxê Mala Mistefa Axa

Li biniya kona rûniştin, herduya qasê bi hevre mişêwere kir

Ya ku hatiyê serê berxê mala bavê min

Bila nê serê Eyyûbê kurmaxwarî

Kurma xwar û canê wî tar û mar kir

Heyfa min nayê li kuştina Evdal û Kerem

Di hewşa Emir Tûman de bi hêsîrî.

Fersende girt bi destê Besrayê çû derê

Birê Ehmê Keko bêbexto xweyî nekir.

Lo mîro Lo mîro Lo mîro

Ez hatim Qisqaniya şewitî di ber de çem e

Ez hatim şewitya Qisqaniyê di ber de çem e.

Min dî Keremê bejn zirav, Evdalê pozberan xwe dabû cem e

Min pepûkê nizanibû axa berxê mala bavê min

Bikşîne Îrana şewitî torpaxa Şahê Ecem e.

Şane şûrê Şihûdê) berxê Mala Emer bavê Elfesya li dinyayê gelekene

Bîst mêr kuştiye gava xwe dirêj kiriye

Heta nekuje sed û bîst û pênc mêrê Ecem e,

Tu carê nayê ser cenazê Evdal û Kerem e.

Li mîro lo mîro lo mîro

Ez nemînim ji maqûlê mala bavê min re îslamî tune

Lo mîro lo mîro

Ez nemînim ji maqûlê mala bavê min re li dinyayê

Piştîmêrî tune ye.....

(Ji arşîva Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê)

2- AXAWO

Axawo hey li min! li min! li min!

Bê maqûlo hey li min, li min

Asiyayê bi sê denda bang dikir digo de lê lê Besrayê!

Lê lê dayê rebenê sibe bû şereka li me çêbû, qaleka li me qewimî

Li sûra kavil, li hewşa kafirê Emir Tuman, tu seyr bike îro ji êvar da li ser kaniyê

Îro ji êvara Xwedê de tê girmîna otomatîka vî gawirî, li ser vê boriyê

Ecem e beşîncî mezheb e, dîn û duşmane,

Gule barî li ser serê me de, fenanî taviyê

Besrayê bi sê denga ba dikir digo Fersende mala te xerab be

Te got ez Fersende me, Fersende me

Bavê Elfesya siwarê Eynzawir im, xwedanê kiçik çapiliyê me

Li welatê donzdeh diwêla qet mêr di ser min re tunîne

Digot Besrayê derî kulê, li qamê te ketê

Ez îro ji êvar de bi du gulê otomotîka birîndar im

Ev a ne şerê Hesenan e, ne şerê Heyderan e, ne şerê du birane

Ne şerê dozdeh bavê eşîrane. Hewşa kafirê Mîr Tuman e,

Ecem e, bêşîncî mezhebe, bê dîn e bê îman e

Ji êvara Xwedê de li ser serê me hirmînên topa,

Giregirên otomotîkane, makîneliyane

Di navbira me de birrîn, tu deqe û tu muhlet û ne tu aman e

Li qarşî şerîeta Mihemed sekinîn, ji min re dixwînin meydan û ferman e.

Ca tu seyr bike li cenazê Silêmanê Ahmed, komê Hesenan li pêş çavên min e

Heyfa min nayê li kuştina şêran û mêran, bi Silêmanê Ahmed, bi konê Hesenane

Heyfa min tê li wê heyfê, îro ji êvar de ji mila vekirin ritbe û nîşan û elametên

Hemîdiyê.

Lo axawo welleh nabî, billeh nabî

Şer girane Keremê Qolaxasî çi mêrek mêrxase bi sê gulan birîndare

Tê kuştinê tu cara û tu zemana jê venabî

Cewabeka nebxêrê hatiye dibê îro sê şev û sê roje

Erz û eyalê Mala Emer li kavila Îranê li ser piştê man e

Sitar tune lê peya bin

Ez Kerem bim, ez Kerem bim, ez berxê mala Emer bim,
 Qaçaxê Romê, firarê dewletê bim
 Kerem digot Evdal peyayê mala Mistefa Axa du tayê bi tenê bin
 Hunê bala xwe bidin li me û vê zilmê
 Çardaxê Qeçara, Sihêrbaza, li Papaxgeniya
 Ji me re dibêjin tivingê destên xwe deynin,
 Ji êvar da teslîmî serhengê me bin.
 Go de lêxin, de lêxin, berxê bavê bavê mino de lêxin
 Stêna ji stûyê xwe de bînin, qûndaxên martêlyan û çapiliyan li erdê xin
 Em ji berê de qaçax û firarê dewletê ne, berxê mala Emer in
 Biçûk û mezinên me rabûne, nerabûne mirîd û canfîdayê mala Şêx in
 Bê axawo hey li min, li min, li min,
 Asiyayê bi sê denga ba dikir digot de lê Besrayê
 Dayê rebenê sibeye şereka li me çêbû, qaleka li me qewimî
 Li hewşa Mîr Tumenê dayê rebenê weha digere
 Min dî teyrê ecelê ji êvar de li ser serê Silêmanê Ahmed,
 konên Hesena ji êvar da tevdigere
 Bawer bike qelebalix e, yeqîn şer e
 Asiyayê digo Besrayê dayê
 Dayê dergûşa milê te lawîn e.
 Tu bi destê Elfesyayê bigre ji navê derkeve here
 Got; de dayê ji te re ne eybe, tu ji min re dibêjî gotinên were
 Bila dergûşa milê min li dora lingê eşîra mala Emer,
 Her du peyayê Mala Mistefa Axa tevbigere.
 Besrayê bi sê denga ba dikir digot Fersende mala te xerab be
 Te digot ez Fersende me, ez Fersende me.
 Ez bavê Elfesya siwarê Eynzawir im, xwedanê kuçuk çapiliyê me
 Li welatê 12 cumhur qet mêr di ser min re tunene
 Got: Besrayê, gulîbirê ez bi cotek gulên vê otomotîkê birîndar im.
 Cenazê Silêmanê Ahmed, konê Hesenan li pêş çavê min e
 Heyfa min nayê li kuştina Silêmanê Ahmed, komê Hesenan e
 Heyfa min tê li wê heyfê ji êvar de dikim nakim tiliya min ya eşedê li min nagere
 Lo axawo welleh nabî billeh nabî
 Şer girane Keremê Qolaxasî çi mêrek mêrxase, bi sê gula birîndare

Tê kuştinê, tu cara û tu zemana jê venabî
 Cewabeka nebxêrê hatiye dibê îro sê şev û sê roje
 Erz û eyalê Mala Emer, li kavila Îranê, li ser piştê man e
 Sitar tune lê peya bin
 Ez Kerem bim, ez Kerem bim, bexê mala Emer bim
 Qaçaxê Romê bim, firarê dewletê bim
 Kerem digote Evdal, her du peyayê mala Mistefa Axa du tayê bi tenê bin
 Bexê mala Evdalê Mistê bin, bi malekî mînana mala Emerê Gulîxwur re heval bin
 Seyr bike li me û vê zilmê, çar Qeçar û Sihêrbaz û Papaxgenî
 Derê qonaxa li me bigrin û ji her du malên Gulîxwur re bêjin;
 Lawo tivingên destên xwe deynin û bêjin teslîmî serhengê me bin.
 (Ji arşîva Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê, ji dengê Reso, Şakiro û Dengbêj Necmeddînê Mûşî)

3- XALID BEGÊ CİBRÎ

(Bi teyba Şê Ahmed hatiye qeydkirin. Li gor Xeniyê Qereyaziyê Şêx Ahmed ne ku şêx e. Gundiyekek bi heywan û cotyariyê meşxûl bûye. Niha rehmet kiriye. Ji Reso gelek hizkiriye û dengê Reso bi teyba xwe qeyd kiriye. Sê kasetan qeyd kiriye. 1 kaset ji wan 90 metre ye û 2 kaset jî 60 metre.)

Min dît Kemal digot; Xalid Beg ca were
 Mala te ava bûyo, bidim te mal û pera ne wiyo, wiyo
 Ez ê te bikim reîsê alaya Kurdan e
 Were ji bo meslek arkadaşiya min qebûl bike
 Qanûna Bolşewîk, zagona Eleman e
 Ax de mîrê min hayê, mîrê min hayê

Mîrê min qet nebêje Kemal ji dîn veşerîya ye
 Wexta Xalid Begê Cibrî bavê Mehmûd
 Kilê çavê xanima Nafiyayê, keçika Çerkez berbendaye
 Bi gotinên çar meklebliya, min hingê dizanibû
 Xwelî li nava çavê me Kurda ye, mîrê min

Xalid Begê digot Kemal, ji min dûr be, min lazim nîne
 Ez ji te naxwazim mal û perane, milletê Kurd milletek bê qaf e,
 Xebera min nake. Nabim reîsê alaya di Kurdan e

Lo lo Kemal! sed û yek sal emrê min be
Em bi tevî koz û kulfet giş bên mirinê
Qebûl nakim qanûna Bolşewîk, zagona Eleman e, wî... wî...
Xoce Îlyasê deşta Mûşê! hey mala te mîrat bûyo
Ne tu alimî, tu çi zû welgeriyayî, tu dibêjî were vê qanûnê qebûl bike
De tu were, rêkî bibîne ji bona emirkirina vê kitêba hane
Lê mala te mîrat bûyo! hustiyê min bi şer'a Mihemed zirave
Şer'a Mihemed li dû min tê, şer'eke pir girane
Mîrê min wayê, mîrê min wayê

Mîrê min bi bextê we ketime, nebêjin Kemal ji dîn vegeyriyaye
Wexta Xalid Begê Cibrî, bavê Şêx Elî Riza kalê nûranî, dibin Bedlîsê berbendaye
Hinga min dizanibû bi gotinên çar Tirka re
Ca rabin derd û kul û meraqa li canê min peyda kirin
Tîq e tîq a wan bû, bi hev dikenyan, digot rabin bala xwe bidnê
Ev kalê han jî şêxê Kurda ye
Murşîdo ez nemînim li dinyayê ji çira..

Lo Lo mîro ez hatim Erzeroma şewitî lehzeke sekinîm
Li derê qesr û qonaxa Xalid Begê Cibrî, min seyr dikir li wê serayê
Ez a kora her du çavên min rijiyayê, min ji êvar de çiqas guhên xwe dagirt
Min dît dengê Xalid Begê Cibrî kewê ribat, seda Yasîn û Qur'anê
Mîna care, îdî tê de wî yû, wî yû qet nayê
Min nizanibû bi gotinên çar meklebliya mesela vê siyasetê
Berê bavê Mehmûd, bi bavê Şêx Elî Riza re dane bajarê Bedlîsa şewitî
Şandin ber irfîyayê, mîrêm wayê, mîrêm wayê

Mîrê min qet li dinyayê nebêjin can şêrîne
Heta em li dinyayê sax bin, em ê serê xwe bidin oxira dîn e
Xelkê wenda kiriye mal û temelê dinyalikê
Me wenda kiriye Xalid Begê Cibrî, kewê rebat, îllam dimirim
Ji bona bavê Şêx Elî Riza, kalê nûranî, ka qutbê rû zemînê?
Murşîdo canê min fîda ye, ez nemînim li dinyayê ji çira....

4- FERZÊ BAVÊ MIHEMED SALIH

Payîz e bavê Mihemed Salih, şahê dengbêja karê xwe xelas kir
Ji malê siwar bû Silhedînê birazî, Mihemedê Elîkê bi xwe re rakir
Zekiyê Mêralî xêrê bike, wayê qet nebîne, derbekî li bavê Mihemed Salihê min daye
Mîrata Guleyê çar tiliya ceqera bavê Mihemed Salih xelas kir
Melûl, melûl, melûl, siwaro....

Gulnazê digot Beyazê mehrûmê, bi gundê Kevir ketim li zinê e
Hazir û guhdarê gundê Kevir dawetek siwar kirin li ara Azo û Kara Sipî
Bavê Mihemed Salih, şahê dengbêjan dixwûne mîna şalûr û bilbil,
Kewê gozelê nêre
Zekiyê Mêralî xêrê nebîne, derbekî li bavê Mihemed Salih daye
Birîna wî kûr û xedar e, guleya wî Manhêr e
Melûl, melûl, melûl siwaro.....

Gulnazê digot Beyazê Mehrûmê ez bi gundê Kevir diketim, li hêlîna kewê
Zekiyê Mêralî xêrê nebîne derbekî li bavê Mihemed Salih şahê dengbêja daye
Birîna wî kûr û xedar e, doktor û sertebîb rakirin ji Kela Melezgirê
Dikin nakin nagire fitîlê, naxwe kewê...
Gulnazê digot Beyazê mehrûmê ca were bigre cot mendîlên hevirme
Em di ser bavê Mihemed Salih de bawêşîn bikin
Çend roye xewa xwe hilnedaye, bila mîna cara ji xwe re bikeve xewê
Melûl, melûl, melûl siwaro.....

Gulnazê digot Beyazê mehrûmê ez bi gundê Kevir diketim bi kereng e
Hazir û guhdarê gundê Kevir xêrê nebînî dawetek siwar kirin,
Şandin dû bavê Mihemed Salih, gotin ro çû ro nema li me dereng e.
Bavê Mihemed Salih şahê dengbêja sofîyê Şêx Evdillayê Hecî Heyder,
Gava ji min re siwar dibû, min nedî mîna vê derba ha
Li serê xwe girêdabû şarekî dozde reng e
Zekiyê Mêralî xêrê nebîne derbekî li bavê Mihemed Salihê min daye
Xerab kiriye rewşa her çar gundê dora Heftreng e

Melûl melûl melûl siwaro

Gulnazê digot Beyazê mehrûmê ez bi gundê Kevir diketin bi dar e
Zekiyê Mêralî xêrê, wayê nebîne, derbekî li bavê Mihemed Salihê min daye
Hedûriya wî tune, ji ber birîna xwe zar e zar e
Ferzê delalî gote cemaeta dora xwe, got ne ez Ferzê me?
Ez ewqas emekdarê we me, devê min ji têhna ziwa bû
Ez dikim nakim Silhedînê birazî, nade min qulmek ava sar e
Melûl melûl melûl siwaro..
(Ji arşîva Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê hatiye girtin.)

5- KILAMA LI SER XALID BEGÊ HESENÎ

Were hê, were hê , were hê
Axawo! qalekî çêbûye li ser Xalid Begê û Keremê Qolaxasî
Li ber û berê Xelatê.
Hirmînên topa, girmînên makîneliyane
Temamê melayîketên li rû asîmana
Ji bo xatirê dînê Mihemed, li van xweşmêran rabûn selewatê.
Xalid Beg digot Kerem Beg tu bavê bavê minî
Mêr be, çê bixebite, destê xwe ji tetika modaliyê bernede, neyê rayê
Kerem digot Xalid Beg çavên xwe veke, çar li çavên min mêzeke
Ez berxê mala Mistefayê Evdilla Begê me
Qaçax û şêrê li serê çiyê me
Qanûna vî kafirî qanûnekî zorî, zertî ,bênamûse
Destê xwe avêtiye dînê Mihemed
Berê şêxan û melan egîdan daye îstîqlalê
Nîvê wan li sirgûnê, nîvê wan li îdamê, nîvê wan li birînê
Terş û talanên me anîn bajar, avêtin ber mazatê
Hay hoooooooo.....

Axayê min lêxe, li dinyayê tu xweşmêrî
Sed û bîst cara tu mêrî
Yazix li welatê Ecem tu mayî bê piştêmêrî

Were hê....

Axayê min qalekî çêbûye li ser Keremê Qolaxasî û Xalid Begê li Eyntabê

Li ber û berê welatê bi çem û kanî

Hirmînên topane, girmînên makîneliyane

Temamê melaîketên li asîmana

Ji wan xweşmêran re rabûne selewatê

Bi hev re deng hılanîn.

Xalid Begê digot Kerem tu mêr be, çê bixebite

Destê xwe ji tetika modaliyê bernede, neyê rayê

Kerem digot Xalid Begê çavên xwe veke

Çar li çavên min mêzeke

Ez berxê mala Evdilayê Missetfa Begê me

Qanûna vî kafirî, qanûnekî zorî, zertî, bênamûse

Destê xwe avêtiye dînê Mihemmed

Berê şêxan û melan daye îstîqlalê

Nîvê wan li sirgûnê, nîvê li îdamê, nîvê wan birînê

Koka şêxan û mela, egîdan û seyîda nema

Temam li me anî

Hay hoooo.....

Axayê min lêxe tu xweşmêrî

Sed û bîst cara tu mêrî

Yazix tu li welatê Ecem bê pişmêrî....

(Ji arşîva Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê hatiye girtin.)

6- GULA DI ZINÊR DE

Ez gul im, gul a di zinêr da

Payîze xelkê gulên xwe çirpandin

Gula min maye li çiyayê bilind, li qeyayê mezin

Stûyê xwe xwar kiriye di ser sosinê re şax û mêl da

Felek mala te mîrat be, min sond xwariye ez terka çelengsiwarê xwe nakim

Heta bi destê min bigrin, min daxin qebra germ û sar da

Heta nê ser min melekê mewtê , qasidê şahê Merda.

(Di cîyek din de dibêje: Melê 14 ilm, qasidê Şahê Merda)

Felek mala te mîrat be, emrê min 13 û 14 bû
Te dilê min li dinyayê gelek şa kir, xapandim.

Di dawîya emrê min de ev çi kul û meraq e?
Te li canê min peyda kir, ji par û pêrar de
Ez gul im, guleke ter û tezî, payîze xelkê gulên xwe çirpandin
Gula min stûyê xwe xwar kiriye bi ser sosinê re maye rût û tazî
Felek mala te mîrat be emrê min 13 û 14 bû
Te ez xapandim dilê min gelek şa kir.

Di dawîya emrê min da te 2 diranên min xist
Li pey heval û hogirên xwe ez mam feqîr û stûxwar û belengazî
Ez gul im, gula li ber qefayê
Îro çend û çend rone rewşa çelengsiwarê min xerab bûye
Ez nizanim ji arê ye ji seqemê ye
Sê payê wî ji xerîbiyê û ji sermayê ye.

Emrê min 13 û 14 bû te dilê min şa kir
Di dawîya emrê min de ev çi êş û elem bû
Te li canê min peyda kir.
Te ez dîn û har kirim
Berdam li dinyayê.

Xwedêyo! Li dinyayê ne ez guneme
Rebî! Li dinyayê ez gunehme
Xaliq! Ne tu jî Xwedayî, li min îmdat bike
Ne ez jî ebdê te me.....

7- QULING

Mamedo! quling rabû ji Rewanê
Daniye ser çayir û çîmenê mala bavê min gulîkurê
Hêlîna xwe çêkiriye li ser caxê vê eywanê

Ji xêra Xwedê re mizgînxwaza mizgîniyek bida min rebenê
Bigotana Mamedê te bi xêr û selametî ji xûrbetê vegeriya
Bila şevê payîzê bihata biba mêvanê min keleşê, min seyranê
Welat welat welat welatê me nîne
Dilê min ê kul ê bibirîn, delaliya dilê min ma li welatê jêrîn e.

Mamedo bihare quling rabû ji Sêweregê
Daniye li ser mêrg û çîmenê mala bavê min gulîkurê
Hêlîna xwe çêkiriye li ser caxa vê merekê (Kadîne)
Xwezil ji xêra Xwedê re mizgînxwaza mizgîn bida min
Bigota Mamedê te bi xêr û selametî ji xûrbetê vegeriya
Bila şevê payîza bihata biba mêvanê sing û berê min keleşê, çavbelekê
Welat welat welat ax welatê min nîne
Ez çi bikim sebra dilê min ma li welatê jêrîn e.
(Ji arşîva Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê hatiye girtin.)

8- DÎLBER

Dîlber !Te çavreşê çavên reş bela ne
Ez ê bi xwulama wan çav û birûya
Kilê subhanê tim derman e.
Gelek camêra senem bejna te ya zirav
Çavê belek bi destê jinên xwe girtin
Ji mal derxistin, ji xwe berdane.

Dîlber te çavreşê birû girê
Te sing sipiyê, mîna teletek (beleka berfê) berfa
Li eteka Çiyayê Qongrê (Nêzî Vartoyê çiyaye)
Xwedê meriv li dinyayê nexê tora te sêrbazê,
Nezanê, dilgawirê

Dîlber te çavreşê birû panê
Sing sipiyê mîna berfa eteka Çiyayê Bîlîcanê (Nêzî Kopê)
Bila meriv qatîlê mêra be, girtiyê hebsa be li dinyayê

Nekeve tora te sêrbazê, cahilê, te nezanê dilo yar yar

Ez dimrim anê, ez dimrim anê

Ditirsim ez bimrim ji derdê çavê belek çava

Bi min re here qebrê qebristanê.

(Ji arşîva Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê hatiya girtin.)

9- LÊ LÊ DELALIYÊ (1970-71)

De lê lê delaliyê ez navê te nizamim, lê bi navê şêrîn ba dikim, navê te Xatûn e

Ez xwulama bejna zirav şê û şê biskê dişê, di ser hinarê rûkê te de bela bû ne

De were ramûsanek tu ramûsanek ji deqa sing û bera, ji cotê guharên heyderî li min keremke

Êvar e, ez rêwî me, li min dereng e, heval û hogirên min tev çûne ji Mûradê derbas bû ne

Delaliyê bejna te zirave mîna taka rihana di golê da

Zerî! qama min tunebû min gavekî bi aşberî xwe berda pê da

Xwezî ji xêra Xwedê ra tu bûka mala bavê min bûyayî

Te ramûsanek li taxima sing û berê xwe li min kerem kira

Sedemê ramûsana te bila ez heft sala bimama li Kela Romê di hebsê da.

Lawiko! Xelk dibîne kar û barê zivistanê

Ez bi çiya û zozana ketim, serê min xalî nabe

Ji mij û ji dûmanê

Mîna xwe berjêr berda deştê çavê min venabe

Ji reşêka vê baranê

Yetîmê lawikê min ji tola jina xwe hêrs bûye

Darek di cerg û dilanê min da lê da

Dilê min ji kar û emelê dinyayê sar kir

Destê min li min negeriya ez 33 guliyên hûr

Ji lawikê xwe re bavêjim ber gulîka vê kitanê

De lê lê delaliyê xelk bi şev û rojê ketiye heyra mal û temelê dinyalikê

Ez ê bi xwulama bejna te, li girêdanê û li wê timtêlê.

(Ji arşîva Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê hatiye girtin.)

10- DE MENAL MENAL

Menal menal, menal, şêxê min menal
Xelkê wenda kiriye mal û temelê dinyalikê
Min wenda kiriye gula Şêxê Abiriyê û Gebola
Şêx Cemalê delal.

Mîhriyayê digot Qutbeddîn lawo ez bi Gebola diketim li tepe ye
Bejna Cemalê delalî hêşîn dike mîna taka rihanê, bi qaîde ye
Emrê min ketiye 45 salî, aqil û kemaleta ku ji Rebbê alemê de hatiye
Sê payê wî tev layîqê bavê te ye.

Mîhriyayê digot Qutbeddîn lawo, ez bi Gebola diketim li kir e
Hêlkanê dilê min rabûne, mîna pêlên Mûradê
Pêl li ser pêla lêdixê nade rêwî û rêcala, ne qam e ne buhur e.
Nakarat

Şêx Mihemed Elî digot Mihyeddîn;
Bihar e, Cemalî bask û qanadê min şikandine
Nizanim ji îro şûnda Şêx Mihemed Elî bi kê şabe (şa bibe)
Bi kê bifire!!

Nakarat
Mîhriyayê digot Qutbeddîn lawo ez bi diyarê Gebola diketim
Ez nizanim felekê çima anî serê min, ev yeka hane?
Ez ji fermana Xwedê re şukurdarim, mirin li derê herkesiye
Rabe bila kes bi mirina bavê te şa nebe
Rabe dîwana bavê xwe mîna cara bide ber dûzenê.
Bala xwe bidê çar helqê dinyayê hatine Gebola tijî bûne
Dibên Mîhriyayê pepûkê nizanim Cemalê kanî?

Nakarat
Bi Gebola diketim li van kir a,
Hêlkanê dilê min mîna pêlên Mûradê
Pêl li ser pêla lê dixê nade rêwî û recala, tu qam û tu buhura
Ji xêra Xwedê re li dinyayê mirin du cara bûya

Cemalê çavê birûyê belek, serê xwe ji qebra reş û tarî bilind kira
Bihata diyarê Gebola seyr bikira, li halê bira û pismama, her çar kura
Nakarat

(Ji arşîva Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê hatiye girtin.)

11- TOWBE

Belê lê dîlberê ez digirim ji Hummayê hatim Hekayê
Ji Mûsilê hatim Bexdayê
Ewqas geriyam min ji te rindtir kes nedît li dinyayê
Bejna te zirave, çevên te reş û belekin
Tilî û pêçiyên te tev ji mûmê ji şimayê
Bila dilê meriv du dil be, bi xêr be
Yek bimîne di mal de, yek bigere li dinyayê
Min towbe be be be.....

Dîlbera min sekinî li banê xanî bûlgûr tevda
Sira sibê mîna bayê Ecem lê dixê, bejna zirav,
Şê û şê biskê dişê gewra min di hevda
Di dinyayê zor û pir zahmet e
Jina çê bikeve destê kotiyê mêra
Ne tê kuştin, ne tê berdan
Min towbe be be be....

Lê lê dîlberê ez mame li hewlê tu li sivderê
Min û dîlbera xwe, me şert girtiye
Min bi kêrê ew ê bi kemberê
Ew ê bi xizemê min bi xencerê
Lawiko ez bi dilê te nizanim
Dilê min dîsa li ser soz û qewl û qerarê berê..
(Ji arşîva Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê hatiye girtin.)

12- HEY LÊ.

Hey lê hey lê hey lê
Zalimê ne ez ê bi şevê bi royê
Ewqas ji bona te mirîme hey lê ku heylê

De lê lê muhubê sibe bû min xezalek rakiriye ji sazê Mêrdînê û Rewanê
Berê xezala min ketiye Dûtaxê, piştâ xezala min ketiye Yekmalê û ji vê derê
Sekvana ji êvar da berê xezala min daye Zozanê Elenderê
Ji xêra Xwedê re tu bûka mala bavê min bû yayî
Te ramûsanek ji taxima sing û berê ji min re kerem bikira
Sedemê ramûsana te ez heft sala bibûma girtîkê Taşmaxaza Leterê

Hey lê hey lê hey lê
Lê lê muhubê ez bi navê te nizanim, bi navê şêrîn
Ba te dikim başê, beyazê lê lê, lê çîlê
Lê lê lê çîlê! Ez bi xwulama bejna zirav li girêdanê li timtêlê
Serê sîdolê (cil e) berde ser paniya qonderê, şitavek (makyaj) bide bejna zirav
Xizemê vegefîne bavêje pêşiya qerefilê (Weka xizemê ye).
Xwezî tu dîsa bûka mala bavê min bû yay
Te ramûsanek ji sing û bera li min bi guharê Heyderî kerem bikira
Ez heft sala bibûma girtîkê Taşmaxaza sîvîlê (hepsa sîvîl).
(Ji arşîva Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê hatiye girtin.)

13- RABE RABE

Rabe rabe rabe rabe
Felekê payîze, qirê xwe avêtiye serê çiya
Havîne li me zer bûye giyayê mêrga,
Miçiqîne avên çavkaniyan
Bihare Mûrada şewitî lem e lem e
Dîn û har bûye rê nade rêwiya
Payîze tenik bûye mîna însanek emrê xwe derbas bike
Xwe nade kapê xamcaniya
Felek mala te mîrat be

Emrê min 13 û 14 bû
Te ez xapandim dilê min şa kir,
Min berê cemaet û meclîsa
Temama ji min re digotin keremke
Te du diranên min xist
Du tayên sipî li çena min peyda kir
Min derê meclîs û cemaeta vedikir
Temam radibûn ser xwe
Destên xwe li hev dixistin
Bûn tîq e tîqên wan bi min kenîyan

Lê lê felekê mala te mîrat bûyê
Ez dîn nebûm, te ez dîn kirim
Ez sewdalî nebûm, te ez sewdalî kirim
Te ez kirim mînanî takî kinkorkê
Li Çiyayê Bîngol û Şerefdînê
Ez hêşîn kirim
Germa meha temmûz û tebaxê
Li min da ez der kirim
Bayê sehayê li min da ez rakirim
Bi hewa xistim, ez birim
Li Gola Şêlû, Gola Nazikê,
Li Behra Wanê ez werkirim
Îro ne çaliye ne çirpiye
Ne dehle ne deviye
Tu sitarek tune ez destê xwe bavêjim
Xwe pê bigrim
Evan tamam derd û kulên te ne
Ez pê dimrim û dinalim
Emrê mim 13 û 14 bû
Felek te dilê min li dinyayê gelek şa kir
Te di sona emrê min de
Te du diranên min xist
Te du tayên sipî li çena min peyda kir

Temamê qîz û bûka bi serê min dikevin
Ji min re dibêjin tu kalî
Min got zalim ez ne kal im
Kal bim kalekî bi galegal im
Koçerim xerab mal im
Re'ya me bê pergal im
Rêwî me ji hevalên xwe mame
Bê heval im
Ev tev derd û kulên te ne
Ez dibêjim pê dinalim
De rabe rabe rabe
Eva welata îdî ji min û te re nabe
Welatekî şorbe gilgilê, nangarisê,
Jin tolê, mêr qehpe ye, ji me re nabe.

Rabe li kumeytekî kapreş siwar be
Bila kumê te mîna cara li nav çavên te xwar be
Ji pira Bendûmayê tu derbas bibe
Bi yekî mîna Surmeli Mehmet Paşa re tu heval be
Bi însanên xerab re tu ranebe rûnenê
Bi însanên çê re heval be
Bi Xwedayê xwe û hevalên xwe re rast be
Bila Xweda bi te re dost be
Bila dijminê te li dinyayê hezar be
Rabe rabe rabe....

(Ji arşîva Dengbêj Xeniyê Qereyaziyê hatiye girtin.)

14- WER XOZANÊ

Ev kilam ya Evdalê Zeynê ye. Di nava tezê de şirove li ser hat kirin da qiyasek bi kilamên Reso û Evdal re mirov bikaribe bike. Kilam ji devê Dengbêj, destanbêj û beytbêj Egîdê Têcir hat nivîsandin.

De dilê min yo yo, dilê min yo yo
Hey lo mîro ez ê li Xozanê dinêrim Xozan nîne

Binyê de germ e germistan e
Fêzê de zer hinar, darê zeytûnê ne
Serê sibê derketim, selefê selef siyara,
Tîmtêla Qeymezê Êzîdî
Siwarê Senemê di nav de nîne
De dilê min yo yo, dilê min yo yo

Hey lo mîro ez ê li Xozanê dinêrim li devê zinêr e
Bayê samê rabû qir kiribû hezar û heftsed mêr e
Serê sibê derketim selefê selef siwara di nav de ne
Tîmtêla Qeymezê min, siwarê kihêlê nêr e
De dilê min yo yo, dilê min yo yo

Hey lo mîro li Xozana xopan dinêrim wê stirî
Avê çem û kaniya hat û buhurî
Eskerê Mehmed Paşa girane lê hêwirî
Serê sibê derketim selefê self siwara ne di nav de ne
Tîmtêla Qeymezê min, siwarê Gulî
De dilê min yo yo, dilê min yo! yo!

Hey lo mîro ez ê li Xozana şewitî dinêrim wê bi mil e
Avê çem û kaniya bi ser me de tîn xul e xul e
Serê sibê derketim, selefê selef siyara ne di navde ne
Tîmtêla Qeymezê min, siwarê hespê qul e
De dilê min yo yo, dilê min yo! yo!

Hey lo mîro, Xozanê wê li çalêyo
Hatî û çûyîna eskerê Memed Paşa her tim lêyo
Min ê bala xwe didayê, cenazê Têlî Qeymezê Êzîdî kirine tabûtê
Danîne ser barê devêyo
De dilê min yo yo, dilê min yo yo

Hey lo mîro li Xozanê dinêrim kanî lêyo
Kanî sêrbaz e li binya rê ye
Ji salixa, ji sûlîxa cenazê Sadûn Axa, lawê Dirbas Axa maye
Li Sîsila xopan li binya rê ye

De dilê min yo yo, dilê min yo yo

Hey lo mîro ez ê li Xozanê dinhêrim wê havînê, çax heyamê van firîka
Rojê xewa van birîndara nedihat, ji destê germê, germistanê
Şevê ji derd û kulê dengê bêxweyê van wawika
Ez ê vê sibê derkevime selefê siyara, herge xelqê wenda kiriye teka û tûka
Min evdala Xwedê wenda kiriye Têlî Qeymezê delal,
Xweyê gurzê ber cênika
De dilê min yo yo, dilê min yo yo..

(Ji arşîva lêkolîner Prîskê Mihoyî. Cîgirê serokê beşa çap û çapemeniya Wezaretê Rewşenbîrî ya Rûsyayê)

15- DÊRSIM E XWEŞ DÊRSIM E

(Ev kilam jî ya Evdalê Zeynê ye. Ji devê Dengbêjê Yerîvanê ji devê Şebabê Egîd hatiye nivîsandin.)

Wey lo lo, wey lo lo, wey lo lo, wey lo lo, wey lo lo, wey lo,
Wey lo dilo, marimo (mehrîmo), ne min go ez ê çûme Dêrsimê, xweş Dêrsime,
Ax de avên çema li kanîka, li geliya, li gola li ser min da têne
gim e gim e, zim e zim e, wey dil, wey dil...

Gundî, malîno, min ê bala xwe didayê du sazbande rûnîştîne,
Sîmeke sazê wana zîvîne, yek zêrîne,
Şêwîşê biskê çê di mal da nîne, Ji kula dilê min ra lê dixin
Ring e ring e, ding e ding e, wey dil, wey dil...

(Ji arşîva lêkolîner Prîskê Mihoyî)

Wêneye Resoyê GOPALA



Gora Resoyê GOPALA

